

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

B Î R

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ



Navdarên Kurd-III

HEJMAR - SAYI: 9 HAVÎN 2008

Institut kurde de Paris

REV. 1401
05/11/2021

KOVARA LÉKOLÍN Ű LÉGERÍNÉ

B Î R

ARASTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

Institut kura

B Î R

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNE

BÎR

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

Ji Sê Mehan Carekê Tête
Weşandin
Üç Ayda Bir Yayimlanir

20ê Tebaxa 2008

Bûha: 10 YTL

BÎR Reklamcılık -Yayincılık

Sahibi ve Sorumlu Yazışleri
Müdürü:

Mehmet KONUK

Redakte:

Seîd VEROJ

Tîprêzî-Mîzanpaj: BÎR

e-mail: kovarabir@yahoo.com
kovarabir@hotmail.com

Sertên abonetiye

Bo nêva welat salek 30 YTL
Bo derveyê welat salek 80 \$

Çapxane/Matbaa:

**Barış Matbaa Mücellit
Ali LAÇIN**

Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi

C. Blok No: 291

Topkapı/İSTANBUL

TEL : (0212) 674 85 28

FAX : (0212) 674 85 29

Cîyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:

İnönü caddesi Magül İş Merkezi

No: 49

Dağkapı /DİYARBAKIR

Tel: (0412) 2287828

NAVEROK - İÇİNDEKİLER

Seîd VEROJ Şêx Mehmûdê BERZENCÎ	7
Ziya AVCI EVDAL XAN (...-1657)	27
Şakir EPOZDEMÎR Peyayê Hikimdarîya Rojkan:Mihemed Axayê Kelhokî	35
Şakir EPOZDEMÎR Faîq BÛCAQ: Gandhîyê Kurdan Bû	47
Mehmet KONUK Said ELÇÎ(1925-1971):Kurdistanî Yurtseverliğin Ve Demokratiğın Mihenk Taşı	53
Îbrahîm GUÇLU Dr. Qasimlo: Serokekî Demokrasiya Civakî û Hevalê Dubçek ê Çekî ..	68
Seîd VEROJ Seyîd Rizayê Dêrsimî(1862-14/11/1937)	81
Ayhan MERETOWAR Şêx Ubeydullahê Nehrî	90
Celadet Alî BEDİR XAN Şêx Evdirehmanê Garisî.....	98
Mamoste QEDRÎ Ehmedê Xanî	103

Sabah Ghalib

1919-1923 Yılları Arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi Karşı-
sındaki Tutumu ve 1922 Tarihli *Kürt Otonomisi Kanunu*'nun Metni115

Mr. Asbjorn Eide

(İng Çeviren: Zeri İNANÇ)

Azınlıkların Sınıflandırılması ve Azınlık Haklarında Farklılaşma.... 139

Joost Jongerden

20. Yüzyıl Başlarında Diyarbakır'da Olaylar: Ermeniler, Hamidiye
Alayları ve Bölge İleri Gelenleri 151

Institut kurde de Paris

Pêşgotin

Xwendevanên hêja, di vê germa havîna Amedê de careke dî kovara **BÎR** bi naverokeke dewlemend û mijarên nûh digîje ber destê we. Projeya "*Danasîna 100 Navdarên Kurd*" bi derketina vê hejmarê, dibe hejmara sêyemîn a danasîna navdarên kurd. Dîroka neteweya kurd jî wek erd û axa wî berhemdar û dewlemend e. Ji ber vê, neteweya kurd jî xwedîyê gelek şexsiyetên navdar, hêja û dozkaran e. Bêşik bîranîn û nivîsandina wan hemûyan, kar û xebateke berfireh û zemanekê dirêj dixwaze. Gelek şexsiyetên hêja yên ku navê wan di nav ev rûpelên kovara me de cî negirtibe jî, ev yek nayê vî manayê ku ew bi ked û ruhê xwe yê pak ji dilê me dûr in. Bila ruhê ew hêjayan şad be û baş bête zanîn ku bîranîna her yekî ji wan, bîranîna mîrata manewî û ruhiyeta wan hemûyan e.

Di vê hejmarê de ligel dosya *Danasîna Navdaran*, bahsa hinek belge û bûyerên girîng ên dîroka nêzîk jî tête kirin. Bi taybetî qirkirin û koçberkirina ermenan, îro jî di rojevê de ye û her tête gengeşîkirin. Mixabîna mîratxur û neviyên Îtîhatçîyan û Teşkilatê Mahsusa, îro jî newêrin bi tawanên xwe yên nemirovane mikur werin û miqabilê meqtulên xwe lêborînê bixwazin. Lewra di şertên dinya îroyîn de jî, bi şêwe û teşkilatên cûda be jî, qirêjî û xwînrejîya wan a li ser miletê kurd berdewam dike.

Her weha di vê hejmarê de bi belavkirina belgeyê "*Kanuna Otonomî ya Kurd*" ê dema Mistefa Kemal, nîşan dide ku tirk çî wextê ku ketine tengasîyê, bi hinek gotin û mesajan karîne bi rehetî miletê kurd û rêberên wê bixapînin û tengasîyên xwe jî biborînin. Dema ku em bi tenê li bûyer û dîroka sedsala dawî ya kurd û tirk binêrin, kurd, pîrrî caran bi gelek tiştên sivîk û waadên nedîyar, ji aliyê tirkan ve hatine xapandin û mexdurîkirin. Bi tevî ku pîrêzeya dewleta tirk û Mistefa Kemal ewqas aşkeraye, hîn jî Ocalan û peyrevên wî Mistefa Kemalî derdixin ezmanan û li ser serê xwe û miletê kurd didin rûniştandin. Dibêjin "fikir û niyeta M. Kemalî baş bû, wî dixwest mesela kurdan çareser bike, lêbelê hawîrdora wî nehişt ku ew bis-erkeve." Heta Ocalan carna qîma xwe bi van gotinan jî nayîne dibêje, "li hemberê M. Kemal serhildana kurdan teşwîqa derve û hereketekê paşverû bû, kurdan li hemberî M. Kemalî serhildan nekirana, dê îro rejîma Tirkîyê bêtir demokratîk bibûya." Mîmkune ku hinek bi tekrarkirina ev fantazyên Ocalanî, ciyê xwe xweş û qaîm bikin û jê gelek feydeyan bibînin, lê divê kurd baş bizanin ku tû feydeyekî netewî yê kurdan bi gotin û tekrarkirina ev çîrokan de nîne. Gotineka kurdan heye dibêjin "li pîrêza wî binêre." Divê miletê kurd bi kêmanî li bûyerên vê demê yên hawîrdora xwe temaşe bike û bawê î bi rê û dirbên tûj û gotinên xapînok neyîne, li pîrêza heştêûpênc salîya dewleta tirk û rayedarên wê binêre û jê ders werbigre.

Ji aliyê din ve, li dinyayê û herêma em tê de, bûyerên gelek germ û nûh diqewimin. Di vê pêşgotinê de em dixwazin tenê bi kurtebirrî bahsa hinek ji van bûyeran bikin. Wekî her caran mesela Kerkûkê, cardin di germayîya rojevê de ciyê xwe girtiye. Me berîya nûha jî di van rûpelan de gelek car bahsa mesela Kerkûkê kiriye. Li gorî dema berîya vê, mesela Kerkûkê ketiye qonaxeke nûh. Di vê qo-naxê

de du tiştên balkêş dîyar bûne: A yekemîn, her çi qas di Destûra Esasî ya Îraqa Federal de, li ser çareserîya mesela Kerkûkê, bi navê madeya 140î lihevhatinekî di navbera kurd û ereban de pêk hatibe jî, di zemanê dirêj de tetbîqnekirina madeya 140î û jî aliyê qiyadeya sîyasî ya erebî ve wergirtina biryara madeya hejmar 24an, helwêsta rastîn a ereban aşkera kiriye. Tevdan û tesîra hêzên derveyî çi dibe bila bibe, yê esas û dîyarker, helwêsta qiyada sîyasî ya ereban e. Yê duyemîn, pêşniyar û pîlanên sê qonaxî yên Neteweyên Yekbûyî ye. Qonaxa yekemîn a pêşniyarên Neteweyên Yekbûyî daxwazên gelê kurd tetmîn nekir û di meha pêşiya me de jî qonaxa duyemîn a pêşniyarên wan tete dîyarkirin. Eger pêşniyarên di qonaxa duyemîn de û heta dawîya salê jî yê qonaxa sêyemîn bêne dîyarkirin û jî mesela Kerkûkê re çareserîyekî ku ji aliyê kurdan ve qebûlkirina wê mimkun be peyda nebe, wê demê mudaxaleya Neteweyên Yekbûyî dibe leyztikekî sîyasî ya navneteweyî. Di vê çarçovê de, ku qiyadeya sîyasî ya ereb dev ji helwêsta xwe bernede û pêşniyarên rêxistina Neteweyên Yekbûyî jî neyîn qebûlkirin, wê demê şerê kurd û ereban bivê-nevê ye. Ji ber vê, divê qiyadeya sîyasî ya kurd zemîneka meşru ji dest bernede û li gorî her ihtimalek jî amadekariya xwe bike.

Şerê Rusya û Gurcîstanê jî, qewimandineka nûh a herêma Kafkasyayê ye. Bêşik ev şer hem ji aliyê dîrokî ve û hem ji aliyê hesasiyetên insanîyetîyê ve kurdan jî ji nêzik ve eleqeder dike. Jixwe ji aliyê herdu dewletan ve jî sedemên ku ji bo şerî tene nîşandan ne tetmînkar in. Rusya, mudaxaleya xwe wekî “mudaxaleyeke însanî” û “azadîya kêmnîeteweyên” (oset, acar, abhaz) nava Gurcîstanê dîyar dike. Gurcîstan jî dibêje, ez parastina “yekîtiya axa welatê xwe” dikim. Gelo ma beşekê ax û gelê van grubên etnîkî û kêmnîeteweyan ne di nav sînorên dewleta Rusyayê de ne? Herweha Gurcîstan ji ber çi axa van mîletan û gelê wan (oset, abhaz, acar) parçeyek ji Gurc û Gurcîstanê dihesibîne? Wisa xuyaye ku ne rejîma Sovyetê û ne jî mîratxurên bermayê wê, nêkarîne û yan naxwazin mesela netewî ya di cografîya Kafkasyayê de li ser bîngeha “mafê çarenûsiya mîletan” de bête çareserkirin. Divê aliyê dîrokî û sosyolojî yê vî şerî, li ser vê paşxanê jî bête xwendin.

Ji aliyê sîyaseta navneteweyî ve jî, her çi qas ev şer, fiilen wek şerê Rusya û Gurcîstanê xuya bike jî, di rastîyê de tenê ne şerê ev herdu alîyan e. Jixwe muqayesekirina hêz û potansiyela ev herdu alîyan jî ne mimkun û ne mantiqî ye. Wisa dîyare ku vê gavê şerê dijwar ê aktorên navneteweyî, dê bi şerê piçûk ên herêmî berdewam bike. Ji ber vê yekê, di paşxana vî şerî de şerekî hîn mezintir heye. Ne tenê ev şer, di rojên dahatîyê de herêma Kafkasya ji ber potansiyela xwe ya etnîkî, çavkaniyên petrol û gaz û guzergahên firotina wan a bo bazarên derve, ji gelek qewimandinên nûh re jî amade ye. Rusya bi vî şerî, dixwaze ji bona hemleyên hîn mezintir hem Yekîtiya Awrupayê û hem jî YDAYê biciribîne. Bêguman Gurcîstanê jî hewldanê wisa bi rîsk, jixweber û bi serê xwe nekir, çi mesaj ji rêvebirên DYA û Awrupayê hatiye girtin dê pêşerojê bêtir dîyar be.

Em cardin dibêjin bi hêviya hevdîtina hejmareke nû ya **BÎRê**, di nav xêr û xweşiyê de bimînin.

Şêx Mehmûdê BERZENCÎ

Seîd VEROJ

**Şerê Yekem û Tesîra Wî ya
Li Ser Pêkhatina Rewşa Nû ya
Rojhelata Navîn û Kurdistanê**

Di destpêka sedsala XIXyan de belavbûna fikrên neteweyî di nav cografya Dewleta Osmanî de, dibû sedemê serhildan û veqetîna milletên di nav sînoren împêratoriyetê de. Bi taybetî ev pêla han bi awakî zexm ji aliyê rojavayê ve dest pê kiribû. Ji ber vê, gav bi gav sînoren dewleta Osmanî tengtir dibûn. Dewleta Osmanî heta destpêka sedsala XXan, bi taybetî ji aliyê rojavayê ve ji sisiyan dudo(2/3)yê erdê di bin desthelatiya xwe de wenda kiribû.

Rayedarên Dewleta Osmanî û siyaseta desthelat a Îtihat û Terakî, destpêkirina Şerê Yekem ê Cihanê, weke fersendekî nûh dîtî ji bo bidestxistina erdê wendakirî yê împê-



Şêx Mehmûdê BERZENCÎ

atoriyetê. Ji bo vê armancê, Dewleta Osmanî di sala 1914 de wek terefdarê Elmanya bi tevî Şerê Yekem ê Cihanê bû. Di encama Şerê Yekem de, li

Rojhelata Navîn û Efrîkayê jî erdên ku pirranî yan jî giştî nifusa wan misilman bûn ji dest çûn. Jixwe berîya ku Şerê Yekem dest pê bike, erdê Efrîqa bi giştî û hemû miletên Balkanî jî wan veqetyabûn û gelek giravên Behra Sipî û Egê ji dest wan çûbûn. Di Rojhelata Navîn de jî, şerê di bereyên Besra, Bexda, Musil, Filîstin, Şam û Helebê de wenda kiribûn. Ev erdan yan jî cografya miletên misilman, di navbera Brîtanya, Fransa û Îtalya de ku serkevtiyên şer bûn, hate parvekirin.

Rewş û statukoya îro ya Rojhelata Navîn û ji Împeratorîya Osmanî peyda bûna Komara Tirkîyê, di pêvajoya Şerê Yekemîn ê Cîhanê de bi peymanana veşartî ya **Skyes-Pikot** (1916) têtê destnîşankirin. Rusya di 26ê Nîsana 1916 de ji ber vê peymanê muxtirayekî dide Brîtanya û Fransayê û têtê dibêje "bi şertê ku hun bajarê Bedlîs û başûrê bajarê Wanê yê herêma Kurdistanê bidine ser Rusyayê, ev dabeşkirina we ji aliyê min ve têtê qebûlîkirin û sînorenê wê herêmê jî wisa destnîşan dike: Muş, Sêrt, Çemê Dîjleyê, Cizîr û xeta di navbera girên serdestê Amediye û Mergewerê."¹ Ev peyman, bi erêkirina Rusyayê jî di navbera Brîtanya û Fransayê de pêk hatibû. Digel vê, di Nîsana sala 1917an de tevlibûna DYA ji bo Şerê Yekemîn ê Cîhanê, dibe unsureke girîng û nûh ê pêkhatina statukoyê. Heman demî di Oktobira sala 1917an de li Rusyayê pêkhatina Şoreşa Bolşevîk, dibe sedemê hinek guharti-

nan di peymanana **Skyes-Pikotê** de. Desthilatdarbûna Bolşevîkan dibe sedemê vê yekê; erdê Ji Dewleta Osmanî mayî û hinek erdên din ên ku li gor peymanana Skyes-Pikotê ji bo desthilatdariya Rusyayê hatibûn dîyarîkirin û dagirtin, ji aliyê Bolşevîkan ve bi peymna **Brest-Litovsk** (9ê Sibata 1918) hatin valakirin û peymanên berê jî hatin betalkirin. Piştî vê bûyerê, dewletên serkevtî (hevpeyman), li ser rewşeke nûh lihevîkirin; para ji Rusya mayî dewrê DYAYê kirin.

Şerê Yekem, çar sala berdewam kir û di dawîya şerê Dewleta Osmanî wenda kir û jihev bû. Di dawîya têkçûn û radeştibûna Osmanîyan de, di navbera Hêzên Hevpeyman û Osmanîyan de **Peymana Mondrosê** (30ê Çiriya Pêşîn a 1918) hate îmzekirin. Peymana Mondrosê di navbera dewletên serkevtî û yên windakirîyan de wek peymanana bidawîna Şerê Yekem ê Cîhanê hatibû îmzekirin.

Beşdarbûna DYA ji bo Şerê Yekem, di çarçova Peymana Mondrosê de guhartineke nûh anî rojevê. Bi vê guhartinê **Peymana Sevrê** (10ê Tebaxa 1920) dertê holê. Di hîmayeya DYAYê de ihtimala damezirandina dewleta Ermenistan û Kurdistanê, di çarçova Peymana Sevrê de têtê rojevê.

Di kombûna **San Remo** ya Nîsan 1920an de, ji aliyê Konseya Bilind ve mandateriya Mezopotamyayê ji Brîtanya Gewre re têtê hiştin.

Lêbelê li Rusyayê pêkhatina Şoreşa Bolşevîkan, pîlan û hesabên hêzên emperyal serûbin kiribûn. Serkevtina Bolşevîkan, tehluke belavkirina Şoreşa Bolşevîkan anîbû meydanê. Ji ber vê

¹ Vladimir F. Minorsky, *Musul Sorunu (Pisrgirêka Musilê)*, s. 28, Avesta yay. Birinci baski-1998-İstanbul

yekê, bi taybetî Brîtanya û hêzên di yên emperyal mecbur man ku di Peymana Sevîrê de guhartinan çêbikin. Vê guhartinê **Peymana Lozanê** (24ê Temmûza 1923) derxiste holê.

Şerê di navbera dewletên hevpeyman û osmanîyan de, di Temmûza 1923an de bi îmzekirina Peymana Lozanê bi dawî tête. Navê rastîn ê Peymana Lozanê ev e; Konferansa Lozanê Derheqê Karûbarê Rojhelata Nêzîk de. Bi îmzekirina Peymana Lozanê, hêzên emperyal dev ji fikra damezirandina dewleteke gewre ya Ermenîstanê û Kurdistanê otonom berdidin. Yanî tiştên ku di Peymana Sevîrê de hatibûn waadkirin tene jibîrkirin. Her çî qas tirk, di propagandayên xwe de Têvgera 1925an a di rêvebirîya **Komîteya Îstîqlal a Kurdistanê (Azadî)** de, bi teşwîq û alîkariya îngiliz tawanbar bikin jî, di rastiyê de tiştekî wisa nîne, bervajê wê bûye. Mîmkûn e ku pêşiyê îngilîzan, tirk bi damezirandina dewleteke kurd tehdît kiribin, dawiyê herdu alîyan jî lihev kirin; tirkan dev ji Musilê berda û îngilîzan jî dev ji kurdan berda. Bi tevî aşkirabûna vê rastiya dîrokî, tirk hîn jî hemwelatîyên xwe û gelê kurd dixapînin dibêjin "bi îmzekirina Peymana Lozanê, me zora heft duwêlan birîye." Nivîskar Tolgay Ersoy di Pirtûka xwe ya bi sernivîsa "Lozan: Çîrokeka Dîjî Emperyalîzmê Çawa Hate Nivîsandin?" de dibêje: Bi peymana Lozanê zora heft duwêlan nehate birin, lêbelê her daxwaza heft duwêlan hate qebûlîkirin. Em dizanin ku di pey mûtarekeyê de li hemberê dewletên hevpeyman berîkek jî

nehatiye teqandin. Tenê pevçûnekî bi Yonaniyan re çêbûye. Piştî ku hêzên emperyalîstan piştigirîya xwe ya bo Yonanan qut kirin û mîqabilê wan bi hêzên Kuvayê Millîye re lihev hatin û piştigirîya wan kirin, nemîmkun bû ku Yonani li Anatolyayê bimînin. Jixwe bi eksê gotinên dîroka fermî, şerê bi Yonan re şerekî bisînor bû. Îtilaf-nameya ku di navbera Fransa û Tirkan de (15 Çirîya Pêşîn 1921an) hatibû îmzekirin, destpêka hevkarîya bi emperyalîstan re bû û bi aşkerayî jî îhlalkirina Mîsaqê Millî bû.

Ji îmzakirina peymanê şûnde, "Amerîka, Brîtanya û Fransa dixwazin li ser cografya Tirkîyeyê dewleteke saxlem damezrînin."² Da ku karibe berjewendîyên wan biparêze û pêşî li belavbûna Şoreşa Bolşevîk bigre. Mistefa Kemal jî vê yekê dibîne û dixwaze jê sûd werbigre. Di vê çarçovê de Mistefa Kemal bi Bolşevîkan re peymanekî çêdike. Yek ji sedemê herî girîng ê serkevtina Mistefa Kemal, peymana wî ya bi Bolşevîkan re û piştigirîya wan a di çarçova vê peymanê de bû. Li gor vê peymanê, dê Yekîtiya Sovyetê misade nekira ku li ser cografya Enetolyayê dewleteke Kurdistan û Ermenîstanê bête damezirandin. Ji ber vê, Hikumeta Bolşevîk, guhê xwe ji daxwaz û nameyên Têvgera Qoçgirî û Qomîteya Îstîqlal a Kurdistanê û Şêx Mehmedê Berzencî re digre û qet bersîveke zelal nade wan. Bervajê wî, hikumeta Bolşevîk, piştigirîya tevgera Mistefa

² Sevan Nişanyanî, rojnameya *Taraf*, hevpeyvîna bi Neşe Duzelê re, 23.06.2008)

Kemal dike û vê siyaseta xwe ya li hemberî Tevgera Azadîxwaz a Kurd dike biryara Înternayonalê jî.

Du unsurên bingehîn û herî girîng ên ji dewleta Osmanî pêkhatina Komara Tirkîyê û destnîşankirina sînorên wî yên îroyîn ev in: Yek, li ser çêbûna dewleteka tirk a nûh lihevkiirina Bolşevîk û hêzên emperyal (hev - peymanan) e. Duyem, feraxetkirina DYA ji mafên xwe yên li ser Peymana Sevrê ye.

Li ser vê yekê, di navbera dewletên rojava(hevpeyman) û Rusyayê de konsesusek pêkhatibû. "Belê. Li ser bidawîanîna Împeratorîya Osmanî biryar hatibû dayîn, lêbelê dixwestin tirk li her cîyê ku nifusa wan pirranî ye, desthilatdar bin. Digel vê dixwestin ew erdên wekî Erebaştanê, rojhelata bakur û rojhelata başûr ku nifusa tirk lê nîne, jê veqetînin. Yanî nedizanîn ku sînorên Ermenistanê, kurdan û rumên rojavayê çi bikin. Hûn li gor îro li vê binêrin ev têtê wateya parçekirinê, lê li gorî wê demê nedihat wateya parçekirinê. Niyeta wan(hêzên hevpeyman-s.v.) ew bû, li cîyên ku nifusa tirkan zêde bû dewleteke yekgirtî pêkbinin. Brîtanya û DYA, li Tirkîyeyê pêkhatina rejîmeke otorîter û dîktator, ji bo mîzîna nûh a dinyayê rast didîtin. Nedixwestin pêkhatineke bêistiqrar çêbe wekî ya osmaniyan."³

Her weha "Di pêvajoya Şerî de hedefê îlankirî yê dewletên mûteşîq, damezirandina dewleteke ereban bû."⁴

Kurd piştî hatin bîra wan, lewra li Iraqê çêbûna pêkhatineka kurdî, dê bibûya wasîteyekî ji bo kontrolkirina Tirkîye û Îranê jî.

Dema ku peymana Mondrosê hate îmzekirin, Wîlayetê Musilê (Kurdistan Başûr) di nav sînorên osmanîyan de bû. Ji aliyê îngilîzan ve dagirtina Wîlayetê Musilê, îhlalkirina peymanê bû. Piştî îmzekirina Peymana Mondrosê, artêşa îngilîzan di 31ê Çiriya Pêşîn de kete Musilê. Serkumandarê artêşa 6. a tirkan Elî İhsan Paşa û waliyê Musilê di 5ê Çiriya Paşîn de bajar terk kirin. Di pey wê re jî Wîlayetê Musilê bi Peymana Lozanê kete bin destê îngilîzan. Di 8ê Çiriya Pêşîn a sala 1918 de li Musilê ala îngilîzan têtê hildan. Û pişt re hemû herêmên din jî têtê dagirkirin.

Piştî hevdiîtinên dûr û dirêj ên Komîsyona Taybet a Musilê (bi Neteweyên Yekbûyî ve girêdayî bû) pêşniyarekî hate kirin, li gorî vê pêşniyarê bi şertê ku daxwazên kurdan li ber çavan bêne girtin, ji bo 25 salan di bin çavdêriya Brîtanîyayê de Musil jî Iraqê re têtê hiştin. Ev pêşniyar di Eylûla sala 1925an de ji aliyê îngilîzan ve jî têtê qebûlkirin. Di meha Kanûna 1925an de Wîlayetê Musil(başûrê Kurdistanê) bi Iraqê ve têtê girêdan. Bi vê awayê başûrê Kurdistanê dibe parçeyek ji dewleta Iraqê erebî.

Şêx Mehmûd Kî ye?

Şêx Mehmud, kurê Şêx Seîd e û Şêx Seîd jî kurê Şêx Kak Ehmed e. Ew jî kurê Şêx Marîfê Nodê ye. Kak Ehmed mûrşîdekî gewre yê tarîqata

³ Sevan Nişanyanî, rojnameya *Taraf*, hevpeyvîna bi Neşe Duzelê re, 23.06.2008

⁴ Vladimir F. Minorsky, *Musul Sorunu(Pisgîrêka Musilê)*, s. 31, Avêsta yay. Birinci baskî-1998- İstanbul

Qadîrî ye. Kak Ehmed, di nav gelê kurd de bi dîndarî û alimîya xwe navdar bû û pirr di hate heskirin. Şêx Mehmed, "Di sala 1886 da li Silêmanî ji dayik bûye. Ji mamostayê taybet wek Xoce Efendî dersê dîn û zimanê erebî û tirkî û farisî girtîye û pê xwendîye."⁵

Li gorî adet û sîyaseta Evdilhemiîdê II., şêx û serokeşîrên gewre dem deman dihatin vexwendin bo sereya padîşahê Osmanî. Şêx Mehmed jî "Di sala 1901î da ligel bav û mam û xizm û çend navdarên bajar da çûne Estembolê."⁶ Piştî mêvandariya sê mangan (mehan) vegeryane Silêmaniyê. Bi vê seferê, Şêx Mehmed di panzde saliya xwe de selteneta seray û arîstokrasîya wê ji nêzîk ve dît. "Piştî ku vegeryan Silêmaniyê, ji aliyê Evdilhemiîd ve bo Şêx Seîd û malbat û merivên wî meaş hate girêdan. Şîfreyê veşartî ya murabeyê dane wî. Dema ku problemekî çêbûya û pêdivî hebûya, Şêx Seîd karibî bi vê şîfreyê ji bo Sultanê Osmanî re têlgrif bikişanda."⁷ Vê bûyerê di nav civaka kurd de giraniya Şêx Seîd Zêdetir kiribû. Di sala 1908an de dema ku îtihatçiyên Evdilhemiîd ji desthilatiyê anîn xwarê, li her derê teşkilata xwe çêkirin, alîgir û merivên nêzîkê Evdilhemiîd ji wezîfeyê dûr xistin. Şêx Seîdê bavê Şêx Mehmed jî, ji vê pêla tundrew a îtihatçiyên para xwe girt. "Bi pîlan û leyztikên cemiyeta îtihatçiyên, Şêx Seîd



Şêx Mehmûdê Hefîd

bi tevî malbata wî û hinek merivên wan jî hatin nefikirin bo bajarê Musilê. Li Musilê demekî aram derbas kirin û li bende bûn ku bi guhartina rewşê de cardin vegerin Silêmaniyê. Lê haya wan ji rojên reş ên li pêşiya wan tune bû. Îtihatçî jî bo ku wan tune bikin li behaneyê digeryan. Pîlanekî çêkirin da ku di navbera wan û xelkê Musilê de fitneyî bikin. Ji bo vê yekê, îftirayên bêbinyat li wan kirin û di derheqê wan de gelek derew belavkirin."⁸ Di encama van leyztik û provakasyonên îtihatçiyên de,

⁵ Mela Xalid Ezîzê Motkî, *Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmûdê Hefîd*, kovara BÎR hejmar: 1, r. 63, Bihara 2005an, Amed

⁶ Jêdera berê, r. 63

⁷ Refik Hilmi, *Amlar(Bîranîn)*, s. 16, nûjen yay. İstanbul 1995

⁸ Refik Hilmi, *Amlar(Bîranîn)*, s. 16, nûjen yay. İstanbul 1995

bûyerên mezin qewimîn û di encam de Şêx Seîdê bavê Şêx Mehmud li bajarê Musilê hate kuştin. Piştî kuştina Şêx Seîd û mêvanekî wî li ber seraya wîlayetê, yên berhevbûyî hêrîş dibin ser mala wî. Li vira jî Şêx Ehmed û gelek malîyên din jî tene kuştin. Dema ku ev bûyer diqewimin Şêx Mehmûd ne li malê ye yan jî li ciyekî dûr li mêvaniyê ye. Piştî sekinandina bûyeran, Şêx Mehmûd jî ji ber ewlekariyê ji aliyê waliyê Musilê ve hate destgîr kirin.

Van bûyeran bi taybetî li Silêmanî, Kerkûk û bajarên di yên Kurdistanê gelek tesîr li ser xelkê kirin. Gelek giragir û serokeşîrên kurdan berhev bûn û ji waliyê musilê re gotin ku tu Şêx Mehmûd serbest bernedî, em dê hêrîş bikine ser bajarê Musilê bo tolhildana Şêx Seîd û Şêx Ehmed. Li ser vê biryara eşîran, waliyê Musilê bi lezûbez Şêx Mehmûd azad kir û verêkir bo Silêmaniyê.

Wê demê dewleta Brîtanya ji başûr ve hêrîş biribû ser Îraqê û ji Besrayê dest pê kir ber bi Bexda û Musilê ve cografya dagirkirî fireh kirin. Îraq û Kurdistan wê demê di bin desthilatdariya osmaniyan de bûn. Di navbera îngiliz û kurdan de cara pêşîn li herêma Şueybeyê şer diqewime. Hinek eşîrên kurd û ereban bi teşwîqkirina tirkên di vê herêmê de rêya îngilizan dibirrin û di navbera herdu aliyan de pevçûneke dijwar çêdibe. Şêx Mehmûd cara pêşîn roja 14/04/1915yê wek serkirdeyê hêzekî beşdarê şerê Şueybe bûye li dijî îngilizan. Şêx Mehmud di vê pevçûnê de bi hezar siwariyên xwe ve li miqabilê îngilizan piştgiriya tirkên dike.

Her weha Şêx Mehmûd di pêvajoya Şerê Yekem de, beşdarî şerê navbera rus û tirkên jî bûye, digel hinek serokeşîrên kurd piştgiriya tirkên kiribû û hêza leşkerên rus şikandibûn. Ji ber vê yekê navbera wî û tirkên baş bû. LêbeLê piştî şer, qumandarê tirkên bi tawanbariya talankariyê hinek serokeşîrên kurd girtin û wan kuştin. Li ser vê bûyerê di navbera Şêx Mehmûd û tirkên de nakokî peyda bû û ji ber vê yekê Şêx Mehmûd bi hêzên xwe yên leşkerî ve vegerya Silêmaniyê. Ev bûyer bû sedemê têkçûna têkiliyên wî û tirkên.

Îngilizan di 7ê Nîsan 1918 de Kerkûk dagir kirin. Peywendîya Şêx Mehmûd û îngilizan beriya dagirkirina Kerkûkê pêk hatibû. Piştî ku hêzên îngiliz ji Kerkûkê hilkişyan û bajar çareka di kete bin kontrola tirkên, heman demî qumandarê leşkerî yê tirk, îstixbarata naveroka nameya Şêx Mehmûd ku ji bo îngilizan hatibî verêkirin bidest dixe. Ji ber vê yekê biryara girtina Şêx Mehmûd didin û wî bi minasebeta vexwendinekî bi bêbextî digrin. Ji bo darezandinê bi lezûbez mehkemeyeke leşkerî dadimezrîn û di encama darezandinê de biryara darvekirinê bo wî didin. Lê ji ber ku tirk ji dawîya biryara darvekirinê ditirsin; ji bo ku di nav xelkê de nerehetî peyda nebe û serhildan çênebin, dev ji biryara darvekirinê berdidin û wî jî serbest dihêlin.

Piştî ku Elî îhsan Paşa bû mesulê Orduya 6mîn a li Îraqê, xwest ku ji Şêx Mehmûd îstîfade bike. Ji bo ku dilê Şêx Mehmûd bigre, wî vedixwîne bo Musilê. Li Musilê bi rêzgirtin û

mêvandariyeka baş wî vedihewîne û jê dixwaze ku bibe serqumandarê herêma Silêmaniyê. Ji bo vê erkê çek û pêdivîyên leşkerî jî didine wî. Li gor peymanan navbera wan, Elî îhsan Paşa waliyê Silêmaniyê ji wezîfeyê digre û desthilatdariya Silêmaniyê dewrê wî dike. Bi vê awayê Şêx Mehmûd dibe waliyê Silêmaniyê û bi navê hikumeta osmanî îdareya Silêmaniyê werdigre."⁹

Şêx Mehmûd Dibe Qralê Kurdistanê

Hêzên îngilîz bi serokatiya General Marshall di 7ê Nîsana 1918an de Kerkûk û Silêmaniyê jî xistin bin desthilatdariya xwe û hemî Kurdistanê Îraqê dagir kirin. Peywendîyên Şêx Mehmûd û îngilîzan beriya dagirkirina Kerkûkê çê bûbûn. Şêx Mehmûd, ji bo ku îngilîzan bona damezirandina hikumeteke kurd razî bike, ji alîkî ve peywendîyên xwe yê digel rewşenbîr û serokeşîrên kurdan berfireh û xurt dikir, ji aliyê din ve jî bazariya bi îngilîzan re berdewam dikir. Di vî çarçovê de "ji bo şirovekirina vê rewşa nû, digel hinek malmezin û giragîrên bajarê Silêmaniyê civînek girêdan û di vê civînê de biryareka hevpar wergirtin ku nameyek bo serkumandarê îngilîz verêkin Kerkûkê. Di vê nameyê de jî îngilîzan dihate xwestin ku ji bo damezirandina hikumeta Kurdistanê temînatekî ji bo wan bête dayîn. Digel vê yekê jî îngilîzan dihate xwestin ku Şêx Mehmûd jî di bin çavdêriya

îngilîzan de bibe serokê vê hikumeta kurd."¹⁰

Ev pêşniyara wan ji aliyê îngilîzan ve hate qebûlîkirin û "bi cenabê Şêx Mehmûd re rêkevtin bo damezirîna hikumeteke millî ya Kurdistanê li bin serokatîya cenabê Şêx de pêk anîn û di 1919 da unwanê hikumdarî û melîkî dan Şêx."¹¹ Noêl ê nûnerê hikumeta Brîtanyayê jî bû alîgirê wî. Demekî ahenga herdu aliyan baş bû. Piştî ku di şûna Noêl de Mécerson hate tayînkirin, peywendî û ahenga herdu aliyan ber bi xerabûnê ve diçû. Şêx Mehmûd nekarî zêdetirîn dem tehamula pozibîndî û mudaxleyên Mécerson bike. Her rojek peywendîyên navbera wan lawaztir dibûn û helwesta wan a miqabilê hev diwartir dibû. Paşê ev yek gehîşte qonaxa pevcûnê. Di navbera herdu aliyan de li gelek cîyan pevcûnên dijar çêbûn. Di vî şerî de jî aliyê hêzên çekdarî ve muqayesekirina hêzên Şêx Mehmûd û artêşa îngilîz ne mimkun bû. Digel vê yekê jî, Şêx Mehmûdî berxwedaneke bi qehremanî kir û dawiyê li herêma Derbendê Bazîyan de roja 19/6/1919 bi birîndarî kete ber destê îngilîzan. Wî û hevalên pêre bo mahkemekirinê şandin Bexdayê.

Şêx Mehmûdî li pêşberê mahkemeyên îngilîz de gelê kurd şermazar nekir, bi wêrekî û mêranî parastina xwe û doza gelê xwe kir. Şêx Mehmûd

⁹ (Refik Hilmî, *Anlar(Bîranîn)*, s. 18, nûjen yay. İstanbul 1995)

¹⁰ Refik Hilmî, *Anlar(Bîranîn)*, s. 18, nûjen yay. İstanbul 1995

¹¹ Mela Xalid Ezîzê Motkî, *Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmûdê Heşd*, Kovara BÎR, hejmar: 1, r. 65, Bihara 2005an-Amed

dema ku li Bexdayê ji bo başkirina birinên xwe li nexweşxaneyê tête dermankirin, Wîlson ê mesulê eskerî yê îngiliz diçe serdana wî, helwesta û gotinên wî yên wê gavê wisa tîne ziman:

"Ne ku mehkemeya eskerî ya îngiliz, tu mahkemeyekî ne xwedî selahiyeta darezandina min e. Lewra ez bi biryara dewletên hevpeyman bûme hikumdarê xelkê xwe. Şerê min ê li pêşberê dewleta îngiliz, şerekî rewa yê doza gelê kurd û Kurdistanê ye. Ev, heman demî wezîfeya min bû."¹²

Di dema darezandinê de, mehke-me bi îsrar dixwaze ku ji wî re parêzvanekî (abokatekî) bête tayînkirin ji bo parastinê. Ew jî bi tundrewî vê daxwaza wan red dike û dibêje:

"Min bi we re şer kir û ji aliyê we ve hatim destgirkirin. Vê gavê jî ji aliyê we ve hatime hepiskirin. Ji ber yê yekê, em dijminê hev in. Hun dijminê min û gelê kurd in. Ji ber vê, ez ji we hêviya edalet û helwestekî adilane nakim. Lewra hukmê (biryara) ku ji aliyê we ve bête dayin, ez ji nûha ve red dikim û qebûl nakim. Lewra dijminekî di derheqê dijminê xwe de biryareke adilane nade."¹³

Paş mehkemekirinê, bo Şêx Mehmûd biryara darvekirinê hate birrîn. Pişt re ev biryar ji aliyê Londrayê ve ji bo hepiskirina 10 salan û paşê jî wek neffikirina (sîrgûnkirina) ji bo Hindistanê hate guhartin. Dawî-yê Şêx Mehmûd û pismamê wî Şêx

Heme Xerîb şandin Hindistanê. Şêx Evdilqadirê birayê Şêx û Seyîd Ehmed û çend mirovên bi navûdeng jî li Bexdayê hepis kirin.

"Silêmanî tenê ma ji îngilîzan re. Mîcerson bi navê *Pêşkewtîn* dest bi weşandina rojnameyeke kurdî kir û sed û hijdeh hejmar jê derçûn. Ku ev kiribû rojnameyeke zimanê halê hikumetê. Ev rewş wisa dewam kir heta sala 1922yan ku hikumeta Brîtanyaya Mezin têgehîşt ku bê cenabê Şêx Mehmûd nikare ji Kurdistanê îstifade bike. ...neçar ma ku sîyaseta xwe ya derbarê Kurdistanê bigorîne."¹⁴

Têkçûna hikumeta yekem a Şêx Mehmûd û dîrxistina wî ya ji bo Hindistanê, ji bo çareserkirina mesela kurd û aramiya Kurdistanê nebû çareserî. Îngiliz, ji alîkî ve bi serhildana kurdan re mijûl bûn û ji aliyê din ve jî bi derxistina tirkên re mijûl bûn. Ji ber vê, îngilîzan dixwestin bi rêka çareserîya mesela kurdan, tirkên Jî ji Kurdistanê Başûr derxînin. Ji bo vê yekê îngilîzan dixwestin: "1- ji bo rawestandina serhildanên kurd, pêdivî bû bi awakî rêvebirina îdarî ji kurdan re bihata dayin. 2- Bi rêka kurdan derxistina Ozdemîr Paşa û hêzên tirkên li Rewanduzê. 3- Bi rêka pîrniya nifusa kurd bidestxistina Musilê, ku ji aliyê rezervên petrolê ve herêmeke dewlemend bû.

Kurdan li Îraqê berîya ereban serî hildabû û ji bo demeke kurt be jî tehma azadiyê girtibûn, nedixwestin carekî dî bikevin bin rêvebirîya

¹² Kovara BÎR, hejmar: 2, r. 69, *Mehkemekirina Şêx Mehmud*

¹³ Jêdera berê r. 70

¹⁴ Mela Xalid Ezîzê Motkî, *Mêjîyê Hikumdariya Şêx Mehmudê Hejîd*, kovara BÎR hejmar: 1, r. 66, Bihara 2005an- Amed

îngilizan. Ji ber vê yekê, du rê li ber wan hebûn: 1- Ji bo rizgariya Kurdistanê berdewamkirina şerî, 2- Li miqabilê îngilizan bi mesulê tirk Ozademîr Paşa re hevkarî kirin.

"Ev herdu çareserî jî, ne li gorî siyaseta îngiliz bûn. Ji bo ku kurd mecburê van herdu tercihan nebin, Îngilizan xwestin hikumeteke nûh a kurd bête damezirandin."¹⁵ Ji bona vê, diviya Şêx Mehmûd ji Hindistanê bihata vegerandin. Ji bo vê, jixwe ji aliyekî ve jî zixt û daxwazên gelê Kurdistanê li ser Wîlson hebûn. Piştî tengasî û zahmetiyên dûrxistina sê salan, ji aliyê hikumeta Londrayê ve destûra ve- randina Şêx Mehmûd hate derxistin.

Di vê navberê de Melîk Feysal, di 24ê Hezîrana 1922ê de gehîşte Besrayê û di 11yê Temmûzê de ji aliyê Konseya Dewleta Îraqê ve wekî qral hate îlankirin. Li pey wê, hilbijartineke şiklî hate kirin û di vê hilbijartinê de bi rêjeyeke gelek zêde ev biryar hate erêkirin. Lêbelê kurdên Silêmaniyê bi tevî vê hilbijartinê nebûn. Feysal, di 23yê Tabaxa 1922yê de derkete ser textê qiraliyetiya Îraqê.

Şêx Mehmûd dema ku ji Hindistanê vegerya, raste rast hate Bexdayê. Piştî hevdîtin û kombûnên ligel mesûlên îngiliz û Kral Faysal, biryar hate girtin ku Şêx Mehmûd bibe serokê Meclîsa Millî ya Kurdistanê. Ji wê pê ve êdî sefera hatina ber bi Kurdistanê dest pê dike. Ji bo pêşwazîkirina Şêx Mehmûd, ji aliyê Meclîsa Millî ya Kurdistanê ve amadekariyên pêşwaziyê têne destpê-

kirin. Refîq Hîlmî, yek ji endam û rêvebirê komîteya amadekariyên pêşwaziyê bû. Li her derê bajarê Silêmaniyê amadekariyên bo pêşwazîkirina Melîkê Kurdistanê hatibûn kirin û li ber Meclîsa Millî ya Kurdistanê jî alaya Pîroz hatibû hilkirin. Di roja şemî ya 30ê Eylûla 1922yan de peyama hikumdarê Kurdistanê ji gundê Darkelê ve gehîşte Silêmaniyê. Roja ku Şêx Mehmûd gehîşte bajarê, "serbazên pîyade û şagirtên mekteb, ku ev şagirtan her yek alayeka pîroz a Kurdistanê bi dest ve bûn, bi temamî di rêza edebê de bûn û hemû dukan û bazar daxira, ehlê welat û eşret û qebîle bi siwarî û pîyadeyî heta du seat rê komel bi komel rêz bûbûn. Seat şeş û nîvê rojê hezretî hikumdar geyiştê bajarê Silêmanî yê payetextê Kurdistan. Heman dem û dest (21) top agir da. Û ji aliyê lejker û şagirdan ve li mekteban resmî selam hate cî bi cî kirin, şagirtên mekteban goranîyên millî û niştîmanî xwendin. Li ser xan û banê malan jinan û mindalan hemûyan gulaw û gulan dixiste xwarê ve, têkra gulbaranî hezretî hikumdar dikir û bi deng digot bijî melîkê Kurdistan Şêx Mehmûd! bijî kurd û Kurdistan! Ev dengê xweş navbeyna erd û esmanî pirr kiribû."¹⁶ Şêx Mehmûd, ji aliyê gelê kurd ve bi coş û heyecaneke mezin hate Pêşwazîkirin. Piştî bînvedaneke kurt, Şêx Mehmûd û Noêl derketin pêşberê gel, bi axaftineke kurt xêrhatina wan kirin û kabîneya nûh a hikumetê îlan kirin. Piştî îsterhetekî qasê 10 rojan, Şêx

¹⁵ Refik Hîlmî, *Anîlar(Bîranîn)*, s. 60, nûjen yay. İstanbul 1995

¹⁶ Kovara BÎR, hejmar:2, r. 53, *Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmûdê Hefîd*

Mehmûdî dest bi xebat û gera ji bo qeze û bajarên din ên Kurdistanê kir.

"Bi munasebeta alaya muqedes a Kurdistanê ku li Helebçe û Çemçemal bi destê rêvebirên hikumetê hatiye helkirin li ev navçeyan da, hezretî melikê Kurdistan "Melîk Mehmûdê Yekem" vê gotarê fermûye:

Ey birayê min ên xoşewîst!

Hikumeta Kurdistan ku li alemê beşerîyet da bi xelkê medenî ra şan bi şanî kiriye û li rûyê zemîn da şeref û nav û nîşanê xwe peyda kiriye. Bo dewam û tewsi'î ev hawalê nuqteyê nezer û xayeya wî her ewe ye, ku bi gîyan û cîger û bi hemû mewcûdîyetê xwe ve îqdam û îhtirama we bike. Zatan çavê me li afaq û cereyanên sîyasî yên derve ye. Tecrûbeyê dûr û dirêj û gewre yê me jî bi deste ve ye. Tarîxê ku ji teker-rûrê îbaret e, em jî ligel şanazî ne, dersekî îbretê jê bête wergirtin. Êdî em bo hiqûq û sînorê xwe xebat û tekoşînê dikin. Bi kurtî xaka pak a ew cîyana ku niha bi dest bîyaniyan ve ye, heta nedîne dest îdareyê hikumetê millî yê Kurdistan û nîmet û hiqûqê azadî û serbestî ku bi ser cîranê derûdora me ve hatiye bexşîn divê bo me jî rewa bête dîtin. Û em şahidê mirazê xwe negirîne bawîşî, serkizî, bêdengî, acizî û me'yûsîti qeyd û qebûl nakin. Çinku li korê erz da hemû millet; ermenî û cuhûyan jî ji esaret derçûn, li jêr destê bîyaniyan rizgar bûn. Bi kamran û umîd û arezûyê xwe azad û dîlşad bûn. Kurdistan ku bi hemû babetek ve ji emsalên xwe ne kêmtirîn e û heqê jîyan û qewmîyetî îsbat kiriye. Bi taqî ew tenha êdî

paşkevî û beşxwar e, nabî.

Kurdistan ku heqîqet û tebîetê wê cîya kiriyete. Dîyar e bi piçir piçir nayête parçe parçe kirin. Û bi kutleyekî umûmî nejî û nehatiye îdare kirin. Li dawiyê tûşî felaket û peşîmanî dibî. Ku wateya wê ev e, hemû kurdên sahib fikir û aza li pêşve pêwîste vê nuxteyê jî bîne berçav.

Ciyê umîd û mayeyê zindekî her îqbal û îstîqbal e. Bo wê ku li newpaşî bi sûretekî pak û çak ve li nav hikumet û milletan da bi îzet û hurmet ve bijîn. Êdî li şahrahî teraqî û medenîyet da çend gavan biçine pêşve. Bo muhafîzeyê mewcûdîyet û seadetê mulk û millet. Bo sendina hiqûq û hidûdê xwe yê xwezayî. Êdî yekdil, yekwîcûd, bi heskirinekê bê kîn. Enwayî renc û meşeqqet û fedakarî û metanet îxtiyar dikin. Bo seadetek yekcarî, mandîbûna çend rojên kemalî çî ye "divê ji bo xatîrê gulek, qehrê sed striyan bête kişandin". Em milletê kurd ku heq û heddê xwe dinasin. Her dem umîd û arezûyê xêr û xoşî li cîranên xwe yên muhterem dikin. Û hemû wextê li gelê cihetê ve muxtacê hîmmet û destê alîkariya hikumetên wan ên gewre ne.

Bê guman her hikumetê ku destê muhabet û merhemetê bidate me û hiza bi muawenet û همراهê me biket, bînuqabile em jî bo wan li xizmet û hurmetê da fîtûr û qisûr nakin. Û bo dewama ev dostî û sîyasetê û menfetê herdu aliyan qazanc ji hevûdû dikin.

Helbet karûbarê navdarên hikumet û aga wan li miraç û îştîyaqê efkari hemû millet heye. Ji ber wê emnîyet

û umîda me heye, ku em sîyaset û tertîbatekî weha dabimezrînî ku hemû Kurdistan bi wê rûsor û kêfxweş be. Û li wezîyetê hikumeta hazir wextê tevgera hikumet zor minetdar û sipasî guzar in. Hêviya me ew e ji gencên nîştimanperwer ji vê zêdetir şewqê wan bikar bînin. Êdî her bijî hikumetê millî yê Kurdistan!"¹⁷

Dema ku Şêx Mehmûd li Hindistanê bû, Ji alîkî ve karbidestên îngiliz gelek neheqî û zahmetî dabû gelê kurd û ji aliyê dî ve jî tirkên di nav eşîretên kurdan de xebateke baş kiribû, ji ber vê hinek eşîretên kurdan xwe nêzîkê tirkên kiribû. Piştî ku cardin tîkiliya kurd û îngilîzan xera bû, kurdan xwe nêzîkê tirkên kirin û xwestin ji nûh ve bi wan re tîkilî deynin. Beriya ku hêzên tirk werin Rewanduzê, li herêma Ranya û Koyê (Koyancax) û Şawir û Rewandizê de li hemberê îngilîzan reaksiyonên tundrew hatin nîşandan. Wê demê Elî Şefîk begê ku bi navê Ozdemîr Paşa tête nasîn bi 200 leşkerên xwe ve hatin li Rewandizê bici bûn. "Wan rojan merivê herî nêzîkê tirkên, Tahîr Emîr Efendî bû û bi xwe jî sekreterê yekemîn ê Şêx Mehmûd bû û ji sîyaseta tirkên re xîzmet dikir. Bi rastî jî temsîlkarê tirkên û Ozdemîr Paşa yê li nik Şêx Mehmûd bû. Bi rêka alîgirên tirkên, bi Şêx Mehmûd dabûn bawerkirin ku dê Musil cardin bikeve destê tirkên. Ozdemîrî bi xwe jî, bi gotinên dînî û cîhadî tesîr li ser Şêx Mehmûd kiribû. Bi wî dabû bawerki-

rin ku dê Mistefa Kemal Kurdistanê bike wîlayetek û Şêx Mehmûdî jî bike walîyê wê. Bi vê awayê li Kurdistanê cardin giraniya hêzên tirk derkete pêş."¹⁸ Wê demê tirkên li her derê derbarê welatparêzên kurdan de propagandayên neyînî dikirin û wan bi alîkarî û xulamtiya îngilîzan suçdar dikirin.

Bi rastî mejiyê Şêx Mehmûd jî ne zalal bû, derûdora wî bi kesên alîgirên tirk û dijminê îngilîzan ve hatibû pêçandin. Şêx Mehmûd jî di xuyayî de bi îngilîzan re bû, lêbelê bi awakî veşartî jî bi tirkên re bazariyê dikir. Di rastiyê de Şêx Mehmûd ne bi tirkên û ne jî bi îngilîzan ewqas bawer nebû. Dema ku ji Hindistanê vegerya, li Bexdayê ligel Mesulê Samî yê îngilîz û Kral Faysal civînekî kirin û di vê civînê de ji aliyê herduyan ve soza damezrandina hikumeta kurd ji bo Şêx Mehmûd hatibû dayin. Wî digot:

"Eger îngilîz li ser soza xwe bisekinin û ji bo damezrandina Hikumeteka Kurd ji me ra alîkarî bikin, wê demê ez jî dikarim li hemberê tirkên kurdan berhev bikim û li dijberê wan rawestim. Lêbelê ku tu hêviyekî tune be ez nikarim hêzeke wisa berhev bikim. Ku tirk bi hêza leşkerî Musilê cardin bigrin û li wê derê desthelat bin, wê demê dê kî ji me re bibe alîkar. Em nikarin bi vê awayê bawerî bi îngilîzan bikin. Ku îngilîz li ser soza xwe neseकिन û ji bo damezrandina Hikumeta Kurdistanê ji me re nebin alîkar, em nikarin xwe biavêjin nav agir."¹⁹

¹⁷ Kovara BÎR, hejmar:2, r. 62-63, *Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmûdê Hefîd*

¹⁸ Refîk Hilmî, *Anîlar(Bîranîn)*, r. 108, nûjen yay. Istanbûl 1995

¹⁹ Jêdera berê, r. 132

Ji van gotinên Şêx Mehmûd dîyar dibe, ku alternatîfeke ji dervayê îngilîzan jî mimkun e. Ew jî, peymana bi tirkên ve hatiye çekirin û waadên wan in. Piştî ku çanteya poste yê navbera Rewandîz û navçeya Cizîra Kurdistanê Bakur dikeve ber destê îngilîzan, perdeya li ser têkilî û namegorîna Ozdemîr û Şêx Mehmûd radike û têkiliya wan derdixîne holê. Li gorî hinek lêkolîneran metna peymana navbera Mistefa Kemal û Şêx Mehmûd jî, ji aliyê îngilîzan ve hatibû bidestxistin.

Di belgeyên arşîva Rusya Federal de naveroka peymana navbera Şêx Mehmûd û tirkên bi vî awayê hatiye dîyarkirin:

1-Dewleta Tirk soza serxwebûnê dide, bi şertê ku ligel welatên din peywendîya wan çê nebe.

2-Dewleta Tirk, Şêx Mehmûdê Berzencî wekî hikumdarê Kurdistanê Başûr nas dike û ji bo bajarê Silêmaniyê mafê damezirandina Meclîsê dide.

3-Sînorên Kurdistanê Başûr: ji aliyê bakur ve hetanî qeza Şemzînan, ji alî başûr ve çiyayên Hemrîn, ji aliyê rojhelat ve Îran û ji aliyê rojava ve jî digîje Dîjleyê.

4-Dewleta Kurdistanê Başûr xwediyê mafê damezirandina artêşa (orduya) xwe ye.

5- Tirkîye bikeve şerf, Kurdistanê Başûr mecbure ku piştgiri bide wê.

6-Mafê Tirkîyê heye ku leşkerên xwe ji Kurdistanê Başûr derbasê cîyekê di bike, bi şertê erkêkirina Hikumeta Kurdistanê.

7-Dewleta Tirkîyê dikare piştgiriya

maddî û manewî bide Kurdistanê Başûr.

8-Hikumeta Kurdistanê Başûr, ji bo parastina xwe dikare biryara bicikirina leşkeran di sînorên xwe de bide."²⁰

Ev bûyer, bû sedemê qetandina heleqaya dawî ya navbera Şêx Mehmûd û îngilîzan. Piştî ku têkiliyên Şêx Mehmûd û îngilîzan bi temamî têkçû, îngilîz ji bo ku Şêx Mehmûd ji Silêmaniyê derbixin, di roja 3/3/1923an de bajar bombarduman kirin. Şêx bi neçarî roja dîtir bi tevî qismek hêzên xwe ve bajar terk kir û çû herêma Sûrdestê. "Belam Şêx Heme Xerîb ligel Riza Beg û Evdremaxanê Ehmed Paşa da, bi piştgiriya Kerîm Begê Fetah Begê Hemewend, li wê maye û maweyekî di bi navê Şêx hikim li Silêmanî kirine."²¹

Piştî ku Şêx Mehmûd ji Silêmaniyê derçû, demeke li Sûrdest ma û paşê baregayê (qerargaha) xwe bire Qemçûxê û ji wê derê jî birin Şikefta Casena. Bangî Heq jî li vê şikeftê wekî weşana Baregayê Giştî yê Leşkerê Kurdistan di roja 28ê Adara 1923yan de dest bi weşanê kiriye û bi tenê sê hejmar hatiye çapkirin. Dema ku Şêx Mehmûd li şikefta Casenayê bû, Ozdemîr ji Rewandûzê ve diçe nik

20 www. Newroz.com. Arşîva Wezareta Derva ya Komara Federal a Rusya, beşê rojhelat û dosya hejmar 106. Ev belge, di encama hevdiitina Dubson Erkadî Borisovic ê konsolosê Urmîyeyê û Ehmed Takî yê temsîlkarê Şêx Mehmûd de, wek raporteka veşartî ji bo Wezarreta Derva ya Komara Federal a Rusyayê hatiye amadekirin.

21 Kovara BÎR, hejmar:1, r. 64, Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmûdê Hefîd.

wî û jê daxwaz dike ku hêrîş bibe li ser Hewlêr, Koyê, Kerkûk, Kifrî û Xaneqînê. Armanca tirkên ev bû, "di Kurdistanê de dijminatîya li hemberê îngiliz û fransîzan teşwîq bike û vê yekê ber bi pevçûnekê bibe, da ku pêşiya yekgirtina kurd û bîyaniyan bête girtin."²²

Li hember ev hewldanên tirkên, rewşenbîr û supayên kurdperwer ên wekî: "Îzzeddîn Topçî, Emîn Rewandizî, Elî û Ezîz Kurdî û Reşîd Şewqî û Ezîz Hikmet Qezaz û Mecîd Tuarşî û Nûrî Beg û Fayîq Kak Emîn û Xalid Seîd hev girtin û hewl dan ku Şêx li turkan bite-qîne, lê hewldana wan serî negirt."²³

Roja 8/5/1923 firokeyên îngiliz li ser bajarê Silêmaniyê û qezayên wî de belavok darijandin. Di vê belavokê de dîtî û nêrînên ciyawaz ên nûnerê Îngiliz û hikumeta Îraqê weha anîbû ziman: "Li gor Hênrî Dobs weha bû, heta ku Şêx azad be, hîç îdareyekî Silêmanî mayîna wê çareser nabe. Ji ber vê, eger neyê kuştin yan neyê dîlgirtin, baştir ew e ku em bi gel ra rêk bikevin. Heçî hikumetê Îraqê ye jî, rageyandina wî ya 25/12/1922 ê ku bîrûraya xwe dîyar kir. Tê da mafê kurd nebû, bo pêkanîna hikumetê kurdî di çarçova Îraqê da û sûr bû li ser tund bestîna Silêmanî bi Bexdayê ve."²⁴ Şêx Mehmûd xeteriya rewşê têdigîje û ji bo fêmkirina fikra îngilîzan nameyek dişîne Bexdayê ji nûnerê bala yê Mendubê Samî re. Di bersîva nameya wî de ji wî re tête

gotin: divê yan tu yê bê Bexdayê ji bo qisekirinê yan jî em dê hêrîş bikine ser Silêmaniyê. Şêx bi ya wan nake. Ji vê şûnde îngiliz dest bi hereketê dîkin. "Hêza nû ya îngiliz 14/5/1923 geyîste Çemçemal. Şêx her wê rojê nameyekî bo fermandeyê stunekê îngiliz li Kerkûk nûsî ku ji Çemçemal neyête pêş ve. Roja 15/5/1923yê jî Casenê terk kir û bi rêya "Şêx Bax" da çûye Mawet û Şarbajêr û dawîyê li wê tê "Birince"ya Hewraman nişteci dibe. Wê demê biruskeyekî bo hemû balyozên bîyanî şande Tehran û nerezayîya xwe tê da derbirî dijî çewsandin û serkûtariya îngiliz û ji wan dawa kir ku yarmetî bidîne."²⁵

Hêzên îngiliz ji Çemçemal bi ber ve Silêmaniyê birêketin, roja "16/5/1923 geyîştin Serçinar(ciyekî havîngeh ê Silêmanî ye). Roja pêştir (15/5/1923) bi firoke name bo malmezinên bajar belavkirin. Ew jî roja 16/5/1923 çûne Serçinar. Edmonds heman rojê ligel ew sergewreyan hate nav bajar. Ehmed Begê Tofîq Beg kire serpereştê giştî yê dayreyan û Şêx Qadîr bû berpirsê asayîşa giştî û Mecîd Efendî jî bû rêvebirê pêşî û teşkilatê polis birêxiste. Ew hêzan destê wan di komala navçeyên dewrûberê Silêmanî û bi taybetî Sûrdaş û Merge da hebû. Paşê piştrast bûn evcar di 28/5/1923 da çûne nav bajar. Li wê demê jî duwem dewranê hukmê rastewxoyê îngiliz li bajar da destpêkir."²⁶

Her ew mang nûnerê bala ev beyannameya resmî di rojnameyên

²² TBMM. Gizli Celse Zabıtları, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, Ankara, 1985, Cilt: 3, Sayfa: 550

²³ Kovara BÎR, hejmar: 1, r. 126, Bihara 2005an-Amed.

²⁴ Kovara BÎR, hejmar: 1, r. 127, Bihara 2005an-Amed.

²⁵ Jêdera berê r. 127.

²⁶ Jêdera berê, r. 127.

Bexdayê de belav kirîye: "em dizanin Şêx Mehmûd gelek name şandiye û derxistîye ku layengirê hikumet e û hej ji xizmeta wî diket. Di bersîvê da ji wî ra gotine: eger bête Bexda, li ser muhalefetkirina li hember hikumetê tûşî ceza nabê. Rê jî didinê ku ligel xêzana xwe li Bexda dabinişe. Wê demê li vira bi rêz mamele bi wî têtê girtin û bo wî azadî têtê dayin, demêkî hewl nedet bi bê molet li Bexda têtê bicîkirin"²⁷

Roja 2/6/1923 serokwezîrê Îraqê Abid Elmihsîn Elsahdunî bi tevî heyeta xwe û nûnerê îngiliz Henrî Dobs gehîştin bajarê Silêmaniyê. Dixwestin bajêr wek lîwayekî bi rûyê îdarî ve bixine ser Bexdayê ve. Ji bo vê "Ligel malmezîna û serokên kurd kombûn. Bo wan derket ku kurdê Silêmanî navên hîç deshelatêk hikumeta Îraqê li serê wan da hebê. Ji bo vê, biryar dan ku bîmênête heta çareserîkî jê re bibînin ku hemû layekî pê razî be. Edmonds 2/6/1923 pêşniyarê wan kir ku encûmenêkî îdarî yê kurd bi serokayetîya gewreyekî bajar ku bi dilê nûnerê bala yê îngiliz û Melîk Feysel be, bête damezirandin. Kurdî zimanê resmî yê lîwa Silêmanî û Silêmanî jî lîwayekî Îraqê be û pareyê ji bac girtinê dihate komkirin bo rêxistina karûbarê birêvebirina lîwa bihata terxankirin û xerckirinê. ... Ew pêşniyar roja 3/6/1923 di kombûna wefdeke û gewreyên bajêr da hate berçav xistin. Aliyê kurdî biryara pesendkirinê da."²⁸

²⁷ Jêdera berê, r. 127

²⁸ Jêdera berê, r. 128

Digel ku ev biryar ji aliyê malmezîna û giragîrên bajar ve hate pesendkirin jî, gelek kêmanî û valayî têtê hebûn. Ji ber vê, ev şeweyê hikmê rastewxo yê îngiliz jî zêde berdewam nekir. Wê demê Şêx Mehmûd bi navê Xemze li gundekî nêzîkê bajêrê Silimaniyê niştêcî bû. Piştî ku hêzên îngiliz ber bi Kerkûkê ve hilkişyan, di serokatiya Kerîm Fetah Begê Hemewendî de leşkerên kurd bi navê hikumdariya Şêx Mehmûdî cardin desthelatiya bajarê Silêmaniyê bi dest ve girtin. Şêx Mehmûd jî roja 26/2/1923yan gehîşte nav bajarî û xebatên damezirandina hikumeteke nûn dest pê kir.

Hikumeta Sêyemîn a Şêx Mehmûd, di serê meha Temmûza 1923yan de hate îlankirin. Beriya damezirandina hikumeta sêyem, ji aliyê dewleta merkezî ya Îraqê û rêvebirên îngiliz ve qezeyên wekî Çemçemal, Ranya, Qeladiz û Helebce ji bajarê Silêmaniyê hatibûn veqetandin. Piştî ku hikumeta nûn hate damezîrandin, di dawîya Temmûza 1923yan de, cardin Şêx Mehmûd dest bi ser qeze û nahiyeyên cûdakirî de girt û ji bo nûnerê gewre rageyand ku van deveran cardin vegerînin bi ser bajarê Silêmaniyê ve. Lêbelê ev daxwaz ji aliyê nûnerê gewre yê Îngiliz ve hate redkirin. Şêxî kontrolkirina xwe ya li ser van deveran berdewam kir.

Bi minasebeta ku Şêx Mehmûdî dest danîye ser van qezeyan û hatûşûnê qedexa kiriye, roja 16/8/1923yan bi taybetî Baregayê Şêx Mehmûd û mala wî bi firokeyên îngiliz têtê bombardemakirin. Bi vê bombardumanê, cara yekemîn bû ku

hêzên hewayî yên îngiliz li Rojhelata Navîn têne bikaranîn. Melîkê Kurdistanê li ser vê bûyerê, nerazîbûna xwe ji bo nûnerê gewre yê îngiliz diyar kir. Ji bo vê, melîkê Kurdistanê çendîn name ji bo nûnerê gewre yê îngiliz verêdike Bexdayê, da ku nûnerê xwe bişîne Silêmaniyê ji bo hevdiştin. Henrî Dobs bi nameya xwe ya roja 12/11/1923 weha bersîva wî dide: "divê bête Bexdayê ku em çarenûsa Silêmaniyê bi hev ra bipeyvin."

Di nav vê gelemşe û danûsendinan de, Wezareta Malîye yê Hikumeta sêyem a Şêx Mehmûd, di destpêka sala 1924an de pûlên xwe çapkirin ji bo rêvebirina karûbarê resmî yê daîreyan. Ji bo rêkûpêk kirina karên daîreyên resmî, hinek projeyên din jî hatibûn amadekirin. Ji ber van bûyeran îngiliz û hikumeta Îraqê gelek aciz û nerehet bûn. Roja 20/5/1924an ji aliyê firokeyên îngiliz ve gelek belavok li ser bajar û qezeyên Kurdistanê Başûr ve hatin belavkirin û paşê jî bi berdewarî hatin bobardumankirin. Ji ber vê bombardumanê, Şêxî roja 25/5/1924 bi nameyek nûnerê îngiliz agadar kir ku ew û çekdarên xwe bajar terk bikin. Di encama vê bobardumankirinê de ji 20 hezar daniştvanên bajêr, tenê 700 kes mabûn. Xelk hemû koçberê gundên dorberê bajêr bûbûn. Dîmeneke ji wan rojan ji aliyê nivîskarê *Ûmîdî Îstîqlal* Ehmed Xoce ve weha tete diyarkirin: "Li hemû serban û malan billêseyê agir helestê, xanî wêran û kaviil bi ser hev da rûxabûn, bajarê çol û bêxwedî. Li jêr bomba û mîtraloyan da jin û mindal û pîr

ketibûn deşt bi bê xûrek û aw û bi pêxwasi".²⁹ Piştî vê bobardumankirinê, careke dî bajarê Silêmaniyê bi alîkariya leşker û polîsên Îraq û hêzên piyade yên îngiliz ve roja 25/5/1924an hate dagîrkirin. Şêx Mehmûd, beriya ku bajar ji nû ve bête dagirtin, terka bajarî kiribû. Şêx Mehmûd ligel qismek hêzên xwe yên leşkerî li ser sînorê belav bûn. Bi lihevhatineke zimmî hetanî serê sala 1927an li wan deran li gundekî niştêcî bûn.

Şêx Mehmûd, "bi qewimîna şerê ber deriyê seraya Silêmanî li 6/9/1930 da û peywendî danîna bi sê efser û çend kurdperwerêk pê ve, rêkevtina navberê şikand û hate Emdîw û li wê jî çûye Germîyan. Di vê navberê de ji serokê Meclîsa Şewirmend a Neteweyên Yekbûyî re, bi navê gelê başûrê Kurdistanê nameyekî verêdike, ku tede hatiye gotin:

"Paris 21ê Adara 1931

Ji Bo Berêz Serokê Meclîsa Şewirmend a Neteweyên Yekbûyî

Berêz,

Ez pê serbilind im ku ji bo agadariyê gazindên neteweyekî ku di bin wesayet û hîmaya we de ye pêşkêşê cenabê we dikim. Lewra wesayet, tê mana hîmayekirinê. Ev netewe, di beşê başûrê welatê kurd de dijî û bi Îraqê ve hatiye îlhaqkirin. Ez bi xwe wekî endamekî vê neteweyê pê serbilind im.

Ez bala we dikşînim ser vê yekê; her wekî mesela Mezopotamyayê, ew

²⁹ Kovara *BÎR*, hejmar:1, r. 131, Bihara 2005an-Amed.

erdê kurdan ku bi Îraqê ve hatiye îlhaqkirin, ji aliyê artêşa(orduya) hêzên mûtefiq û îtilaf ve nehatiye fetihkirin. Bawer dikim agadarkirina we ya di derbarê vê yekê de wezîfa min e. Kurdan di sala 1918an de bi hewldanên xwe dest bi tekoşîna çekdarî kirine û yekîneyên leşkerî yên tirk mecbur kirine ku ji welatê wan derkevin. Piştî vê, serxwebûna xwe ragehandine û ji bo rêvebirinê "Hikumeta Başûrê Kurdistanê" damezirandine. Di wê demê de Îraq di nav anarşiyê de bû. Li vê derê şerê yekîneyên hêzên dewletên Mûtefiq û îtilaf berdewam dikir. Mixabin ku pişt re erdê me ji bo Îraqê hate îlhaqkirin. Û ew awrupaya ku dibêje min ji bo parastina heq û hiqûq û edaletê dest bi şerî kiriye, ji ber vê bêedaletiya berçav dengê xwe der-naxîne; hiqûqî nebe jî bi fîlî hikumeteke me heye, di vê rewşê de qeder û dahatûya me bi neteweyêke dî re tete girêdan ku em ji aliyê qewmî, fîzyolojî, dîrokî, zîman, adet û toreyan ve ji hev cûda ne. Ligel vê, ji aliyê Cemiyetaya we ya gewre ve waadkirina muxtarîyeteke berfireh ji bo başûrê Kurdistanê, bi hindikayî be jî vê bêedaletiyê hinek sivik dike. Lêbelê, di vê navberê de gelek sal derbas bûn, hîn jî ew waadên we nehatine bicîanîn. Ji xeynê wê, ji ber ku me her gav erebîzekirne red kiriye û ji bo bicîanîna waadên hatine kirin berxwedaye, her roj gîyanê me û jinên me û zarokên me û bavên me di bin agirbarandina mîtraloyz û firokeyan de dimînin. Ji ber ku me beşdarî di hîlbijartinên Hikumeta Erebi ya Îraqê de nekir, paytextê Kurdistana Başûr bajarê

Silêmaniyê ji aliyê wan ve hatiye bomardumankirin. Hikumeta Erebi dixwaze hemû mafê kurdan ji holê rake û peymanekî pêk bîne ku hemû hêvîyên kurdan bişikîne. Em bawer dikin ku di ser gîyanê pakîşê qurbanîyên ev agirbarîna mîtraloyz û firokeyan de, di Kurdistana Başûr de îtîbara Cemiyeta we ya gewre jî kêmtir dike. Lewra kurd di bin wesayet û hîmayeya Cemiyeta we de ne.

Eger hêzên hikumeta erebi ya Îraqê, bi yekîne û firokeyên îngiliz ve neyin piştgirîkirin ku ew jî bi navê Cemiyeta we ya gewre mandatêrê ve welatî ne, ji bo kurdan tekrarkirina dîrokê, li ser Bexdayê ve çûyin û dagirtina wê derê karê rojekî ye. Em dikarin her gav welatê xwe li hember ereban biparêzin û em dê her gav jî wisa bin. Lêbelê em naxwazin bi hikumeta îngiliz re bikevin nav nakokîyêke çekdarî, ji ber ku ew bi navê Cemiyeta we ya gewre tevdiagerin. Em dixwazin bi navê edalet û heqaniyetê dengê xwe bigehînin wan.

Heke welatê me bi Îraqê ve bidine îlhaqkirin û bixwazin vê îlhaqê jî bi zorê çekê bi me bidine qebûlîkirin, ji aliyê Cemiyeta we ya gewre ve pêkanîna ewlekarî û aşîyê gelek zahmet dibe. Heta ku qederê welatê kurdan bi destê zarokên kurd ve naye dîyarkirin û welatê kurdan bi destê hikumeteke kurd naye rêvebirin, aşîtî û ewlekarî jî, ji xiyalê wêdetir tiştekî nîn e. Kurd xwedî dîrokeke hezar salan in û di nav pêlên dîrokê de her gav hebûna xwe, dîroka xwe, welat û sazîyên xwe yên neteweyî parastine û hatine hetanî îro. Kurd dê li hemberê erebên Îraqê

serê xwe daneynin, heta hebûna ferdê dawî dê parastina xwe bikin.

Em kurd, dixwazin bi hemû gel û neteweyan re bibin dost, li hemberê tû neteweyekî kîna me nîn e. Lêbelê mafê xwe rêvebirinê ji hinek qebîleyên îptîdayî yên (wekî Lîberya) Efrîqayê re jî hatiye dayin, ev maf ji bo vî neteweyê ku di dîrokê de bi duristî, wêrekî, şervanî û zîrekiya xwe tete nasîn re rewa neyê dîtîn, ev jî aliyê me ve bi xweşbînî nayê dîtîn. Bi taybetî jî ev demên dawî hikumeta erebî ya Îraqê, bi pişt-giriyeka xurt a hikumeta îngiliz, îhtirasên şovenîzma neteweyî ya ereban didin der û dixwazin berxwedana me bi rijandina xwîneka hîn zêdetir bişikînin.

Bi hezaran kurdên siwîl tenê ji ber fikra xwe ya siyasî bûne hedefa bombe û mîtraloyozan. Eger îro kurd çek hilgirtine, sedemê vê, ew zordestî û neheqiya li ser wan e.

Xwîn û agir, dê ji bo guhartina dîrokekî, erebîzekirina bi sed hezaran kurdan, erebîzekirina Selheddînan û Kerîm Xanê Zendan tîrî neke û nake jî. Her çiqas îro em çekdar bûne jî, ev jî ber mecbûriyeta û bêmecaliyê ye.

Em naxwazin li ser tû miletekî û tû welatekî serdest bin û hukmê li wan bikin. Lêbelê em naxwazin bikevin bin hukmê miletekî din û bi wan ve bête girêdan jî. Di vê şerê dawî de, ji bo vê armancê bi sedhezaran însanan xwe feda kirin. Hinek mafên me di rojên pêşî de ji aliyê Cemîyeta we ya gewre ve hatibûn erêkirin û tesdîqkirin.

Di vê navberê de ez bi destûra we dixwazim vê bêjim: şoreşa me ji ber

nîyeta xerab a rêvebirên Îraqê dest pê kiriyê, ev rewş, tenê bi naskirin û rêzgirtina hemû mafên me dikare bidawî bête.

Daxwaza me ev e: Ku raste rast di bin mandateriya Cemîyeta we ya gewre de, serxwebûna welatê me û "Hikumeta Kurdistanê Başûr" bête nasîn. Naveroka wê çî dibe bila bibe, divê her pevgerîdaneka me ya bi Hikumeta Erebi ya Îraqê re bête qutkirin. Jixwe li gorî peymana ku nûn di navbera Îraq û Brîtanyayê de hatiye îmzekirin, mandateriya Brîtanyayê ji ser Îraqê radike. Ji ber vê, pêşniyara me bi mantiq û pêdivî ye.

Pêdivîye Cemîyeta we ya gewre jî, li gorî mantiqa pevgerîdaniya bûyeran, vegere ser biryara xwe ya sala 1925an.

Ez pirr bi rêzdariyê tika dikim ku ev jî aliyê Ekselans ve bête qebûlkirin.

Bi navê gelê Kurdistanê Başûr.

Şêx MEhmûd³⁰

Dawîya şerê Awbarîk li 5/4/1931 da, dîsan hilkişiyê bo ser sînor, heta ku li 14/5/1931 da teslîmê hikumeta Îraqê bû, li wê maye. Sereta wî birine bajarê Hile û dawîyê Nasirîye û ji wê jî birine Rumadî û ji vir jî dibin Bexda. Li heraketa Reşîd Elî Geylanî da (1941), ji Bexda helhat û geyîşte gundê Sîdeqan û kevtê rêxistina tevgerê. Belam meramê wî nehate cî û xwe bideste ve da. Paş maweyêk jîyana xwe li gundê Darêkelî domand.

30 Bazîl NÎKÎTÎN, *Li Ser Kurdan Lêkolîneke Sosyolojîk û Dîrokî*, r. 520,521,522, weşanên Deng, Gulana 1991- Stenbol

Roja 9/10/1956 li Nexweşxaneyê Heyderî yê Bexda koça dawî kir û çû ser heqîya xwe. Termê wî li Mizgevtê Gewre ya Silêmanî hate binaxkirin.³¹

Rewşa Çapemenî û Weşangerî ya Li Kurdistana Başûr Di Dema Şêx Mehmûd de

Her wekî ku me li destpêkê jî dîyar kir, di nav civaka kurd de fikrên neteweyî di destpêka sedsala XXan de geş dibe. Bêşik havêna fikra netewî ya kurd û xebata wan a rêxistinî, bi giranî di paytextê Dewleta Osmanî de dest pê kiribû. Wê demê bakurê Kurdistan û başûrê Kurdistanê ji hev nehatibû veqetandin. Ji ber vê, rewşenbîrên başûr û bakurê Kurdistanê bi hev re rêxistin dibûn, çalakîyên wan ên rewşenbîrî û neteweyî jî di nav hev de bûn; bi hev re cemiyetan dadimezrandin û kovar û rojname derdixistin. Piştî ku Dewleta Osmanî têkçû, Kurdistan jî wekî bakur û başûr ji nûh ve parçe bû. Ji ber parçebûna Kurdistanê, potansiyel û berhevbûna zanyariya sîyasî û kulturî ya kurd jî parçe bû. Di encama vê parçebûnê de tevgera kurd jî lawaz bû. Dema ku em li çalakîyên rewşenbîrî yên dema hikumdariya Şêx Mehmûd binêrin, divê em vê rastiya dîrokî ya civika kurd jîbîr nekin.

Bêşik di destpêka sedsala XXan de jî û îro jî ragehandin, ji bo tevgera neteweyî û civakî pirr girîng e. Çapemenî û weşangeriya di dema tevgera Şêx Mehmûd de, bi tevî hemû

kêmasî û lawazîyên xwe ve, ji bo tevgera neteweyî ya kurd û kurdolojîyê belgeyên pirr girîng in. Li vê derê em dê bi kurtebirrî behsa çend kovar û rojnameyên wê demê bikin.

Pêşkewtin(20/9/1920): Piştî têkçûna yekemîn îdareya Şêx Mehmud, îngilizan îdareya Silêmaniyê cardin girte dest xwe. Ji bo belavkirina propaganda û siyaseta xwe din av gelê kurd de û li hemberê tirkên, di bin serpereştîya Mécerson de bi navê Pêşkewtin dest bi weşandina rojnameyekî kirin. "Rojnameya *Pêşkewtin* a hefteyî, yekemîn rojname bû li vê navçeyê da hate belavkirin.. Yekem hejmara wê li roja 29ê Nîsana sala 1920 hatiye belavkirin, heta Temûza sala 1922ê berdewam kir, di vê maweyê da 118 hejmarên wê hatine belavkirin."³²

Bangî Kurdistan(2yê Tebaxa 1922-1ê Nîsan 1926): Dema ku Şêx Mehmud ji Hindistanê veqetandî Kurdistanê û hikumeta duyemîn a Şêx Mehmud hate damezirandin, rojnameya *Bangî Kurdistan* wek organa fermî yê Cemiyeta Kurdistanê dest bi weşanê kir û ji heftê carekî di hate weşandin. Xwedî îmtîyaz û birêvebirê berpirsîyarê rojnameyê Mistefa Paşa Yamolkî bû. Desteyê nivîskarên wê Refîq Hilmî, Elî Kemal û M. Nûrî bûn. Li ser bergê pêşî yê rojnameya *Bangî Kurdistan* hatiye nivîsandin, ku rojnameyeke "îlmî, îcîmaî, edebî, hurr û serbestî yê millî ye, heftê carêk bi navê rêkxirawa *Cemiyeta Kurdistan* li

³¹ Mela Xalid Ezîzê Motkî, *Mêjûyê Hikumdariya Şêx Mehmudê Hefid*, kovara BÎR hejmar: 1, r. 63-64

³² Kovara BÎR, hej.: 1, rûpel. 92, Bihar-2005, Amed

bajarê Silêmanî têtê belavkirin, xwedî îmtîyaz û berpirsîyar û sernûser, Mistefa Paşa Yamolki ye."³³ Rojnameya *Bangî Kurdistan* bi zimanê kurdî-tirkî û farisî hatiye weşandin, li ser hev 17 hejmar derçûne û hejmara dawî di 1ê Nîsan 1926an de hatiye belavkirin. Piştî ku Şêx Mehmûd neçar ma ji Silêmaniyê derbiçe, weşana *Bangî Kurdistan* jî hate rawestandin.

Rojî Kurdistan(15 Çiriya Pêşîn a 1922- 3yê Adara1923): Piştî ku Şêx Mehmûd ji Hindistanê hate vegerandin, roja 30/9/1922 geyşte Silêmanî û di 10/10/1922 da kabîneyekî taze yê hikumetê damezirand û rojnameya *Rojî Kurdistan* bû weşana fermî ya hikumetê. Xwedî îmtîyaz û sernûserê wê M. Nûrî bû û li bajarê Silêmaniyê derdiçû. Ev rojname ji ber ku weşana resmî ya hikumeta Kurdistanê bû, hemû dengûbas û nûçe û beyannameyên û fermanên resmî yên hikumdarê Kurdistanê li ser rûpelên wê dihatin belavkirin. Li ser rûpelê pêşî yê *Rojî Kurdistan* hatiye nivîsandin: "rojnameyeke siyasî, edebî, îctîmayî yê resmî ye û ji hefteyê carekî derdiçî."

Bangî Heq(28 Adara 1923): Ev Rojname piştî ku Şêx Mehmûd Silêmanî bicî hiştîye, ji aliyê Baregayê Giştî yê Leşkerê Kurdistan ve li şikevta Casene (nizîkê Surdaş) hatiye çapkirin. Tenê sê jimar jê derçûne. *Bangî Heq*, yekemîn rojname ye ku ji aliyê hêzekî siyasî yê çekdarên kurd ve têtê weşandin. Di yekemîn hejmara *Bangî*

Heq de bi navê "Başqumandar û Melîkê Kurdistan Mehmûd", talîmatnameyeke "Bo Heyetê Mudaefayê Millîye" hatiye belavkirin û di benda wê ya 10. de hatiye nivîsandin: "Evro roja xîret e, roja murwet e, çakî(başî) û xirabiya evro wenda nabe, li dinya û axîret hesabê wî têtê dîtin."³⁴ *Bangî Heq*, sê hejmar derçûye û naveroka wan jî bi pirranî beyanname û bange-wazîyên Şêx Mehmûd in.

Umîdê Îstiqlal(20/9/1923-25/5/1924): Ev rojname jî wek berde-warniya rojnameya *Rojî Kurdistan* derçûye. Ev rojname jî, organê fermî yê hikumeta sêyem a Kurdistanê bû. Nûserên berdewamî yên vê rojnameyê: Ehmed Xoce, Refîq Hîlmî, Hisên Nazim, Ehmed Fewzî, Zêwer, Ehmed Faîz, Fayîq Zêwer, Bêxud, Arif Ûrfî û Reşîd kaban bûne. Li ser bergê wî yê pêşîn hatiye nûsîn: "Xezeteyeke siyasî, edebî, îctîmayî yê resmî ye û heftê carekî derdiçî." Di nav rûpelên *Umîdê Îstiqlal* de jî ligel zimanê kurdî bi zimanê tirkî û farisî jî nivîs hatine belevkirin.

Zarê Kurmancî(25/5/1926-23/7/1932): Xwedî îmtîyaz û birêvebirê vê kovarê Husên Huznî Mukrîyanî bû. Huznî Mukrîyanî, rewşenbîrekî kurd bû û wê demê li Bexdayê niştecî bû. Di sala 1926an de têtê li Rewandizê bicî dibe û bi navê *Zarê Kurmancî* Çapxaneyek dadimezrîne û heman demî jî bi vî navî dest bi weşandina kovareka mehane dike. Kovara *Zarê*

³³ Jêdera berê, r. 69.

³⁴ Jêdera berê r. 114.

Kurmançî, kovareka mehane (mangane)ya komaleyatî, mêjûyî, hunerî û wêjeyî bûye û li serhev de 24 hejmar hatine weşandin. Çapxaneya Zarê Kurmançî, yekemîn çapxaneya kurdî têtê jimartin ku kurdekî bi pare û pûlê xwe kirîbêt û li Kurdistan da damezrandibêt û her weha ev çapxane, ku di sala 1948 da ji aliyê Gîw Mukrîyanî yê birayê Huznî Mukrîyanî ve navê Çapxaneya Kurdistan têtê lêkirin.

Sedemên Sernekevtin û Xeletiyên Şêx Mehmûd

Pratîka civakî û dîrokî ya neteweyek, xezîneyeke tecrubeyan e ji bo dahatûya wan. Ew, di şertên îro de çiqas karibin ji vê xezîneyê feyde werbigrin û bîra xwe ya dîrokî-civakî teze bikin, ji bo dahatûyeke serkevtî jî wê karibin ewqas pêngavên rast biavêjin. Di vê çarçovê de, dema ku em li encamên tevgera Şêx Mehmûd binêrin:

1-Bi tevî hemû fedekarî û mêrxasiya şervaniya wan, Şêx Mehmûd û kadroyên dorberê wî siyaseta wê demê ya dinyayê rast tênegehîştin. Ji ber ku di destpêka vê nivîsê de behsa rewşa siyasî ya wê demê hatiye kirin, em cardin naxwazin dûbare bikin.

2-Li pêşberê Şêx Mehmûd rêxistinên dewletî yên modern hebûn û armanca wan a siyasî, zêde û dîyar bû. Tevgera Şêx Mehmûd, ji siyaseteke neteweyî û rêxistineke modern mehur bû.

3-Ji aliyê teknîkî, rêxistinî, çekdarî û tecrubeya şer ve hêzên îngilîzan û tirkên ji yê Şêx Mehmûd pirr pêşkevtîr bûn.

4-Yek ji sedemên kêmanî û xeletiyên tevgera Şêx Mehmûd jî, nekarî bi têra xwe xwenda û rewşenbîrên kurd rêxistin bike. Her çiqas li Bexda û Kurdistanê Bakur ve hinek supay û welatparêzên rewşenbîr dihatin Silêmaniyê ji bo xizmet û piştgirîkirina ji hikumeta Şêx Mehmûd re, hinek serokeşîr û kesên nezan ên dorberê wî ji xebata rewşenbîran re dibûn asteng.

5-Şêx Mehmûd ji bo bihêzkirin û bicîkirina hikumeta xwe bi awakî têrhatî xebat nedikir û nedikarî qanûnên pêdivî bide amadekirin û têt-bîqirin. Ji ber vê yekê jî çerxê teşkilata îdarî ya hikumetê serrast nedigerya.

6-Şêx Mehmûd merivekî cesûr û mêrxas bû û heman demî jî merivekî îhmalkar bû. Ev yek dibû sedemê wer-girtina biryarên nerast.

7-Gelek aşkira bû ku Dewleta Osmanî di Şerê Yekem ê Cihanê de wîda kiribû û hemû milletên misliman ên Rojhelata Navîn û Afrîkayê ji wan veqetyabûn. Di rewşeke wesa de, nêzîkbûna Şêx Mehmûd û tirkên, yanî hevalbendiya bi têkçûyî û wendakirîyan re, bû sedemê girîng ê wendakirinê.

EVDAL XAN (...-1657)

Ziya AVCI

Evdal Xan, yek ji wan kurdê navdar e ku gelek kêr li ser hatîye nivîsandin û zanyarîyên me yên di derbarê wî de, ji bilî yek-du agahîyên kurt, hemî ew in ku di *Seyahetnameya* Ewliya Çelebî de hatine nivîsandin û di saya wê gihîştine destê me. Eger bi tesadufî di dema bûyera îstîla û talankirina Bedlîsê ji aliyê walîyê Wanê Melik Ehmed Paşa ve, gerokê tirk Ewliya Çelebî ne li wir bûna, ihtîmaleke gelek mezin bû ku dê ew jî wekî bi dehan û heta bi sedan hemkûfên xwe di nav rûpelên dîrokê de veşartî bimaya. Lê ev tesaduf wisan kir ku em bi saya wî gerokê tirk ê bi nav û deng, li bûyerên qewimîne û ew hovîtî û necamêrîya li hemberî wî mîrê kurd rû dane, agahdar bin. Ji ber vê em ê bi şeh bikevin nav *Seyahetnameya* Ewliya Çelebî ya cilda çaran û di derbarê Evdal Xan de tiştên li ber şehê me bikevin binin li ba hev, ew çend agahdarîyên ku di destê

me de jî hene têkin ser û ew pêşkêşî xwendevanan bikin.

Tu agahîyek di derbarê sala ji dayîkbûna Evdal Xan de di destê me de tune, eger hebe jî agahîya min jê tune. Lê li got kronolojîya bûyeran û hedîseyên ji aliyê Ewliya Çelebî ve di *Seyahetnameya* xwe de dane diyarkirin û bûyerên di dîroka Osmanîyan de qewimîne, em dikarin texmîneke gelek gilover bikin.

Dema ku Sultan Murad diçe sefera Bexdayê û paşde vedigere Diyarbekrê, sal 1047ê koçî (1638ê zayînî) ye. Berîya ew biçe vê seferê, Evdal Xan mêvandarîya wî dike û bi awakî gelek ihtîşam û serfiraz ev pêşwazî û mêvandarî dimeşe. Lê dema ku ji vê seferê vedigere, Evdal Xan ji bo serkevtina wî ya di vê seferê de, naçe Diyarbekirê pêşîya wî û bi rîya rasperdeyên xwe re vî karî pêk tîne. Wî wextî ev Melik Ehmed Paşa, ku zawayê Sultan Murad e

jî, cardin pê ra ye. Sultan Murad ji vê helwesta Evdal Xan gelek aciz dibe û li gor neqla ji devê Melik Ehmed Paşa ya ji aliyê Ewliya Çelebî ve, bûyer wiha bûye:

"Di sala 1047ê koçî (1638ê zayînî) de Sultan Murad Xan Bexdayê girt. Di vegera xwe de xanê Bedlîsê nehat li balê û xezaya wî pîroz nekir. Gelek dilê Murad Xan êşîya û ji min re got: 'Ehmed, wekî qerzê Xwedê li ser te ferz be ku tu toleya min ji xanê Bedlîsê bistînî'. Pişt re dema ku ez heft meh cîgirê Îbşîr Paşa bûm, ew şeva Îbşîr Paşa bi leşker hat nava Stenbolê, bi şev Sultan Murad hat xewna min. Ew li ser çiyayê Wanê sekinî bû û nanekî xwînavî di destan de bû û ji min re got: 'ha, kerekî bide çiyayê û kerekî din jî bide xanê Bedlîsê'. Bi vê min ew gotina ku wî wextî ji min re gotibû bibîr anî û min vî şerî da destpê kirin...".

Ji bilî vê, cardin Melik Ehmed Paşa di vî warî de ji Ewliya Çelebî re dibêje: "Dema ku ez walyê Dîyarbekirê bûm, min xwe amade kir ku ez biçim ser Bedlîsê û ez heta Meyafarqînê jî çûm, lê gelek mîr û beg ketin navberê û gotin Evdal Xan ê xort e. Min jî ew da xatirê xortaniya wî û ez ji Meyafarqînê paşde vegerîyam".

Dema ku em li tarîxa van bûyeran binêrin û ev gotinên hatine kirin, yanî "ew hê xort e" binirxînin, wekî me got bi awakî gilover em dikarin bêjin sala ji dayîkbûna wî dikare piştî sala 1610 an 1615an be. Yan jî saleke di navbera van salan de be. Bi gotineke din, dema ku em vê hinek vekin û îzah bikin, salên kesekî ku hê xort bê hesêbkirin û li ser textê mîrektiyeke wekî ya Bedlîsê rûniştibe, dikare navbera 20-30 saliyê

de be. Em, eger 25 bihesibînin û wê ji tarîxa sefera Bexdayê derêxin, dibe 23-25 salî yan jî çend sal ji wê zêdetir. Bêguman em vê tarîxê wekî min got, ji vê sefera Sultan Murad û gotinên Melik Ehmed Paşa derdixin. Yanî em di vî warî de tenê supekûlasyonekê dikin.

Lê em dikarin sala koça wî ya dawîyê derêxin. Tarîxa îşgal û talankirina Bedlîsê ji aliyê Melik Ehmed Paşa ve sala 1065ê koçî yanî 1654/1655ê zayînî ye. Evdal Xan sê sal piştî vê îşgalê tê girtin û wî dibin Stenbolê û li wir îdam dikin. Li gor vê zanyariyê, em dikarin sala koça wî ya dawîyê, yan jî sala îdamkirina wî derêxin, ku ew dibe 1068ê koçî, yanî 1657/1658ê zayînî.

Evdal Xan kurê kedxuda Şemseddîn û neviyê Mîr Şeref Xan ê nivîskarê *Şerefnameyê* ye. Kedxudatî di sistema mîrektiya Bedlîsê yan jî dikare di sistema mîrektîyên din ên Kurdistanê de jî hebe, rutbeke îdarî ye. Yanî hê di sexîya mîr da, kesê bi musaede û biryara mîr, kar û barên mîrektîyê dimeşîne û di eynî wextî de jî cîgirê mîr e. Em dizanin ku Mîr Şeref Xan hê di saxîya xwe de meşandina kar û barên Mîrektiya Bedlîsê dabû destê kurê xwe Şemseddîn ê bavê Evdal Xan. Ji ber vê, dema ku Şemseddîn dibe mîr jî ev unvan li ser dimîne û ew bi vê unvanê tê naskirin. Yanî jê re Kedxuda Şemseddîn tê gotin. Esas di sistema îdarî ya Mîrektiya Bedlîsê de, gelek kedxuda hene, lê yek ji wan, wekî çawan gelek mîr hene, lê yek ji wan "mîrêmîran" e, di nav wan kedxudayan de jî yek serokê van hemî "kedxuda"yan e.

Çardeh kurên Mîr Evdal Xan hebûne. Ev kur ji çend jinan in. Lê di

nav jinên wî de, ya herî bi nav û deng Xanim Sultana keça Zal Begê Edilcewazî ye. Ewliya Çelebî, di *Seyahetnameyê* de gelek pesnê wê daye û behsa mahirtîya wê kiriye. Piştî ku Evdal Xan mecbur dibe textê xwe yê mîrektîyê terk bike, yê li ser textê mîrektiya Bedlîsê rûdine Ziyaeddîn Beg ê kurê vê Xanim Sultana hanê ye. Ewliya Çelebî, tenê navê heşt kurên wî nivîsandine: Ziyaeddîn, Bedreddîn, Nuruddehr, Şerefeddîn, Şemseddîn, Îsmâîl, Hesên û Huseyn. Mixabin em navên şeş kurên wî yên din nizanin.

Zanyarîyek din a di derbarê Evdal Xan û kitêbxaneyê wî de, ji aliyê seydayê 'Ebdulreqîb Yusif ve, di kitêba xwe ya bi navê "*Bangewazek Bo Roşenbîranî Kurd*" de hatîye dayîn. Ew wiha dibêje:

"Dema ku ez di geşta xwe ya li Kurdistanê Tirkîyê ya di sala 1977an de li Bedlîsê bûm mewanê Adil Beg Şerefxan, min di derbarê Evdal Xan de çend pirs jê kirin û yek jê jî aqîbeta kitêbxaneyê wî bû. Min jê pirsî, ka gelo ji kitêbxaneyê Evdal Xan tiştek li ber dest heye? Wî jî ji min re got ku, qasî ez dizanim û min sehkirîye, dibêjin diwanek şîrên wî li ba kesekî xelkê Diyarbekrê yê navê wî Hesên Efendî hebûye".

Belê, agahdariya ji malbata Şerefxan bi xwe ya di derbarê Evdal Xan de ev e.

Zanyarîyeke din jî heye û tê gotin, dema ku ew ji ber eskerê Melik Ehmed Paşa baz dide û xwe diavêje nav eşîretên Motkan û ji wir serhildana xwe didomîne, ew leqeba yan jî, navê mustear ê "Kejê Beg" bikar tîne. Piştî re cardin vedigere Bedlîsê, lê em nizanin gelo mîrektîyê ji destê

kurê xwe Mîr Ziyaeddîn distîne yan na? Lê wekî me got, sê sal piştî bûyera dagîrkirina Bedlîsê, ew tê girtin û wî dibin Stenbolê û li wir îdam dikin.

Berîya ku em ji vê mijarê derbas bibin, ez dixwazim bi kurtî ji behsa vî Melik Ehmed Paşayî bikim:

Melik Ehmed Paşa, zavayê Sultan Muradê IVan ê padîşahê Osmanî ye. Wî serokwezîrtî, walîtiya Erziromê, Diyarbekrê û Wanê kiriye. Dema ku walîyê Diyarbekrê bûye, çûye ser Fermanrewayê Mizûrê yê li Amêdiyê. Di vê seferê de 700 kes ji wan qetil dike û Wêşif Xan ê fermanrewayê wê digre û bi xwe re tîne Diyarbekrê, lê piştî re ew berdide û fermanrewatiya wî cardin dide destan. Kirina wî ya duduyan, çûna wî ya li ser êzidiyên Şengalê ye. Di vê sefera xwe ya xwînavî de, li gor neqla Ewliya Çelebî û nameya Melik Ehmed Paşa ya ji Evdal Xan re nivîsandiye, 10 hezar kes ji êzidiyên Şengalê qetil dike. Kirinên vî xwînrij û qatîlê han ên sisiyan, cardin li hemberî kurdan e û ew jî çûna wî ya li ser Bedlîsê ye. Ewliya Çelebî li ser hejmara kuştîyên di vê talan û îşgala Bedlîsê de wiha dibêje: "Tiştêk tesadufî ye, dema ku şer sekinî û kuştî hatin hejmartin, ew 1068 kes bûn, ku ev tarîxa koçî ya vê seferê jî bû". Lê li gor qeneeta min kuştîyên di vê seferê de, ji bilî ew talan û yaxmeyên tîne kirin, dikare ji vê hejmarê gelekî zêdetir be.

Em cardin ji wan nameyên ew dinivîse hîn dibin ku van hersê qetlîam û xwînrijîyên xwe li ser wesîyet û amojgerîya Sultan Murad dike. Lê sebebê herî mezin, domandina ew polîtîkaya Dewleta Osmanî ya di derbarê mîrektîyên kurdan de ye. Her

wekî em dizanin, hê bîst sal bi ser lihevhatina Amasyayê ya di navbera kurdan û osmanîyan de pêk tê, derbas nabe, bêtî sebebekî ciddî, wî wextî jî ew dixwazin derbekê li mîrektîya kurd a herî bihêz û xurt a Bedlîsê bidin. Ji xwe, hê ji roja yekê ve ew li ser vê pîlan û polîtîkayê dimeşin. Yanî kîjan mîrektîyên kurdan ên xurt hene, dixwazin ew çî çeng û peran bikin. Ew bêtî û jar bikin ku di rojên pêş de ji wan re nebin asteng. Ji ber vê jî, ew mîrektîyê ji destê Mîr Şemseddînê bavê Mîr Şeref Xan ê danerê Şerefnameyê distînin û di ciyê wê de Mîrektîya Meletyê didinê. Lê wekî em dizanin, ew bi vê leyzê dihesê û di nivê rê de ji ser çûna Mîrektîya Meletyê poşmam dibe û bi sedan malbatên Eşîreta Rojkîyan û mezinên Bedlîsê re berê xwe dide li ba Şah Tehmasb ê serokê Sefewîyan. Ancax piştî pêncî-şêst salan, pişt re kurê wî Mîr Şeref Xan dikare vegere li ser kar û barên Mîrektîya Bedlîsê. Dema ku ew xwînrijî, xeddarî, ceberrudî, kerb, kîn û neyartîya wî ya ji bo kurdan û dexesî û çavnebarîya wî ya ji ew îhtîşama seraya Evdal Xan û Mîrektîya Bedlîsê têkin ser wê siyaseta Dewleta Osmanî, ev tabloya han a talankerî û xwînawî derdikeve pêşîya me.

Demeke kurt berîya ku Melik Ehmed Paşa bê li ser Mîrektîya Bedlîsê û bi Evdal Xan re dest bi şer bike, ew û Ewliya Çelebî bi hev re dibin mêvanê Evdal Xan û ew deh roj li Bedlîsê dimînin. Di esnayê vê mêvandarîya han de, Evdal Xan ji şêl û helwêstê wî dikeve şikê û fêhm dike ku ew paşayê bi kîn û xwînrij, di derbarê wî de tiştên baş nafîkire. Ji ber vê jî, dema ku Melik

Ehmed Paşa ji Bedlîsê derdikeve û ber bi Wanê ve dikeve rê, Evdal Xan, ji Melik Ehmed Paşa daxwaz dike ku Ewliya Çelebî çend rojên din jî li balê bimîne û pişt re dê ew wî bi silametî bigihîne Wanê. Mebesat Evdal Xan ji vê daxwaza mayîna Ewliya Çelebî ew bûye, ku xwestîye di derbarê helwêsta wî paşayî ya ji bo wî û mîrektîya wî de, tiştê ji Ewliya Çelebî hîn bibe. Ji ber ku Evdal Xan kesekî dûrbîn û zîrek bûye. Ne mimkun e ku ew ji şêl û helwêsta Melik Ehmed Paşa nekitebe şikê. Ji ber vê jî dema ku Ewliya Çelebî jê diqete û ber bi Wanê ve dikeve rê, Evdal Xan hêdî hêdî dest bi xwe amadekîna li hember rawestandîna û parêzgerîya mîrektîya xwe dike.

Belê, piştî Melik Ehmed Paşa yê walîyê Wanê, vedigere Wanê, dest bi girêdana entrika û peydakirina bahaneyên çûna li ser Evdal Xan dike. Vê jî pêşîyê bi riya tirkmenên ku li Wanê cihniştin in û xwedîyê waridat û meqamekê ne destpê dike. Pişt re walîyê Erziromê û mîrê Melazgirdê dixwe dewreyê û bi riya wan re çendîn tawan li Evdal Xan tên barkirin. Yanî ji birina talanan û heta bêtî bigihîje rêbirrî û sitandîna bac û xeracên neheq.

Di dawîyê de ji gelek mîrektîyên kurdan ên wekî Mîrektîya Mehmûdiyan, Mîrektîya Pinyanişîyan, Begê Erziromê û Melazgîrê, eskerên Diyarbekrê û. hwd... esker berhev dike û dimeşe ser Bedlîsê. Di *Seyahetnameyê* de dîr û dirêj behsa vê êrîşê li ser Bedlîsê hatiye kirin, ji ber vê ez hewce nabînim li vir zêde li ser bisekinim.

Li hemberî vê, wekî me got, Evdal Xan jî destgîrêdayî namîne û ew jî daxwaza alîkarîyê ji gelek mîr û begên

Kurdistanê dike. Ew çend begên ku bi kêmasî di destpêkî de alîkarîya Melik Ehmed Paşa nakin û esker jî jê re naşînin ev in: Begê Şêrwanê, Hîzanê, Karniyê, Sêrtê, Zîrqî û Kêsanê ne. Lê piştî şikestina Evdal Xan ew mecbur dibin tên huzura Melik Ehmed Paşa û ev paşayê han ê necamêr heqareteke gelek mezin li wan dike, li ser dextalet û rîcaya hinek mîrên Wanê ew jî kuştinê rizgar dibin.

Ewliya Çelebî, piştî biserketina Melik Ehmed Paşa yê waliyê Wanê bi ser Evdal Xan de û di cîyê wî de danîna kurê wî Mîr Zîyaeddîn li ser textê Mîrektiya Bedlîsê, dûr û dirêj behsa girtina Bedlîsê, ew şerên di navbera herdu alîyan de diqewimin, hejmara kuştî, xezîne û kitêbxaneyê Evdal Xan dike bi vî awayî didomîne:

"...Piştî ferman hat dayîn, kedxuda Wîsîf, heftê axa, qazîyê bajêr bi min re hatin û em çûn nav keleyê û me muhran şikand, yê nê de bûn me ew li deveyan bar kirin û me anîn li ber baregahê dêz dêz danîn li ser hev. Cardin ez, kedxuda Wîsîf, muftî, melayê bajêr û axayên li wir ketin hindurê mala Xan û me derîyê odeyên wê vekirin, bi agahdarîya Zîyaeddîn Xan, xezîne, cebîrxane û eşyayên tê de me derxistin ji derve û li sed û pêncî deveyan bar kirin û me ew wekî gîrekî li ber baregehê danîn. Pişt re me ji bo beşdarîya wan di vî xeracê de bangî fermande, esker û xelkê kir. Di rîya wê deştê de heşametê ewqas zêde xelk berhev bû ku serekî wê ne dihat dîtîn û wekî deryayê lê hatibû".

Ewliya Çelebî yekûyek lîsteya ew serwet û kitêbxaneyê Evdal Xan bi

destê xwe girtîye. Ez dixwazim gelek bi kurtî jî be ew agahdarîyên Ewliya Çelebî yê nê derbarê ew serwet, dewlemendî û kitêbxaneyê di *Seyahetnameya* xwe de dane, li vir behsa wan bikim.

Yanzden sandoqên çargoşe, ku yek ji diranê filan, yek ji darê abanosê, yek ji yenîdinyayê, yek ji mercanê sor... û yek ji diranên masîyan çêkirî bûn, me ew anîn. Me li ber çavê hemî kesî muhrên wan vekirin. Di her yek ji wan sandoqan de deh kitêbên binîrx û bayexdar hebûn, ku ji alîyê xweşnivîsên bi nav û deng ve hatibûn nivîsandin û bi awakî wisan tê de hatibûn bi cih kirin ku her yek ji wan kiribûn perçekî antîke yê bê emsal... Di nav kitêban de yê nê wekî *Şahname*, *Gulistan*, *Şerefname* û çend diwanên şîir hebûn, ku piranîya wan bi destxetê Zîyaeddîn Xan û muhira wî li ser bûn. Dema ku Xan ew dîtîn, çavên wî tijî rûndik bûn. Dema ku Paşa ew bi vî awayî dît, jê pirsî: "Kurê min ez dibînim rûndik ji çavên te tê. Tu ji bo çi giriyayî? Nebe ku ew sandoqên han ên te bin?" Xan gotê: "Belê hemî yê nê min in, ne yê nê bavê min in. Çunkî piranîya wan min bi xwe nivîsandine û muhira min li ser in". Di cih de Paşa emîr kir ku ew çardeh sandoq û pêştext bi kilîdên wan ve ji Zîyaeddîn Xan re bînin dayîn...

Hevdeh cild Quranê nexîşkirî yê nê bi destxetê Yakûtî Meste'serî, Ehmedê Qerehîsarî, Şêx Bayezîdê Welî, Şêx Qere Mihemmed, 'Ebdullayê Qirimî, Xalid Efendîyê Ūskûdarî, Demîrçî Hesen Çelebî yê nê şagirdên Qere Hîsarî ku ji şah û sultan re hatibûn nivîsandin. Hezar û sêsed cild

tefsîr û kitêbên bi qîmet ku li ser kax-ezên baş yên Xetayî, Dîmeşqî, Semerqendî û Ehmedawayî hatibûn nivîsandin. Heftê cild tefsîrên pîroz ên wekî tefsîra Sebrî Teberî, Deylemî, Feyzûllahê Hindî..., tefsîra Ebû Leysê Semerqendî, Şêx, Bexewî, Qazî û Ebû Suûdî Silêmanî, yek ji wan li ba Şeyxulîslaman jî peyda nedibûn. Hezar û sêsed cild kitêbên hedîsên pêxember. Ji bilî Qedûrî, Multeqa, Keşşaf, Qehistanî û Mela Camî, tec-qîdê bi helbest hatî hunandin ên Şatibî û Herîrî û bi kitêbên ferheng û yên din... Hezar cild destxetên awa awa ji Xemseyî Nîzamî, dîwana Hafîz, Ûrfî Gulistan, Bostan, Nî'metullah û dîwana Mela Camî, Teskerû'l-Şû'erayê Hesên Çelebî, Tezkereya Lutfî, Dîwana Sayîb, Dîwana Baqî, Dîwana Nefî, Nîsarî, Enwerî, Xaqanî û gelek kitêbên din ên bi neqşan xemilandi. Dused û şêst perçe Beyaz ku her rûpeleke wê bi sed quruşan hatin firotin. Destxetên xweşnivîsên kevin. Hinek ji wan Beyazan şeşsed rûpel bûn ku hemî destxetê serdema Sultan Bayezîd ên wekî Şêx Ehmedê Qerehîsarî, Bekrî, 'Ebdullahê Qirimî, Hesên Çelebîyê Uskudarî, Hesên Çelebîyê Qerehîsarî, Xalid Efendî, Huseyn Efendîyê Mudîrê Mekteb, Wûsîf Efendî, Qere 'Elî Çelebî, Mentiqî Çelebî, Derwêş 'Elî, Suyulçîzade, Hakîmîzade û Tekneçîzade, ku her yek ji wan ji pênc heta deh perçe destxetên wan tê de bûn...

Li gor Ewliya Çelebî, ew kitêbên ku muhra Evdal Xan li ser bûne, barê heft deveyan bûne. Di nav van de, heftê û şeş cild kitêb û sed û pênc

kitêbok ji alîyê Evdal Xan bi xwe ve hatine nivîsandin. Di *Seyahetnameyê* de bi dûr û dirêjî behsa nav û nivîskarên gelek ji wan kitêban hatine kirin; lê ne mimkun e ku di çarçoveya maqalekê de behsa tevan bê kirin.

Ji bilî kitêban, komeke nedîtî ku ji sêsed û heştê perran pêkhatibû û her yek ji wan jî ji alîyê kolînerên bi nav û deng ên cîhanê ve hatibûn amade kirin û muhra wan li ser bû...

Sêsed û heştê perçe şûrên deban, cewherdar û me'denên giranbiha yên bi kalanên wan ve ku hemî ji polaya şêxanî, meqrawî, senqorî, esedî, cîsqayî, dawudî, hindî, îsfahanî, şamî, misrî, sitenbola kevin, frengî, elmanî û selanîkî hatibûn çêkirin û xasîyetê wan di dîwana bilindkirina li ser milê dijmin de derdiketin...

Sê sandoq tijî xencerên bi nav û deng ên Kurdistanê bi kalanên wan ve û hinek jî tazi.

Du hezar mertalên helebî, 'entaqî, misrî, daxistanî û diyarbekrî yên ji hesin hatibûn çêkirin...

Hezar û hefsed lib kopalên bexda û besrayî yên serê wan bizmar ên awa...

Dused lib perwaneyên derve yên destkirê hostayên wekî Hacı Recebê Prûseyî, kurê Xeyrîyê Gelîbolu, Mihemmedê Galeteyî, Wîsîfê Misrî, Canî Şîrazî, Xanqolî Şîrazî, Yarwelî Şîrazî, Hosta Omerê Romî, Hosta Qurdî Misrî, Mîrzacanê Belxî...

Sed hezar awa awa tîrdang, tîr, sertîr, rim û serrim ku her yek ji wan yadgarê welatek û serdemek bûn...

Hezar lib tivingên rengdar ên hê gulle tê de nehatibûn avêtin. Her yek ji wan ji welatek hatibûn û li fabrîqe-

yên cihê cihê hatibûn durustkirin...

Sandoqeke mezin hat vekirin ku bi hezaran laçikên bîhnxweş, xawliyên renga reng, mêzerên birîşî û perdeyên tenik tê de bûn. Di nîvê wan de jî sandoqek biçûk a sedefkarî derket ku ji heft milan ve qifil û muhr kiribûn. Hosteyan xwestin ew vekin, lê xelkê Bedlîsê razî nebûn, lê wanîyan pê dan erdê û gotin, çî dibe bila bibe gerek e ew bê vekirin. Bi naçarî hat vekirin. Lê ya hat dîtin tiştêkî seyr bû. Xwedê biparêze! hefsed lib le'lê bidexşanê avdar, sêsed lib yaqutê sor, zer û hişîn, sê hezar lib pîrozeyê nîşanporî(?), heft pîyaleyên şerbetên pîroz, heft fincanên pîroz, sê fincanên zumrût,, soravdanek zumrût...Di qutîyek a rexê vê sandoqê de dused û çil û pênc lib elmas derketin ku hemî mor bûn. Di qutîyeke zer de heftê lib elmasên netelaştî hatin dîtin ku wekî ronahiyê dibiriqîn û diçilwilîn. Mirovên maqûl û xelkê bajarê Bedlîsê şahidî dan û sond xwarin ku ji beyana sibê heta niha, hemî ew tiştê kêşane li vir û ew hemî mucewher yê Xanim Sultana keça Zal Paşa ye û wê ew wekî cihêz ji Edilcewazê bi xwe re anîne û niha jî kilîdên wan li ba wê ne. Paşa li ber çavê hemî maqûl û giregiran ew hevdeh sandoq dan destê 'Ember Axa yê mamostayê Xanim Sultan ku jê re bibe. Li ser vê hawar bi axayên Wanê ket û gotin: "wezîrê mezin, ew pere û zerar û ziyanê me yê li ser Xan in, eger tu van bideyî wan dê ew pereyê zîyanê me ji ku derkeve?" Paşa got: "Eger hemî pereyê we derneket, ez ê li ser temam bikim". Axa tevan ji Xanim Sultan re birin.

Piştî şandina van sandoqan, hinek tişt û miştên kêmqîmet jî hatin firotin û mezad hat rakirin. Ev mezata han çar roj ajot...

Ûvareke dereng ku dinya hinek bêdeng bû, ji alîyê Xanim ve deh boxçe tijî qumaşên hewrîşim ên bi qîmet, kiras, hevalkiras, sê kîse tijî ji kevirên bi qîmet, taceke niqîmdar û heft kewayên cewherdar ji xanima Paşa re. Çil lib yaqût, sed lib le'lê bedexşanî... Bi vî awayî ji xanima Paşa re di nav qutîyeke zêrîn de bazin, xirxalê erebî yê niqîdari yê awayî xorasanî û şeş lib guharên keyanî... û gelek tiştên din ji Paşa re hatin. Paşa ew wergirtin û ji 'Enber Axayî hilgirê van dîyarîyan re got: "Çi pêwîst bû Xanima keça min van dîyarîyan ji min re bişîne. Min tu qencîyek li wan nekirîye. Heq bû ev tişt ji Xanê kurê Xan re bihatina dayîn. Çunkî yê çirahilgirê min ew e. Lê însaallah dema ku ez vegeirim Stenbolê, ji bo toleya van ez ê wisan bikim ji Sultan biryara dayîna xaseya baca Mûşê jê re dîyarî bê dayîn. Li ser navê min silavan lê bikin". Xelatek ji simûrê jî da 'Enber Axa.

Piştî ev neqlên ji alîyê Ewliya Çelebî ve ya di derbarê serwet û kitêbxaneyê Evdal Xan ve tên kirin, behsa vexwendina roja dawîyê ya ku ji alîyê Xanim Sultan ve tê kirin, dike. Ev vexwendina Xanim Sultan, li gor bawerîya min, tê wê me'neyê û ew jîna zîrek û zana dixwaze bi Melik Ehmed Paşa bide zanîn ku, belê Evdal Xan bi ser neket û ew di vî şerî de sikestin, gelek serwet û hebûnên wan û bi hezaran mîrxwasên wan hatin şehîdkirin, lê bi ser van tevan de em hê li ser

pîyan in û hê em di wê taqet û mecalê de ne ku em sofereke mîrane ji paşayekî Osmanî re pêşkêş bikin.

Lê sed mixabin ew nêrîna li jorê ku min atfê Xanim Sultan kirin, wisan derneket. Piştî vê talan û îşgala Bedlîsê, bi awakî fîlî nebe jî, ew îdareya Mîrektîya Bedlîsê wekî berî di destên mîrên wê de namîne. Ew ihtîşam û mezintîya vê mîrektîya kurd çî çeng peran dibe û ronahîya sitêrka wê ya geş ber bi temirînê ve diçe û ew di sedsala 19an de, wekî bi dehan mîrektîyên din ên kurd, bi temamî ber bi nemanê ve diçe û namîne.

Berîya ku bi kurtî be jî em dawî bi wan agahdarîyên di derbarê Evdal Xan û Mîrektîya wî ya Bedlîsê de me dan, bînin, ez dixwazim li vir tespîtek ku gelek girîng e, bi xwendevanên hêja re parve bikim. Ew jî ev e:

Wekî em dizanin, şairê bi nav û deng, birêz û xwedîyê ruh û hestê kurdayetîyê Ehmedê Xanî di medreseyên Bedlîsê de xwendîye. Ev salên wî yên xwendinê ku li Bedlîsê derbas bûne, 30-40 sal piştî vê bûyerê ne. Hakeza em cardin dizanin seydayê Ehmedê Xanî di medreseyên Xoşebê yên merkeza Eşîreta Mehmûdîyan de jî xwendîye. Wekî me dît, di nav wan mîrektî û eşîretên ku bi Melik Ehmed Paşa re tîn ser Mîrektîya Bedlîsê, ya herî xurt Mîrektîya Mehmûdîyan e. Wextî em van bigrin li ber çav, ne mimkun e ku bi awakî gelek fireh seydayê Ehmedê Xanî ji van bûyer û kirînan agahdar nebe û netîceyên ew karesatên ku qewimîne ji devê mîrekên van mîrektîyan û ji xelkên rêzê de seh nekiribe.

Vêca kesekî wekî Ehmedê Xanî ku

di gelek waran de xwedîyê zanyarîyeke fireh, dûrbîn û cîhannas bûye, tesîra ew bûyerên qewimîne li ser çênebibe. Ji ber ku di dema wî de Osmanî li enîyên(cephayên) rojavayê ber bi şikestinê ve diçin, şerên di navbera mîrektîyên kurdan de xurt dibin û heta derecekê bi alîkarîya wan mîrektîyan, mîrektîyên din ên kurd tîn jarkirin, heta hinek ji ortê tîn rakirin. Bi ser van tevan de nehatina wan li ba hev û bêtifaqîya di navbera wan de, ev rêzên şîrên xwarê bi Ehmedê Xanî dane nivîsandin:

*Qet mimkûn e ev ji çerxê lewleb
Tali' bibitin ji bo me kewkeb*

*Rabit ji me jî cîhan penahêk
Peyda bibitin me padîşahêk*

*Ger dê hebûya me serfirazek
Sahib keremek suxen newazek*

*Mehkûm eleyhî û se'alîk
Mexlûb û mutî'ê Tirk û Tacîk*

*Ger dê hebûya me îttîfaqek
Vêkra bikira me inqiyadek*

*Tekmîl-i fikir me dîn û dewlet
Teshîl-i fikir me 'ilm û hîkmet*

Belê ez di dawîyê de vê dibêjim: ez hêvîdar im ku rojek ji rojan em di nav arşîvan de rastê qet nebe hinek ew serwet û kitêbxaneya Evdal Xan bînin. Ji bilî vê ez pêşniyarek jî dikim ku, dema firset bidest bikeve, ew kolan û caddeyên bajar û bajarokên Kurdistanê yên navê vî Melik Ehmedê han ê qatîl, xwînswar û zalim li ser in, rojek zûtîrîn bînin guhertin.

Peyayê Hikimdarîya Rojkan: Mihemed Axayê Kelhokî

Şakir EPOZDEMİR

Pêşeng, mezin an jî pêşkêş û serok û sermîyanên millet û civat û malbatan rojê carekê nayên rûyê dinyayê. Pêşengek an jî serokekî dîrokî bi sed-salan carekê dertê. Di nava berxwedan û mucadeleyeke dûr û dirêj de, ango di warekî azad û aram de pêşkêşên miletan dertên. Tesîra zeman û mekannan, tesîra rewşa civakan, çand û qereker û sewîya serdestan û gelek sebeb hene ku rola xwe li ser gihandina serok û rêberan bileyzînin..

Bi gelemperî ku meriv bala xwe dide mezinên miletan, filozof û pêxemberan, meriv dibîne ku di nav wan de keçel û gurrîyên ser tenûran nîn in. Di war û heyameke azad, aram û dewlemend de, di bajaran de, merkezên çand û zanîne da lîder û rêber dertêne holê. Ji ber vê ye, ku "pêxember ji gundan dernayên". Çanda gund, têrê nake ku yekî bike pêxamber.

Dikarim bibêjim ku di siltanîyê de

tu kes bi ser Siltan Selaheddînê Mezin nakeve, di mêrxas û lehengan de Rustemê Zal, di warê serhildanê de Kawayê Hesinkar, di xanedanîti û dewletsazîyê de Ehmed Merwan û Mihemed Şadî, di warê şoreşgerîyê da Ebû Muslimê Xorasanî, di şaxê eşq û evîn û helbestê de Mela Ehmedê Cizîrî, di warê raman û edebîyatê da Şêx Ehmedê Xanî, di warê dîplomasiyê de Mewlana Îdrîsê Bedlîsî, di dîroknasîyê da Şeref Xanê Bedlîsî, textên xwe di dil û mêjîyên me de bi cih kirine.

Bedîûzeman Mela Seîdê Kurdî, pêşengê dîndarên welatparêz e. Mîr Celadet Bedir Xan, reîsê rewşenbîr û zimanzana ye. Mîrxanê lehengê Biradostî, nîşana şervanan û remza berxwedanê ye. Şêx Seîdê Kal, serekê diwana şehîdan e. Xalid Begê Cibrî, xwedan bîr û bawerî û raman e û kesera dilê me kurdan e. Mefkûra

neteweyî, şexsîyeta neteweyî û xîreta neteweyî ramana Xalid Begê Cibrî ye.

Doktor Fuad bijîjkê bêçaran e. Bavê Tûjo kelemê nava çavên neyaran e. Şêx Fexrî pilingê çîya û bilindîyan e. Şêx Ubeydullah şêxê rêka heqîyê ye, Mewlana Xalid şahê Neqşebendîyan e. Pêşewa Qazî Mihemed serekkomarê yekem û remz û nîşana fedekariyê û diristîyê ye. Mela Mistefa Barzani serokê dîrokî û netewî yê mistesna ye û bê emsal e. Ew senbol û nîşana hemû kurdan e.

Zembîlfiroş yekê derwêş e, yekî gundî ye. Lê di rîya şerm û heyayê, ar û ifetê da ji Yûsif peyxamberê kenanî borandîye. Derwêşê Evdî mîrxasîya xwe bi dinyayê xistîye.

Kurd dibêjin: "Dinya dewle li serê mezinan li ser pêyan e." Yanî em bi saya serê mezinan bi hev va mane. Di vê de tû keşf û keramet nîn in. Bi ya min ji bona mezinên dîrokî ev xeber hatîye gotin. Kurd, va ye 800 sal in ku bi xêra serê Selaheddîne Eyûbî serbilind û serfiraz in û qedrê wan li ba hemû miletan heye. Gava ku li dunyayê navê kurdan tê gotin, Selaheddîne Eyyûbî tê bîra hemî kesî. Zîrekîya wî, qehremanî û cesareta wî ya bê emsal, edalet û merhemeta wî ya bê hempa, merdîtî û toleransa wî ya bê sînor. Tm 800 salin tû serdarek çiyê Selaheddîne Mezin negirt.

Ez dê niha behsa qehremanekê kurd yê berîya 550 salan bikim. Ev mîrxas **Mihemed Axayê Kelhokî** ye. Ez dê çîroka wî xweşmêrî ji *Şerefnameya Şeref Xanê* hikimdarê Bedlîsê, ji we xwendevanan re pêşkêş bikim. Şeref Xanê gorbehişt di *Şerefnameyê* da sê caran mîranî, sêdaqet û welatparêziya

vî lehengî neqil dike.

Cara yekem, Mihemed Axa dibe peyayê dewleta Rojkan. Bi cehd û xebata xwe, Bedlîsê ji bin bandûra Akkoyinîyan dide rizgarkirin. Tevgerêke dîr û dirêj û serkeftî..

Cara duyem, cesaret û sêdaqeta wî ya bê hempa tê ber çavan. Mîrê Bedlîsê Şeref Xan li Îranê girtî ye. Girtîyê Şah Îsmailê Sefewî ye. Ev mîrxas bi Mehmûd Axayê Keleşî û Mihemed Mîraxurê Pertavî re diçin Şeref Xan ji esaretê xilas dikin, tînin Rojkan.. Ev yeka bi tenê destanekê bê hempa ye.

Cara sêyem dîsa barê pîrsgirêka kurdan dikeve ser milê Mihemed Axayê Kelhokî. Bernameya îtîfaqa mîrekên kurdan û osmanîyan, projeya rizgarîya Kurdistanê dispêrine ser milê Mewlana Îdrîs û vî axayê welatparêz.

Lewra Mihemed Axa ne tenê peya ye, pêşmerge ye, canfida ye, welatparêz e, zana ye, bi rêk û pêk û bi tenzîm û tedbîr e. Mihemed Axa pêşkêş e, dîplomat e, pêşeng û xebatkarekî serkeftî ye. Mihemed Axa serek û remza hemî axayên xwedîşeref û xwedî xîret e. Peyayê êl û eşîra xwe ye, Peyayê hikûmeta Rojkan, fermandariya Bedlîsê, mîrekîya malbata Dîyaeddîn e. Welatê Rojkan, Bedlîs, Xelat, Mûş, Xînûs, Bayikan, Motkan, Simek û Kavar e. Paytextê vî welatî Bedlîs e. Hikûmdarên vî hikûmetê malbata Dîyaeddîn in. Ev xanedan gelekî kevn û qedîm e û bi kêmanî 1000 sal li ser navê Rojkan û kurdîtîyê, hikim li vî welatî kirine.

Mihemed Axa ji vî welatî, ji vî federasiyona eşîretên Rojkan û ji gundê Kelhokê ye. Bi kêmanî hikûmeta Bedlîsê weke Kuweytê, wek Behreyn û Qatara niha ku li Xelîca Faris ava ne

û dom dîkin, weke van îmaratan muxtar e, bi serê xwe ye û azad e. Ji ber vê em dikarin bêjin Mihemed Axa peyayê dewleta Rojkan e. Xwezî me bikariba bigota, "peyayê dewleta kurdan" e.

Helbesteke Kamuran Bedir Xan ku di Hawarê de weşiyabû hate bîra min:

*"Ne Botî me; ne Xerzî me,
Xulamê axa Kurdistan
Ne mîr im ez, ne axa me;
Peyayê dewleta kurdan."*

Çawa ku Kamuran Beg ji xwe ve, ji ber xwe ve û bi îradeya xwe, ji bona xizmeta miletê kurd amade bû û heya dawîya umrê xwe, bo rizgarîya Kurdistanê xebata xwe ya welatparêzîyê meşand, her wisa Mihemed Axa jî di salên 1480yî da xwe bi xwe, kiriye berpirsîyar û bi rûtbeya peya û pêşmergeî û rêveberîya welatê Rojkan kiriye. Mihemed Axayê Kelhokî, yekî wek Kamuran e, Celadet e, Memduh Selîm û Nureddîn Zaza ye. Ew her li pey dewletek jî dewletên kurdan e. Ruh û gîyanê wî ruhê pêşmergan e

Li gor Şeref Xan, Bedlîs di sala 1140î de ketîye bin bandûra Selçûqîyan. 40 sal di bin hikmê wan de maye. Piştî sultan Selaheddîn bûye melîkê Misrê, stêrka Selçûqîyan xurîcîye û roja kurdan daye der. Eşîretên Rojkan bi piştgirîya Eyûbîyan welatê xwe rizgar kirine. Ji 1180yî heta 1465an nêzîkî 300 salî ev welat serbest û azad jîya ye. Mihemed Axayê Kelhokî kurê vî welatê azad e. Tama azadîyê hilanîye, qedrê azadîyê zanîye û qîma wî bi bindestîyê nehatîye.

Malbata Dîyaeddîn xwe ji kambaxî û hovîtiya Moxolan parastine. Dema

Tîmûrleng hatîye, baregeha xwe li deşta Mûşê vedaye, mîrê Bedlîsê Hacı Şeref Beg, çûye mifteyên kela Mûş, Xînûs, Xelat û Bedlîsê pêşkêşî Tîmûrleng kirîye û bixêrhatinê lê daye. Tîmûrleng kêfa xwe ji Şerefê kurê Dîyaeddîn re anîye. Bi berat û fermannameyêk hikmê hikimdarîya wî teyîd û qebûl kiriye û di ser de bajarê Melazgîrê, Evîngê (Xoresan) û Pasînê daye vî hikimdarê siyasetzan û aqilmend. Ew bajar bi aqarên wan ve li erda wî zêde kirî ye. Ev bûyer di sala 1396an de qewimîye. Piştî 10 salan siltan Qere Yûsifê Qereqoyinî hatîye Bedlîsê. Xwe avetîye bextê Mîrê Rojkan Emîr Şemseddîn û keça xwe lê mar kirîye. Emîr Şemseddîn, di ber nextê qîza wî de Pasîn û Evîngê dide Qere Yûsif. Di avakirina Dewleta Qere Yûsif da piştgirîya Emîr Şemseddîn girîng e.. Siltanê Qereqoyinîyan jî bi fermannameyek hikûmeta Bedlîsê û hikimdarîya Emîr Şemseddîn teyîd dike û dipejirînê.

Piştî ku dewleta wan diherişe, Akkoyinî derdikevin pîyasê û çavên xwe li Kurdistanê pehn dîkin. Sala 1466ê Bedlîs û bi aqarê wê ve dikeve bin hikmê Dewleta Aqqoyinîyan.

Hesenê Dirêj, Bîjenoxlî Silêman dike serdarê artêşeke giran û dişîne ser Bedlîsê. Hemî Kelat û gund û bajarên Rojkan vedigrin. Sê salan Bedlîs li ber xwe dide. Di vê berxwedana dirêj de welatê Rojkan kambax û wêran dibe. Tengasî û xela serî dide, Roşkî belawela û beleder dibin. Mîrê Bedlîsê û kela Bedlîsê bindest dîkin. Milletê Rojkan nikarin çandinîyê bikin. Terş û talan, pez û dewar telef dibin.

Wê demê mîrê Bedlîsê Emîr Brahîm e. Heya ku mîr û heft kes di kelê de sax dimînin, Emîr Brahîm şer dike û hikûmeta xwe diparêze. Sala sisêyan mefer û mecala mîr namîne. Li ser mercên teslîmbûnê diştexile û bi temînata Hesenê Dirêj ji kelê dertê. Emîr Brahîm û 12 malbatên Rojkîyan diçine Îranê teslîmê Siltan Hesenê Dirêj dibin û li bajarê Quma Ecem têne bicîkirin.

Emîr Brahîm, ji sala 1466an heta sala 1479an, ku hingê siltan Hesen dimire, li Qumê binecîyê binçav e. Li wir daweta xwe bi qîza eşrafekî bajêr re dike. Ji vê jina esîlmend sê kur têne dinê. Navên van prensan: Hesen Elî, Huseyn Elî û Mihemed Şah in. Sê prensên nazîk û delal, sê mîrzadeyên lewend û cindî, li welatê xerîbîyê, bi destê emîrbanûya pak û paqij têne xwedîkirin.

Ev her sê şêxzade (prens) li cem dê û babên xwe hêdî hêdî mezin dibin heta ku di sala 1479an de siltan Hesenê Dirêj dimire. Siltan Yaqûb dikeve dewsa babê xwe û ew mercên di navbera babê xwe û mîrê Bedlîsê de dixê bin pêyan û Emîr Brahîm qetil dike, wî dikujê.

...

Di vê niqteyê da Mihemed Axa, xwe ji bona xizmeta wan mîrzadeyên pak û paqij amade dike. Hemî wextê xwe dide xizmeta van prensan. Wêk seydayekî ronakbîr û welatperwer bayê welatê Rojkan bi ser wan ve diweşîne. Xweşîya bajarê Bedlîsê, qewet û qudreta mîrên vê hikûmetê, esalet û giranîya malbata wan, malbata Dîyaeddîn, xizmet û selteneta vê malbatê, çîyayên bilind, zozanên rind,

avên sar û bax û bostanên xweş û mêranî, wefadarî û mîrxasîya eşîretên Rojkan, hemî, yek bi yek, vedijîne û tîne hafa çavên van Prensan

Mihemed Axa hem ruhê kurdîtiyê, Rojkanîtiyê û Bedlîsîtiyê dide van prensan û hem jî wan qenc hînî ziman û edebîyata kurdan û şervanîyê dike.

Hikûmdarî, mezinayî, berpîrsîyarî û pêşkêşî çî ye, wana bi van pîrsan şîyar dike û mîrxasîya babê wan û neçarîya lehengên Rojkan ji wan re bê kêmanî ders dik e..

Di vê navê de dayîka mîrzadeyan jî tîne rê. Vê dayîkê jî bawer kiriye ku ev prens ne yên wê tenê ne. Ew her sê prens malên xelkê xwe ne, hêvî û gumana eşîreta Rojkan in. Mîrzadeyên hikûmeta Bedlîsê ne. Ev qedera hemî prensan û rîya hemî qîralan e. Ku ne welê be, ne prens dibin prens û ne jî siltan dibin siltan.

Ev her sê prensên hêja; Hesen Elî, Huseyn Elî û Mihemed Şah mîna navê xwe delal, bi talîm û terbiye û perwerdeyê mezin dibin. Qîma Mihemed Axa bi wan tê ku yekî ji wan bibe Bedlîsê, eşîra Rojkan li dorê kom bike û dest bavêje şerê azadîyê.

Rojekê ji rojan li ber xatûna Rojkan çok dide erdê, hûr û kûr û dûr vê meseleyê jê re vedike û daxwaza xwe beyan dike. Mihemed Axa yekê xweş-xeber û zana bûye ku karîye muxatabên xwe îqna bike û merama xwe bibe serî. Ev daxwaz jî daxwazeke heq e. Heqê Rojkîyan li ser vê malbatê heye. Heta hingê 500 sal zêdetir e ku vê malbatê hikûm li Bedlîsê kiriye. Bedlîs, Xelat, Mûş, Xînûs, bi Bayîkan, Motkan, Sîmek û Kavarê ve di bin fermandarîya malbata Dîyaeddîn de bûye.

Ev welat ji destê wan û eşîrên Rojkan derketiye. Rojkîyan bi sal û zemanan, weke ava çeman di ber azadiya vî welatî û îqtidara vê malbatê de xwîna xwe rijandine. Ev berpîrsîyarî-yeke bivê-nevê ye, pîroz e û ferz e.

Dayîka prensan jî ji malbateke xanedan e, qîmet û giraniya xanedanîyê dizane. Welatê Rojkan nedîtiye, Roşkî li xerîbîyê nas kirine. Kelhokî bajarê Bedlîsê bi çol û çiya û çem û kanî û xweşbûna xwe ya xwezayî weke eyne danîyê pêş çavê mîrbanûya kurdan ya esilmend. Di warê îqnakirin û serwestkirinê de qehremanê me pis-porekî bê hempa ye. Şeref Xanê rehmetî vê yekê teyîd dik e.

Rojkî însanên welatparêz in, camêr in, mêr in, merd in, wek şêran in, zana û bajarî ne. Xwenas in û gelekî aqilmend in. Şeref Xan dibêje: "Gotineke vî welatî heye. Dibêjin çi qeder kûç di kela Bedlîsê de hene, ewqas Rojkî serî di ber vê kelehê de dane." Ev xwîn û micadeleya sedsalan bûye sebêb ku welatparêzîya welatê Rojkan di dilê hemî Rojkîyan de bi cî bûye.

Wexta ku aqqoyînî Bedlîsê sê salan ablûqe dikin û şer dirêj dibe, medaheki/pesindarekî Bijenoxlî Silêman Beg heye. Navê wî pesindarî Mehmûdoxlî ye. Mehmûdoxlî helbestekê dinivîse û ji siltan Hesen re bi rê dike Tebrîzê. Ji vê helbestê ev herdu rêzên han ketine Şerefnameyê:

*Şehal Ol Bedlisin Kürdii muti olmaz
Süleymana.*

Ezelden kalma adettir, çalışurlar Oğax üste.

Gava ku bi sed salan qewmekî, miletekî yan jî eşîrek azadî dîtîbî û li

welatekî rizgar jiya bî, ew tama serxwebûn û fermanrewayîtiya xwe ya xweser digire û êdî hew qîma wan bi bindestiyê tê.

...

Em bêne ser çîroka Mihemed Axayê Kelhokî. Mihemed Axa, bi şev û roj di xizmeta şahzadan de ye. Mîrza-deyên Rojkan û xatûna diya wan kiriye tac û danîye ser serê xwe. Dayîka mîrzadeyan jî ji dûr ve Rojkî û welatê wan nas kiriye. Mêrxasiya Rojkîyan bi serê wê ketiye. Mihemed Axayê xeberxweş û siyasetzan, welatê Rojkan bi ser çîyan xistiye û ev warê şêran bi mîrbanûya dêya prensan daye qebûl kirin.

Nîhayet diya prensan îqna dibe. Du kurên xwe, du egîdên xwe, du ezîzên ber dilê xwe teslîmî Mihemed Axa dike û bi dilekî şewat, bi stêrên çavan bi rê dike. Mihemed Axa, Hesen Elî û Hiseyn Elî dibe û berê xwe dide welatê Rojkan. Tê Hekarîya. Li Hekarîya wan teslîmî eşîreta Aşûrîyan dike. Dibêje, ev her du mêrxas kurên min in, emanetê we ne, heta ku ez bi ser wan de vegerim.

Tê Rojkan, ji alîyekî ve giregir û pêşkêşên Rojkan berhev dike, ji alîyê din ve jî li mîrek û eşîrên dormedor digere da ku piştgirîyê bidin Rojkîyan. Wan bi vê hereketê hişyar dike. Tam di vê navê de xebera nexweş û cewaba reş jê ra tê. Aşûrî û mîrên Hekarya şerên hev kirine, di nava toz û dumana şer de ev herdu prensên bê miraz winda bûne. Tu salix ji wan tune ye. Ew nûçeya ne bi xêr şoqeke mezin çêdike û ev xebat û emeka han gişt li haşî diçe.

Prensên Rojkîyan winda dibin. Windabûna Hesen Elî û Hiseyn Elî,

dilê Rojkîyan birîndar dike. Qîrên û zarêna wan digihêje asîmanan, li her derî şîn û girîn û fixan dest pê dike.

Belê tu kes ne di halê Mihemed Axa de ye. Birîna wî ji ya hemî kesî dijiwartir û kûrtir e.

Mîrbanûya bêçar, dayîka mîrzadeyan qîma xwe pê anîbû û herdu ezîzên ber dilê xwe teslîmî wî kiribû. Dê ew niha çi cewabê bide wê, dê ji şahbanûyê re çi bibêje. Sed mixabin ku herdu şahzadeyên ewçend delal û cindî, hewqas aqilmend û jîr, ew emek û teba ku Mihemed Axa li welatê xerîbîyê di ber wan de xwaribû, ewçend xwedîkirina bi ezîzî, qesta welatê bab û kalan kirin û welatê xwe yê şîrîn nedîtîn.

Dê çawa be? Lê Rojkî! Gelo ji vê yekê zortir heye ku gumana miletekî geş bibe û di rojekê de ev guman bitefe; roj li wan reş bibe?

Mihemed Axa tê vê mizgînîyê dide wan. Mihemed Axa li Rojkîyan digere û wan berhev dike, umîda azadîyê dixê dilê wan. Mihemed Axa ketîye bin vî barê giran û ji nû ve diponije, dibe û tîne, serad û bêjîng dike, ka çi rê deyne ber xwe.

Serê Mihemed Axayê Kelhokî di nav van xaxên giran de ye, ji nedîve xebereke xweş, mizgînîyeke xêrê tê guhê wî. Xebera xêrê ev e:

Wextê ku aqqoyînî di sala 1466ê da Bedlîsê zaft dikin, birayekî Emîr Îbrahîm, bi navê Şemseddîn, canê xwe xilas dike û direve xwe diavêje Botan. Li Botan, li Ewrexê binecî dibe. Mîrê Kela Ewrexê Mîr Mihemed e. Mîr Mihemed vî prensê Rojkî diparêze, keça xwe didê û ji vê keça Mîr Xwedê

kurekî bi navê Şeref didê. Ev Emîr Şemseddîn, a niha li Ewrexê ye û şikir ji kerema Xweda re welatê Rojkîyan ne bê prens û esilzade ye. Kurê wî Şeref hê 12 salîye, ew Şerefê 12 salî wê rojek bibe Şeref Xanê IV. Wê xwarziyê Botîyan bibî Şeref Xanê Mezin.

Bê guman ev xebera xweş dilê Mihemed Axa geş dike. Bi bayê bezê xwe digihîne Emîr Şemseddînê kurê Emîr Mihemed. Hal û ehwal û daxwaza eşîra Rojkan ji Emîr ra tîne ziman. Kevn û nûh çi heye rodike ser berîkê, heq û mafê Rojkîyan li ser vê malbatê heye, hikimdarîya wan bi sed-salan parastîne û îro jî amade ne vê hikimdarîyê ji bin bandûra dijmin rizgar bikin û vê malbatê bînin ser hikim. Hasîlê kelam Mihemed Axa, Emîr Şemseddîn îqna dike û wî tîne welatê Rojkan.

Giregir û rûsipîyên eşîreta Rojkan meclîs û dîwanê datînin, şêwr û muşawere dikin, stratejîya şer tespît dikin û 1500 şervanên çekdar hazîr dikin ku herin ser Bedlîsê, bajarê xwe yê qedîm ê bab û kalan rizgar bikin. Siwarên Rojkan li tenîştî Nemrûdê, li nava daristana Dehlereşê kom dibin û biryar digrin ku nîvê şevê herin bajarê xwe yê bab û kalan zeft bikin.

Mihemedê Şelwîyê Tirkmen artêşeke giran berhev dike û tê hewara Tirkmenên Bedlîsê. Li deşta Rehwa, li navbera Têtwan û Bedlîsê li hindava Textelû ku dikevê Rehwa Biçûk li pêşîya artêşa Rojkan kemîn digrê, şerekî giran dest pê dike. Qeweta Rojkîyan bi dijmin nakeve. Emîr Şemseddîn bi 500 kesî ve tîne şehîdkirin. Di nav van kesan de gelek mêrxas, leheng û pêşkêş ji dest diçin.

Mihemed Axa bi dilekî şikestî û bê çare
dîsa dikeve milhezeyên kûr û diponije.

Di vê navberê da em vê helbestê bi
hev ra bixwînin:

*Sala çarsed û nod û çaran e
Li Rehwa Biçûk şerek giran e*

*Axa Kelhokî, ew jî di şer da
Şûr tazî bi dest, xencer di ber da*

*Gêj û perîşan, li nava leşan
Hate ser termê bi nav û nîşan...*

*Ew laşê pîroz, ew betlê mêran
Termê Şemseddîn, ferxikê şêran*

*Şûrê meqrawî, mertala Kurdî
Mabûn bi destên sar û cemidî*

*Tîrdank vala bûn ji tîr û sertîran
Xwîna neyaran li qevdên şûran*

*Demange û gurz, nalçik û kalan
Li pişta mîr bûn çermên xezalan*

*Bazbend li zendan girêdayî
Sîm û hevrişm pê ve berdayî*

*Bi şal û şapik, piştik û ega
Cilbergên kurdî wê xemla delal*

*Kurkê samûr û kurtik û pêlav
Sol - gore bigre, heya serkulav*

*Malê Bedlîs bûn ew xeml û ew xêz
Leşker ferîm bûn, bi tenzîm û rêz*

*Samûr û sîyar, hem caw û pertal
Rim û tîr û gurz, kevan û mertal*

*Nîşanên serbaz û hem leşkeran
Xemlên mîr û serdar û rêberan*

*Kelhokî xwe tewand ew bi himet
Dîsa qelibî bû lê roja dewlet*

*Dest danî ser wî dilê cemidî
Zû de têk çûbû Emîrê Kurdî*

*Şikrê Xwedan kir got: "- Ev qeder e
Çerxa felekê bo me nagere."(*)*

....
"Çol û çolistan, berrî, beristan,
havîn çû ma zivistan. Serê Mîrza
Mihemed teze kete xaxên giran..."
Asteng û pîrsgirêkên ku têne holê û
derdikevine pêşîya qehremanên çîrok-
an, çîrokbêjên kurdan weha dibêjin:

Xax û astengên giran tên pêşîya
mêrxasan, camêr û lehengan. Eger
meriv rêyek da pêşîya xwe, bivê nevê
qîma xwe bi xax û astengan tîne.
Qedera Mihemed Axa jî weha hatîye
nivîsandin.

Ew ne Mîrza Mihemed e. Axayek
ji axayên Rojkîyane. Ji gundê Kelhokê
ye. Kelhoka Weysilqeranî, Kelhoka
Şêxcima, Kelhoka Mûşê. (?) Kelhoka
Mihemed Axa.(?) Kîjan Kelok e ez
nizanim, lê ew qehremanekî millî...
Welatparêzekî bi bîr û bawer û bi rêk û
pêk û paqij e. Pêşkêşekî aqilmend,
sîyasatmedarekî zana, şervanekî dij-
war, bawermendekî xurt, azadîxwaz-
ekî dilsoz û miletperwerekê xalis û
muxlis e. Ew ê di çerçoveya vê bawer-
mendîyê de rîyek, çareyek ji dewleta
xwe ya bindest re bibînê û vê dewletê
ji bin bandora dijmin rizgar bike û
derînê. Ew "narevê, namirê, nakevê."
Wê ew dewleta bab û kalan rizgar bike
û rojên azadîyê bi çavên xwe bibînê.
Mihemed Axa pêşkêş û lehengê serkef-

(*) Ev perçeyên helbestan ji berhema min ya ku min
fersend nedîtiye neşir bikim û min bi navê "Destana
Mihemed Axayê Kelhokî" hazir kirîye nin.. Ez hêvî-
darim ku wê bi zûyî va ev DESTAN bikevê destê
xwendevanan.

tinan e. Siwarekê miradbexş e. "Ya azadî û ya mirin" dibe şîyara wî.

Azadîya welatê Rojkan bê prensêk, bêyî mîrzadeyêk ne mimkun e ku bi dest bixe... Ev malbat sitara hemî Rojkîyan e. Ev Xanedan ji bo wan bûye qîblegaya azadîyê. Bi şaristanî, bi dilovanî û bi wekhevîyê wan bi sed-salan îdare kirine. Ew jî Rojkî ne. Malbata Kisra jî îdî bûne Rojkî. Mîrên wan in. Hikimdarên wan in û mezinên wan in. Bê mezin û bê sermîyan qîma wan nayê. Bivê nevê dê yekî ji vê malbatê bixin pêşîya xwe û şerê azadîyê li dar bixin.

Mihemed Axa hiltîne datîne, tu rê ji rêyeke din dernaxe. Dengê ji xeybê tê guhên wî. Ev deng dibêje:

"- Bi rastî û diristî ji xewa xefletê rabe. Zend û bendan girê bide, qemçîya xîretê bide destê xwe û li hespê miradbexş siwar bibe, berê xwe bide Îranê. Miraz û meqseda dilê te dê ancax li wê bête cî. Here Şah Mihemedê kurê Emîr Îbrahîmê mezlûm û şehîd bîne, ev hikimdarî qismetê vî prensî ye."

Mihemed Axa merivekî dîndar û dilpaqij e. Ev dengê ku dikeve guhên wî, ji bo wî dibe bawerî. Hêvî û gumana wî xurt dibe û li hespê mirazan siwar dibe, berê xwe dide Îranê, bajarê Qûmê. Ba Mîrbanûyê.

**Gelo dê ji dayîka ezîzan û
bêmirazan ra çi bibêjê?
Heyhat û hey hewar!**

Mihemed Axa diçe li ber xatûna birîndar çok dide erdê û serhatîyên

xwe ji serî heta binî jê re qise dike. Bi girî û giryan, di bin hêstirên çavan da dayîka birîndar guhdarîya Axayê Rojkî dike. Mihemed Axa piştî ku gotinên xwe diqedîne weha dibêje ji Mîrbanûya bê çare re:

"-Mîrbanûya hêja û qedirbilind!
Eşîra Rojkan serê xwe danîye secdeyê. Destên xwe ber bi Xwedayê jorîn va hevraz kiriye ku çavên xwe yên di hesreta şahzadeyên xwe de xirab kirine, bi toza binê lingê şah Mihemed derman bikin, ew bi şev û roj dua dikin."

Di helbestê de hatiye gotin:

"Piştî Kelhokî nûçe xilas kir
Ji mîrbanûyê prens daxwaz kir

Go: "- Ez hatime bo Şah Mihemed
Li benda wî ne ew der û beled

Bê perwa bûna min bibexşîn e
Welatê Rojkan, şîn û girîn e."

Eynilheyatê peyvên wî birî
Bi qîr û giryan li wî zivirî

"- Min sparte te ezîzên dilan
Du şitlên ciwan ji bexçên gulan!

Ji bo welat min wan kir qurban
Wan xortên ciwan, ewan bê tîrban

Min tenê maye yek dil û yek can
Tu dibê wî jî bide Kurdistan

Min bê dor û zor, cotek wînda kir
Felekê malê li min wêran kir

Niha dibêjî vî jî feda ke
Ma ev ezeztî ji bo te pak e?

Gelo dilê te qey ji pola ye?
Ev daxwaz pûş e û ne rewşa ye

Ev barê giran ne barê min e
Ev fedakarî ne karê min e."

Axa bi rûmet rabû ser pêyan
Got: "- Xatûna pak, dayka cindîyan

Ev daw û daxwaz ne ya şexsî ye
Doza welat e ne ya kesî ye

Ev yek li ser we, piştî û bar e
Ev malbat ji bo Rojkan deyndar e

Niha Rojkanî, destên wan hevraz
Ji Rebbê jorîn ew dîkin daxwaz

Bi dilê dûxan, stêrkên çavan
Bo we şandîne rêz û silavan(...)

Û... heya ku Eyniheyat a dayika
prensan îqna dibî dom dike. Mêzekin vê
şêrejînê ji kurê xwe Şah Mihemed ra çî
dibêje:

"- Ez qenc dizanim lawo, tê herî
Bona Rojkîyan çar û meşer î

Mafên min temam ji te ra helal
Tu bi xêr biçî prensê Delal...!

Ferxên şêr nabin ferxên kêwrojan
Divê tu biçî hewara Rojkan

Mamhoste min jî ji xew şîyar kir
Maf û mafdarî bo min dîyar kir

Prensên kurd in, malên welat in
Xulamên Mûş û Bedlîs, Xelat in

Delalê dilan, kurê yekan e
Welatê Rojkan bê sermîyan e

Bandora zîlm û zorîyê rake
Bedlîs rizgar ke'j nû va ava ke

Ku bi serketî, derketî ser text
Ez tê me cem te bi soz û bi bext

Wê demê ez û kurê xwe herin
Li herdû ferxên şêran bigerin...(...)

Li ser vê gotinê dilê dayîka prensan
ronî dibe û prensê dawîn, delalê dilan,
piçûkê hemîyan, Şah Mihemed jî tes-
lîmê Mihemed Axa dike. Mihemed
Axa Şah Mihemed hilîne û berê xwe
dide Kurdistanê.

Di sala 1495an de Bedlîs bi Şah
Mihemed bextewar dibe. Roşkî li dor
kom dibin û di şerê azadîyê de bi ser
dikevin. Dijmin ji welat derdixin,
Welatê xwe azad dîkin û digihêjin
miraz û meqseda xwe.

Mihemed Axa, ya dilê xwe dibe
serî, lê ev çîrok li vir naqede. Mêranî û
mêrxasîya Mihemed Axa dom dike.
Dîsa ew peya û xizmetkarê hikûmeta
Rojkan e. Em ê niha li gora Şerefnameyê
du serkeftinên wî yên din jî bibêjin. Lê
di vê navê de divê em Ebûbekir Axayê
Bayîkî jibîra nekin. Ev meriv hem
efsaneyek bê emsal e û hem jî meriv bi
aqilmendîya vî camêrê Rojkîyan û
welatê Rojkan îdî baş nas dike..

Gava ku eşîreta Rojkan bi hatina
Şah Mihemed bextewar û serbilind
dibe, bi kêfxweşî, bi şahî û govend li
dora mîrzadeyê xwe berhev dibin û
meclîsa şêwr û mişawereyê datînin. Di
şêwrê de, stratejîya şer tesbît dîkin û
qerera xwe didin, ku jî nedîve bi dizî,
şevêkê nivê şevê mêrxas û egîdên xwe
bixin hundirê keleyê û bi ser bikevin.
Radibin dişînin pey kelezazên Bayîkî
û Motkîyan. Tênin meseleyê ji wan ra
vedîkin û fedekarî û canfedayîyê ji
wan daxwaz dîkin.

Ew mêrxas û kelebaz, mirina xwe tênin pêş çavên xwe û vê wezîfeya neteweyî qebûl dikin. Lê bi şertê ku jimarek zêde werîs (şerît) û silm (pêlpêlok) bên hazir kirin ji bo ku ji nedîve silman bidin ber dîwarê kelehê û bi şerîtan xwe bavêjin hundir û pasevanên kelehê bê tesîr bikin. Fermanrewayê kelehê tevî hemî berpirsîyarên aqroyînîyan bikujin û kela Rojkan rizgar bikin. Ev teklîfa van fedayîyan tê pejirandin, lê ka evçend werîs û pêlpêlok dê çawa bi dest bixin?

Dîwana Şer di vê melhezeyê de mitale dike, diponije, ji nedîve Ebûbekir Axayê Bayîkî dide xwe radibî, diçî li ber Şah Mihemed kemerbeste dibî û weha dibêje: "Mîrê min, ji roja ku ev dewlet ji destê malbata Dîyaeddîn derketiye û heta îro îş û karê min ev bûye ku min pêlpêlok (silm) çêkirine û werîs badane. Werîs-ên min di kuvîyan da û pêlpêlokên min di bendê zevîyan da di binê mêwan da veşartî nin. Şikir ji Xwedê re ku emek û keda min li haşî neçû û îro bi kêr hat."

Şah Mihemed û Meclîsa Rojkan, li ber vê jesta Ebûbekir Axayê Bayîkî heyran dimînin û ji ber fedekarî û aqilmendîya wî çavên wan şil dibin. Hema di wê saetê de diçin wan îhtîyacên lojîstîk ji bin erdê û bendên zevîyan radikin, pîlana xwe tetbîq dikin û wê şevê Bedlîs û welatê Rojkan rizgar dikin.

Di Destana Mihemed Axayê Kelhokî de, ew dem û rewş bi vê hawayê hatiye ziman:

Şerkerên mêrxas û pak û çeleng
Ew şeva tarî û pir kerredeng

Silm û werîs û pêlpêlok anîn
Li dormedorê kela Kurd danîn

Bi sing û seko, hoşik û bizmar
Lehengên dilê derketin dîyar

Bi gurz û rim û şûrên Şêxanî
Kelebaz, şervan, ew bi mêranî

Xweşmêrên Sîmek, Baykan û Motkan
Şêr û pilingên welatê Rojkan

Bi şûr û xencer, demange, tîfing
Heşik, pêlpêlok, werîs, tevr û sing

Bi çek û rext û bi rêz û rêzdar
Pêyên xwe danîn ser serê neyar

Nobedarên hov di xewna gîran
Serxweş û mest bûn têtîkên guran

Derketin kelê, çûne birca reş
Bi destan girtin walfiyê qeş

Dîzdar û karmend, hemî zêrevan
Li cehenemê wan kirin mêvan

Serî difirîn bi devên şûran
Anîn emanê têtîkên guran

Serê sibehê tavê da koşkan
Bi ser ketibûn lehengên Rojkan

Dengê dîlanê kete kolanan
Rojkê xemlandin ban û dikanan

Ala bilind bûn li serên bircan
Qîz - bûk xemlîn, bi dil û bi can

Fîzzêna bayê li haf û neqeban
Kewan dixwendin li gaz û kokeban

Ji nû ve vebûn baxgeyên gulan
Bâbû şahîya şalâl - bilbilan

Kulîlk û gîya, hemî dar û ber
Bûne wek bûka bedew û dîlber

Hemî av û çem ji nû ve derbûn
Li kû dinêrî kesek, sor û zer bûn

Xweza dizane xweşt - rizgarî
Xweda kuta kir ew rojên tarî

Teyr û tûr ew ro, bi kêf difirîn
Xezal û quling dîsa zivirîn

Ew roj, rojeke gelek pîroz bû
Bedîsa rengîn, cejn û Newroz bû

Dewleta xedar hate emanê
Nûçe zivirîn çûne Îranê

Qelibî roja aqqoyinîyan
Ji warê kurdan hemî revîyan

Bû cejn û şahî hem coş û şabaş
Ev serkeftinê kê bihîstin man şaş

Beşdar bûn hemî mîrên Kurdistan
Melîkê û Siwêd, Mîrdas û Soran

Bi şand û bizzat, tev ha'in paytext
Kurd rojek waha nedibûn tu wext

Moral û guman, li wana der bû
Welatê Rojkan bo wan çeper bû

Ji vir û pê ve êdî hew dijmin
Kurdistan bigrin û ji me bibin

Wê mîrên kurdan bibine yek mist
Tifaq çênabin bi erk û dilên sist

Mîr pejirandin Mihemmedê pak
Prensê kurdan ew gernasê şak

Emîrê kurdan derkete ser text
Serê xive tewand, fêleka bê bext..

Piştî ku Şah Mihemmed derdikeve ser text, gazî Ebûbekir Axa dike. Wî teqdîr dike û du gundên Tetwanê ku navên wan Xizorkîn û Engesor in, dide wî lehengî ku ev herdu gund bi

mulkiyeta îrsî ji malbata wî re bin û heta hetayê ev malbat bê dewr û dor li van herdu gundan teserrûfê bik e.

Me go ku, mîrxasîya Mihemed Axayê Kelhokî li vir naqedê.

Çawan me li jor bi kurtî qal kir, di salên 1511an de, 12 mîrên kurdan diçin Îranê, zîyareta Şah Îsmail. Mîrên Bedlîsê, Cizîrê, Heskîfê, Şêrwan û Hezoyê ji van zîyaretvanên Şahê Sefewîyan in. Şah Îsmail destê girtinê datîne ser van mêvanên xwe, wan diavêje zindanan. Dest û lingên wan bi zincîran girê dide û teslîmî serdar û serekhêzên tirkmenên bermayîyên aqqoyinîyan dike ku ev kesên ha neyarên kokê kurda nin.

Şah Îsmail piştî ku 12 mîrekan berdest dike, walîyên xwe dişeynê datîne şûna wan. Belê ev bûyer pir dom nake. Xebereke nexerê ji şahê şîmariq ra tê, ku Ozbek ji alîyê Xoresanê ve bi ser Îranê da girtin e. Şah ditirse. Ji xwe merivên bêbext tirsonek in. Hema di wê gavê de wan ji zindanan dertîne û pirs dike ka qîma van mîran bi kê tê, ka serwerê wan kî ye. Hemî mîrek raya xwe didin ku qîma wan bi Melîk Xelîl û Emîr Şeref tê. Ew jî van herduyan dihêle û ew ên din serbest dihêlê.

Di vî nîrî de, gava ku artêşa şah ber bi Xoresanê ve dikişê û qesta Ozbekan dike. Melîk Xelîl û Emîr Şeref jî bi artêşê re di bin destê girtinê da bi xwe re dibin. Lê her yekî jî van teslîmê serekhêzê artêşek dikin.

Xizmeta Mihemed Axayê Kelhokî hingê dest pê dike. Mihemed Axa bi Mehmûd Axayê Keleşîrî û Mihemed Mîrexurê Pertavî va bi hostayî û

şarezayî xwe digehînin Şeref Beg. Şevêkê sê hespên rehwan tînin, cil û bergên Mihemed Mîraxur li Emîr Şeref dikin. Mihemed Mîrexur dikeve nav nivînên mîr û xwe li xewê datîne. Ev her sê mîrxas li hespan siwar dibin û gemên hespan berdidin. Ji Sefewîyan were ku Emîr Şeref di çadira xwe de razaye. Heya piştî nîvro Mîr şîyar nakin. Gava ku dikevin şubhê û diçin çadirê mêze dikin, dibînin ku Emîr Şeref çûye û Mihemed Mîrexurê Pertavî di cîyê wî de li nava nivînê ye. Dengê xwe jê re nakin û cesaret û fedakarîya wî dipejirînin û wî serbest berdidin.

Cara sêyemîn, dîsa Mihemed Axayê Kelhokî barê Kurdistanê daniye ser milên xwe. Wisa xuya dike ku gava fîkra Emîr Şeref û hinek mîrekên din li ser yekîtiya kurd û osmanîyan bûye yek, wan xwestiye ku hemî mîrek û serekên kurdan binin ser fîkra xwe. Ev wezîfeya polîtîk û diplomatîk dane ser milê Mewlana Îdrîsê Bedlîsî û Mihemed Axayê Kelhokî. Wisa tê zanîn ku qîma mîrekan bêhtir bi Mihemed Axa hatiye û sîyaneta vî camêrî di pratîkê de ligel hemî mîrekên Kurdistanê cîyê xwe girtiye..

Di dîroka hemî miletan da mîrxasên wekî Mihemed Axa, Ebûbekir Axa, Mehmûd Axa û Mihemed Mîrexurê Pertavî ranabin. Di rûpelên *Şerefnameyê* de gelek mîrxas û lehengên din jî xuya dibin. Eşîreta Rojkan û hikimdarîya Bedlîsê, rûpelek ji dîroka me kurdan û nîşana serbilindîya me ye.

Divê ez vê jî bibêjim, ji 50 salan bêhtir Mihemed Axayê Kelhokî xizmeta welatê Rojkan kirîye. Sala 1465ê bi girtiyên Rojkiyan ra weke êşîran dibine Tebrîzê, Hesenê Dirêj wî dike amirhêzeke taybet û li vir dibî zabî. Hê di serî da têkilîyên wî bi Emîr Brahîm ra çêdibî. Ew jî êşîr ketîye, li xerîbîyê di bin çav da ye. Di gel vî halî û van meşequetan daweta xwe kirîye, xwedî mal û eyal e, 2 kurên ku navên wan ketine dîrokê gihandî ye. Şeref Xan di *Şerefnameyê* da qala wan diplomat û dewletsazan dike.

Gava ku di sala 1533-4 ê da Şeref Xanê Mezin li Deştê Tatîkê şehîd dikeve û Emîr Şemseddîn derdikeve ser text, kurekê Mihemed Axayê Kelhokî ku navê wî Hacı Şeref e, dibe wekilê mîr (cîgir), kurê din bi navê Qelender Axa jî dibe şewîrmendê Mîr. Ez hîvîdarim ku fedekarî û lehengîya Mihemed Axayê Kelhokî bibe rêber bo şorişgerên kurdên vî zemanî..

Faîq BÛCAQ:

Gandhîyê Kurdan Bû

Şakir EPOZDEMÎR


Seydayê hêja Mela Emadedîn di sala 1966ê da, gava Kekê Faîq şehîd ket helbestek li serî nivîsandibû. Çewa ku di bîra min da maye Mamoste Gurdîlî dîgo:

*"Ey seba, bayê seher! Carek here Sêwerekê.
Ey seba! bi nezaket xwe bighîne, ber şîbak û
kulekê.*

*Ey seba bêje! 'Tû zanî Parêzer Faîq Kekê,
Keç û xortên Kurdistanê te ji bîr nakin
carekê.."*

Ji bo çi bi gelenperî kurdan ji Faîq ra gotin "Kekê Faîq"? Ezê tenê li ser vê bisekinim.

Sala 1938ê komara Mistefa Kemal nefes li kurdan birrî û bi rastî kurdan ji hal xist. Hêvî û gumana kurdên bakûr bi carek qut kir. Şêx, axa, eşîr, beg, ronakbîr, rêxistin, sunnî, elewî û hemî hêz û qewetên kurdan ji dest xist. Heşra kurdan rabû, Kurdistan ma bê pêşkêş û ser û sermiyan. Tenê di



Faîq BÛCAQ

xeyala xortên xwenda da meşhuma kurd û Kurdistanê ma.

Faîq Bûcaq tam di vê demê da, sala 1939ê di Zankoya Stenbolê beşa hiqûqê da qeyda xwe çêkir û bi Mûsa

Anter, Mistefa Remzî Bûcaq, Dr. Yûsif Ezîzoxlû, Ebdiletîf Ayqût, Xêredîn Seracoxlû, Kemal Badillî, Dr. Enwer Etmanoxlû û birrêk xwendevanên kurd va di Dîcle Telebe Yurdî ya Diyarbekir da hev henbêz kirin. Faîq li vê derê bû "Kekê Faîq"...

Li gor Apê Mûsa Kekê Faîq serwerîyê li Telebe Yurdîya Dicleyê û pêşkêşîya xwendevanên kurd yê wê demê bi giştî dikira û mişkilên wan ên maddî û manewî çareser dikira. Di dervayê gencan da têkilîyên Faîq, bi Ebdîrehîm Rahmî, Şêx Şefîqê Arwasî, Bediuzzeman, Fehmîyê Bilal, Mîr Celaded, Osman Sebrî, Cegerxun û gelek ronakbîr û şervanan ra hebû. Ew bibû keko yê nîfşên serdest û bindestê xwe.

Kekê Faîq ji eşîra Zirkîrî ye. Malbata wan ji Hezro qetiyane hatine Sorekê. Ya mîr e, ya jî malbateke pêşkêşê vê statuyê ye. Hezro Statu ye. Hezro mîrekî ye. Heya sala 1820an serbixwe jîya ye. Dû mîrekîyên kurmanc û binecî ji vê herêmê nin. Yek bi navê Hetax Licê ye, ya din jî bi navê Tercil Hezro ye. Malbatek wek malbata Bûcaxan bo çî Hezro berdîn û bîn Sorekê li ser kevîrên hişk jîyana xwe bidomînin? Ev pirsek e. Kurd hemî dibêjin ji ber doza "xwînê", lê kes nabêjin me şerê dewletê kir an ji ber siyaseta. Ev pirsek gelek girîng e. Lêkolîn û lêgerînên kûr ji van pirsan ra divên.

Nayê înkarkirin ku malbata Bûcaqan malbateke bi xîret û pêşkêş e. Mîr bin, kurmanc bin, eşîr an feqîr bin, ev malbata ha bi hindikayî 130 sal in ku bi navê xwe henin. Dewleta

Tirkan ji vê malbatê disilikê. Di lista sirgûnên qanpa Sêwazê da em dibînin ku ev malbat jî weka mala Şêx Seîd, malbata Hemreş Reşo û wan malbatên welatparêz ên din hatine sirgûnkirin.

Kekê Faîq di qampa Sêwazê da, di nava 55 şêx û axayên girîng û welatparêz da diya Kekê Faîq e. Ew biçî ku derê lîder e, pêşkêş e û serwer e. Di salên 1960an da li ser vê zilma militarîst a nijadperest, tenê dengê Kekê Faîq bilind bû û bi tenê Dr. Yûsif Ezîzoxlû wek mîrxasan li wan xwedî derket. Ev herdû ronakbîr û lîderên kurd mehsûlên Dicle Telebe yurdîyê nin.

Kekê Faîq ji sala 1944ê pêva hakîm e. Di hakîmtiya xwe da jî tiştên qenc kirîye. Li Sarîz a Qeyserîyê pişgirîya kurdan kirîye. Li her derê kurdayetîyê daye pêş. Dîsa ew Kekê Faîq e.

Di sala 1960ê da, heyva Adarê ye. Ez li Postexana Diyarbekir Têlxrafçî me. Ew 2 heyv bû ku li vê daîreyê dixebitîyam. Ez Telemcî bûm. Telem wek Teleksê ye. Hevalek bi navê Mihemed Durucan ji navça Hilwanê jî Telemvanek pir zîrek û bi raman Nûrcî bû. Şagirdê Mela Seîdê Sanî, yanê mensubê Seîdê Nûrsî bû. Ez jî weke evîndarêkê Mela Seîdê Kurdî bûm. Min di eskerîyê da li Îzmîrê Gazîemir ê qederêk risaleyên wî û *Sebillireşad* xwendibû. Li welat jî di pêşîya eskerîyê da li dîwanên şêx û alîman navê Melayê Meşhûr diboriya. Şêx, jê ne xweşbûn lê newêriyan xwe kifş bikira. Ez jî ji ber ku ji hindek şêxan ne xweş bûm, hemla min çûbû ser Ustad..

Ji ber ku min nimêjên xwe li xwe

nediboranda û Ustad dinasîya, Mihemed Durucan bi min bawer bû. Rojek ji min ra go: "- Ez diçim Rihayê, Ustad wê bê vê derê, meqamê Îbrahîm tewaf bike. Xwezî tû ji bihatayî." Mihemed Beg çû, hê li wê ye, me jî wek her kesî nûçeyên Ustad distanda. Rojname û radyo bi gav û seat hewadîsên Ustad didan.

Gava hatibû Rihayê qelebalixêk bê hejmar çûbûn îstiqbala wî. Hikumeta Menderes ji bo tedbîr standinê gelek zehmetê kişand. Ji ber ku ez têlxrafçî bûm, ez bi vê yekê hisîyam ku dewlet û hikumet û mixalefeta Tirkîyê xwe şaş kirine. Ustad giha Urfayê û nexweş ket. Di nava 3-4 rojan da wefat kir. Wefata wî jî bû qurf û kete ser dil û gurçikên neyaran... Û hun dizanin ku piştî înkîlaba eskerîyê laşê wî yê mibarek ji gora wî ya pîroz derxistin û birin winda kirin.

Mihemed Durucan piştî ku ji Rihayê dageriya hate Diyarbekir, hemî personelên postexanê teziye lê dan. Min jî serxweşî lê da, wî jî min pirsî ka ez ebuqat Faîq Bûcaq nas dikim an na. Min go ku "-Min navê wî bihîstîye." Mihemed go: "-Ustad ji hemî kesî zêdetir kêfa xwe ji Kekê Faîq ra anî, gelêk bi şewat û şefqet wî hambêz kir, serê Faîq xiste binê çengê xwe, cenetê şanî da û di guhên wî da mizgînîya behîstê dayê." Ev gotin ma li wê derê. Min dilê Mihemed ê dostê xwe neşikênand û xebera wî ma bi min ra.

Piştî hingê di 27ê Gulanê da Tirkes û hevalên xwe înkîlabêk milîtarîst kirin, Menderes daxistin. Cemal Gursel anîn kirin serokê konseyê.

Xezeba xwe rêtin ser Demoqratan û şêx û axayên kurdên piçek welatparêz. Me jî nav û dengê Kekê Faîq di wê demê da bihîst. Ewî cara yekemîn bû ku bê edaletî ya dewleta Tirkan rexne dikira û ji zaliman ra dîgo "zalim". Ewî sosyalîst û ronakbîr û rojnamegirîya Tirkan jî rexne û şermazar dikira.

Piştî ku me 5 hevalan di 11ê Temûz a 1965ê da PDKT ava kir û piştî 40 rojan Faîq Bucaq hat bû serokê partî, min rojek bi tenê mesela Mihemed Durucan û Ustad jê ra vekir. Kekê Faîq kenîya go: "- Rast e, Ustad min da ber singê xwe û bi hesret guvaşt, hinga ku sebra wî bi min hat û hinga ku Ustad di hesreta Kurdistanê da bû, gava min hambêz kir di guhên min da go: "-Dawiya zaliman hatî ye, rojên azadî û selametiyê ne dîr in..."

Niha we xwendevanan zanî ka Ustad mizgînîya rizgariya kurd û Kurdistanê daye kî?

Sala 2006ê di roja 5ê Tebaxê da Sertaç Bûcaq bo 40mîn salvegera şahadeta Serokê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê Faîq Bûcaq li Diyarbekirê semînerek saz kir. Dost û hevalên Kekê Faîq ew roj giş li wê derê bûn. Piştî ku Şerefeddîn Elçî, Derwêşê Sado û Mehmed Elî Dînler bo Kekê Faîq xeber dan, Ferîdûn Yazar hate ser mîkrofonê, Ferîdon Beg piştî 45 salan mesela dostaniya Kekê Faîq û Bediuzzeman Mela Seîdê Kurdî teyîd kir û waha go:

"- Gava ku Ustad li Rihayê nexweş bû, ez û hevalêkê xwe çûne cem Kekê Faîq. Wî ji me pirsî ka em çûne ziyareta Ustad an neçûne, me go, em

neçûne. Kêkê Faîq go: "- Miheqeq herin wî zîyaret bikin." Em dora rojê çûn ku Ustad zîyaret bikin, pir qerebalix bû. Polîsan nedihîşt ku kes here cem Ustad. Me xwe ji polîsan dizî û em ketin wê menzela ku Ustad lê ye. Me mêze kir ku Kekê Faîq li ber serê Ustad rûniştiye. Şagirdêkê Ustad destê Ustad bilind kir, me jî destên Ustad tewaf kir xwe da paş, me di 2 polîs ketin mal û berê xwe dane Kekê Faîq, destûr jê xwestin ku min û hevalê min derxine derva. Kekê Faîq ji me ra go: "- Waye we wezîfa xwe eda kir, hun derkevin baştir e."

Ez hîvîdarim ku niha xwendevan dizanîn ka Kekê Faîq bo çî bûye Kekê hemî welatparêzan.

Faîq Bûcaq roja 05.08.1966ê di navbera Riha û Hîlwanê da bi destê xayînan û desteka neyaran hate şehîdkirin. Bi xebera wî ya dijar va Seîd Elçî wê şevê çû Rihayê. Dora rojê seat li dora dehan rehmetiyê Emer gazî min kir û ez çûm dikana Şemsî Hosta ku pîqab hazir e. Ez, Emer Turhan, Şemsî Hosta û Dr. Enwer Etmanoxlû siwar bûn çûn ku bigihêjin cenazê.

Heyata Dr. Enwer bi emeliyatan û dijarîyan borî bû. Gelek dost û hevalên xwe bi der da bû. Lê bê mibalexe wê roja reş Doktor Enwer ji Amedê heya Urfayê bê etle şîna Kekê Faîq kir. Min ew roj zanî ku ez wekî Dr. Enwer Etmanoxluyê Pasûrî qedr û qîmeta Kekê Faîq nizanîm.

Em li Rihayê, li ber derîyê mala wî gihîştin cenazê. Konvoyekê mezin cenazeyê babê Zozan anîne Sorekê. Rê di nava Hîlwanê da derbaz dibûya. Ez dibêjim ka ew roj hemî xelkên vê

navçeyê li herdû rexên cadê rêz bibûn û destên xwe danîbûne ser hev, bi kemerbest îhtirama Kekê Faîq digirtan.

Yekê Sorekî, bi navê Celal Yeşîlbahçe hevale min ê postexana Amedê bû. Celal Beg vê paşiyê bû midûrê postexana navçeya Sorekê. Çend salan bi şev û bi roj em bi hev ra xebitîbûn, yek carek tenê min nedî ku Celal bi kurdî peyivî. Lê wê roja cenazê li goristana Sorekê destê xwe avête ser milê min û bi kurmançî go: "- Bila serê me gişan sax be, babê kurdan mir. Faîq Abê, babê kurdan bû."

Şhadeta Rehmetiyê Faîq pişt me şikênand. Me mesajek di binê mora PDKT de ji dayîka Serhed, Sertaç û Zozan Eyşe Xan ra rê kir. Di vê taziye-nameyê da çewan tê bîra min, me gotibû: "-Xatûna ezîz û heja û qedirbilind, we hevalê xwe, me jî Serokê Partiya Demokrat a Kurdistan Tirkîyê winda kir, bila malbata Kekê Faîq sax bî, bila kurd sax bin, bila Kurdistan sax bî.."

Ev sala 1966ê saleke bêoxir û bêmom bû. Piştî qetilkirina Kekê Faîq çend rojan Kurdistan hejîya. Erdhejîna Wartoyê, ji Qersê heya Mêrdînê bi xwe va hejand. Rebiyo çî felaketek bû hate serê kurdan. Cara yekemîn bû ku kurd ji kurdan ra digirîyan. Welat seranser reş girêda. Şîn û girîn kete gund û bajarên.

Sala 1967ê sala "Doğu Kalkınma Mitingleri/Mitingên Pêşketina Rojhelatê" ne. Ev xwepêşandanên kurdan weke hejana Wartoyê, mejîyê hemî kurdan hejand. Ev xwepêşandan di serê havînê de dest pê kirin û heya payîza

paşî dom kirin. Roja xwepêşandana Sorekê, min karê xwe kirîye ku biçim xwepêşandanê. Ez hatim ku Mamê Şefîq û Mela Ebdiletîf Sawaş li Otele Mûşê rûniştî ne. Ebdiletîf û mamê Şefîq dixwazin bi hev ra herin, lê kes namînê ku li Apê Fehmî xwedîtî bike. Min wan şiyande Mitîngê û ez wê rojê mame li ber nobeta Fehmîyê Bîlal.

Piştî nîvro ye. Min taştiya Apê Fehmî ya ku ji liqunteyê jê ra dihata da yê, li ber serê wî runiştim û min kitêba xwe xwend. Fehmî Bîlalê katibê Şêx Seîd Efendî go: "-Ew çiye tû dixwînî?" Min go: "- Mahatma Gandhî ye.." Westê ku min go Mahatma Gandhî, hema pêra hîqênî pê ket û Apê Fehmî girîya. Çend caran li pey hev go: "- Erê Gandhî yê min jî hebû, Gandhî yê min kuştin..." Min wisa hizir kir ku ji bo kurê xwe Ebûqat Sirrî Firat dibê ku ew ronakbîrê hêja ji terefê hêzên tarî va hetibû kuştin. Lê min pirsî ka Gandhîyê Fehmî Firat kî ye. Wî ji min pirsî go: "- Ma tû Gandhî yê min nas nakî? Gandhîyê min Faîq Bûcaq bû, Faîq Bûcaq!..."

Îsal, ev sala ku em tê da nîn (2007), ebûqat Seîd Pektaş ê Licî yê ku niha li Emerîkan dimînê, li Pirtûkxana Çarçîra li Enqerê rastî min hat. Malbata Seîd gelek nêzikayî li malbata Mamê Şefîq dikiran. Em û wan jî salên 60an li Amedê cînarê hev bûn. Seîd Beg, ew roj qala rehmaiyê Apê Fehmî û Mamê Şefîq kir û bi vê mijarê va girêdayî qala Fehmî Bîlal û Kekê Faîq jî kir. Seîd go: "-Ez rojek çûme Otele Mûşê, çûm cem Fehmîyê Bîlal, min pêra sohbet kir. Apê Fehmî di nava xeberdana xwe da hîçik pê ketin girîya

û çend caran li peyî hev go: '- Gandhîyê min jî hebû, Gandhîyê min kuştin, Gandhîyê min Faîq Bûcaq bû.."

Kekê Faîq heman demî helbestvan bû. Ezê çend ferd ji helbestên wî amade bikim. Kekê Faîq gazin ji Xwedê dike û dibê:

*"Ne nane, ne dane ne şiv û taştê,
Hoo Rebiyo! Ev qas derd û bela ji ku tê?
Devlemendî qe nema, em bîne jar û xizan,
Hiş serê me da nema, bîn kerr û gēj û nezan*

*Çavan jî bigre, bila ronayî bibe zulmet...
Çi bikim pişka derd û xeman para me ket.
Ma nîfir li me bîye, kes pîgar nabe me ra
Heval şilav nadin, pirs nakin bav û bira
Rê li ber me winda bû, nizanîm kuda biçim
Rebî jî tîna bieçim sekinîme li ber çem...*

Kekê Faîq weke şervanekê Sorekî, kurdan ajîte dike û waha dibê:

*Sonda me mirin e di riya te da welat
Kefen e kirasê me, ferman jî xeml û xelat
Xêr ji mirinê pê da bo me tunepe xebat
Emê xwîna xwe bîfroşin pê bikirin
Kurdistan...*

*Em bi lorîka mirinê hatine pêçandin
Dinya şîna şîr da, em bi xwînê mijandin
Em bindestî naxwezî, pîr rûmet e goristan
Emê xwîna xwe bîfroşin, pê bikirin
Kurdistan...*

Faîq Bûcaq Pêşkêş û Rêberekê Mezin û Bê Hempa Bû

Bi minasebeta 40mîn salvegera şehadeta serokê Partiya Demoqrat a Kurdistana Tirkîyê Faîq Bûcaq, di roja 5ê Tîrmeha 2006an da bîrhatinekê bi

rêkûpêk ji aliyê kurê wî yê hêja Serhed Bûcaq va hate tertîpkirin û em heval û dostên rehmetî beşdarê vê bîrhatina derengmayî bûn.

Pêşî em çûn Sorekê kom bûn û serê sibê me Serokê xwe yê ezîz li goristanê zîyaret kir. Faîq Bûcaq û Mistefa Remzî Bucak li tenîsta hev bûn.

Mistefa Remzî Bucak, amozayê Faîq e û yek ji gruba Mistefa Ekîncî û Dr. Yusuf Ezîzoxlû ye, ku di salên 1950yê de parلمانên Amedê bûn û sê kesayetiyên navdar û zîrek û qedirbilind bûn. Em dikkarin bêjin ku piştî van sê lîderan, eva 50 sal in ku ji Dîyarbekirê kesekê şûna van dagirê sed mixabin ku derneketin û wisa xuya dike ku dernakevin.

Li goristana Sorekê xemgîn û bextreş, me dû lehengên din jî zîyaret kirin. Yek Ferîd Ûzûn bû û yê din jî Necmedîn Buyukkaya bû.

Sertaç, li ser gora serokê PDKTê gotarekê kurt xwend, ew axa ku ji Kurdistanê azad anîbûn li ser gora Faîq reşand û ala rengîn kêlîka lehengê gernas bi serbilindî pîroz kir. Vê alaya pîroz, di nava gul û çîçekan da xeml û xêza xwe da goristana Bajarê Sorekê, goristana şêr û pilingan. Goristana mêrxas û egîdan.

Goristana Serokê besta şêran e. Belê wilo dixwîyê ku bandora dijmin bi her rengî li ser vê navçeya merdemêran pir dijwar û giran e. Lewra min ji xeyrî ew 200 kesên ku em ji Amedê çûbûn bêtir, kesî li ser goristanê nedît. Sorekî beşdarê vê bîrhatina pîroz nebûn. Ew Soreka ku sala 1967an hemî xwepêşandanan

(mîting) dadigirtan, piştî 40 salan çî li wan hatibû? Kê xwelîya mirîyan li vî bajarê mêrxas û egîdan reşandibû?

Di vê roja pîroz û nav û nîşan da, em hemî beşdarvan û hevalên Faîq şahid in ku Sertaç Bûcaq tû kêmasî nehişt, bi alîkarîya Fuad Elçî yê kûrê Seîd Elçî û bi qabîliyeta xwe ya aqademîk û awropayî weke kurê babê xwe mêhvanderîya xwe anî cî.


Hêvîdarim ku çilemîn salvegera şehadeta Faîq Bûcaq bibe pêngavekê qenc û berketî, ji bo ku dîsa kurdên bakur li xwe vegerin û bernama yekîtî û birayetiye danîn ber xwe û rojêk zû welatê xwe rizgar bikin û serbilind û serfiraz bijîn. Roj roja me ye, dereng nemînin.

Said ELÇİ(1925-1971): Kurdistani Yurtseverliğin Ve Demokratlığın Mihenk Taşı

Mehmet KONUK

Said Elçi 1925 yılında Bingöl'ün Zeynep köyünde dünyaya geldi. Elçi aile-sinin önde gelenlerinden Züfûr Bey'in oğludur. Said Elçi ilkokulu Bingöl'de bitirdikten sonra, babasının onay vermemesine rağmen ortaokulu okumak üzere Erzurum'a gitme teşebbüsünde bulunur. Ancak babasının haber alması üzerine kasasına saklandığı kamyonundan çıkarılarak Erzurum'a gitmesi engellenir. Okumaya çok meraklı olan Said Elçi'nin okul macerası böylelikle son bulur. O dönem Kurdistan'da okur- yazar oranının %1 olduğu göz önünde bulundurulursa Said Elçi'nin ilkokulu bitirmesi de bir şanstır.

İleriki yıllarda (1950lerde) Said Elçi İstanbul'a giderek Asar-ı İlmiyye kütüphanesinde çalışmaya başlar. Kütüphanedeki çalışma yılları Said Elçi'nin okuma açlığını gidermesi için



Said ELÇİ

iyi bir fırsat olur. Bu arada kendi kabiliyet ve imkânlarıyla muhasebeciliği de öğrenir. Bir taraftan muhasebe-

cilik mesleğini icra edip geçimini sağlarken diğer taraftan da İstanbul'daki Kürt aydınları ve üniversite öğrencileriyle diyalogunu geliştirir. O dönemin Kürt aydınlarından Ziya Şerephanoglu'nun yurtsever milliyetçi düşüncelerinden etkilenir.

Said Elçi'nin dünyaya geldiği 1925 yılı Şeyh Said, Cıbranlı Halid Bey, Yusuf Ziya, Kemal Fevzi, Doktor Fuad vb. Kürt yurtseverlerinin önderliğinde kurulan Kurdistan İstiklal Komitesi (Azadi)'nin örgütlediği Kürt ulusal başkaldırısının olduğu yıldır. 1914'de başlayan I. Dünya Savaşı 1918'de bitmiş; İngiliz, Fransız ve İtalyanlardan oluşan itilaf devletleri Almanya, Avusturya-Macaristan ve Osmanlıların oluşturduğu ittifak devletlerini ezmış, itilaf devletleri savaşın tartışılmaz galibi olmuşlardır. İtilaf devletleri bloğu Ortadoğu'yu yeniden yapılandırarak, İngilizler, Fransızlar ve İtalyanlar tarafından manda hükümetlerle yönetilen devletler oluşturmuşlar. Kurdistan'a biçilen statüko ise dört parçaya bölünerek tarihinin en trajik sorunu ile baş başa bırakılması olmuştur. Kurdistan'ın en büyük parçası olan Kuzey Kurdistan 1923 Lozan Antlaşması ile Türkiye Cumhuriyeti'ne, Doğu Kurdistan ise 1639 Kasr-ı Şirin Antlaşması'ndan bu yana olduğu gibi İran'ın egemenliği altına bırakılmıştır. Güney parçası da 1921'de İngilizler tarafından kurulan Irak Arap Devleti'nin manda hükümetinin idaresine verilmiştir. Güneybatı Kurdistan olarak adlandırdığımız diğer parça da I. Dünya Savaşı'ndan sonra Fransızlar tarafından kurulan ve manda bir

hükümetle idare edilen yeni Suriye Devleti'ne bırakılmıştır.

Lozan Antlaşması'ndan sonra Kurdistan'a biçilen bu lanetli statüko XX. yüzyıl boyunca Kürtlerin belki de tarihlerinin en trajik yüzyılı olduğunu söyler-sek abartılı konuşmuş sayılmayız. Çünkü Kürtlerin ülkesi tarihte ilk kez dört parçaya bölünüyor. Böylece Kurdistan yalnız yeraltı zenginlik kaynaklarıyla değil ulusal tüm değerleriyle yok edilme süreciyle yüz yüze kalıyor. Söz konusu devletler (Türkiye-İran-Irak-Suriye) sırtlarını emperyalist devletlere (İngiltere-Fransa-ABD-SSCB vb.) dayayarak her dört parçada da her türlü vahşeti uygu-lamışlardır.

Bu vahşeti uygularken akıllarına ne bin yılı aşkın ümmet kardeşliği, ne Malazgirt'teki omuz omuza savaş, ne Kürt Selahattin-i Eyyubi önderliğinde Haçlılarla yapılan amansız savaşlar, ne insanlık değerleri ve ne de halkların kardeşliği geldi.

1925'te Kurdistan İstiklal Komitesi (Azadi) önderliğinde yürütülen Kürt Ulusal ayaklanması, yukarıda değindiğim 1923 Lozan Antlaşması sonrası oluşturulan konjonktürel durum nedeniyle yenilgiye uğradı. 1930'da Xoybûn örgütünün önderliğinde Ağrı merkez olmak üzere, Serhat bölgesinin büyük kısmını etkisi altına alan Ağrı Hareketi de benzer konjonktürel nedenlerle yenilgiye uğradı. 1937-1938 Dersim Kürt Ayaklanması daha dar bir alanda olmasına rağmen büyük çatışmalar sonucunda yukarıda bahsettiğimiz temel nedenlerden dolayı yenilgiyle sonuçlandı.

1920 Koçgiri Hareketi ile başlayan ve 1938 Dersim Ayaklanması'yla son

bulan 18 yıllık Kürt direniş hareketlerinin yenilgiye uğraması, 1938 sonrası herhangi bir direnişin Kuzey Kurdistan'da ortaya çıkmaması Türk Devleti'ne rahat bir nefes aldırıştır.

Bu tarihten sonra Türk devleti, sömürgeci asimilasyoncu politikalarını sistematik bir şekilde Kurdistan'da uygulamaya başlamıştır. Öncelikle Kürt aydınlanmasının, milliyetçiliğinin ve yurtseverliğinin ocağı olan, birçok Kürt lideri ve filozoflarını yetiştiren medreseler kapatılmıştır. Bundan sonra ırkçı eğitim sistemini Kurdistan'da yaygınlaştırmak için okul açma seferberliğini başlatmış; Kürt bölgelerinin çoğunda yatılı bölge okulları inşa ederek burada okuyan Kürt çocuklarını aile ortamından kopararak daha hızlı asimile olmalarını sağlamıştır. Kuzey Kurdistan'da 18 yıllık direniş sürecinden sonraki yenilgi, büyük kırılma noktası olarak değerlendirilebilir. Çünkü direniş süreci boyunca Türk devleti, Kurdistan'da istediği politikaları uygulama şansına sahip değildi. Türk devleti, ancak direniş ruhunun kırılmasından sonra istediği politikaları uygulama şansına sahip oldu.

İrkçı faşist bir karektere sahip olan CHP, 1923'ten 1950'ye kadar tek başına iktidarını sürdürdü. Bu süre içinde yapılan tüm baskılar ve zulümler, CHP'nin ve liderleri Mustafa Kemal ile İsmet İnönü'nün hanesine yazıldı. O dönemin jandarmalarının Kürtlere yaptığı zulüm halen halk arasında konuşulmaktadır. 1946'da Adnan Menderes ve Celal Bayar önderliğinde kurulan Demokrat Parti, 1950'de yapılan genel parlamento seçimlerinde

iktidara gelince, CHP'nin çeyrek asırlık zulmünden bıkan Kürtlerde zımnı de olsa Demokrat Parti'ye karşı bir sempati başladı. Bu nedenle Demokrat Parti, Kürt aydınları ve yurtseverleri için bir yönelim merkezi olmaya başladı.

Said Elçi 1954'te Bingöl'de DP il başkanlığı yaparken Cumhurbaşkanı Celal Bayar seçim gezisi nedeniyle Bingöl'e uğrar. Said Elçi kürsüye çıkarak ateşli bir konuşma yapar. Kürsüden indikten sonra Celal Bayar Said Elçi'yi tebrik ederek hangi üniversiteyi bitirdiğini sorar. Said elçi de Cumhurbaşkanı'na şu cevabı verir: "Sen benim memleketimde kaç tane üniversite yaptın ki ben üniversite bitireyim. Anamın çorbası ile ancak ilkokulu bitirebilmişim. Cumhurbaşkanı Celal Bayar beklemediği bu tepkinin karşısında şaşkınlık geçirir ve bundan sonra Said Elçi'yi kindar Kürt olarak tanımlar. 1959'da yapılan 49'lar operasyonunda, Celal Bayar kindar Kürdün de aralarında olup olmadığını merak edip sorar.

1958'de Irak'ta general Abdülkerim Kasım önderliğinde yapılan askeri darbe sonucu Kral Faysal tahttan indirilerek Irak anayasası değiştirildi. Yeni Anayasaya, Irak devletinin iki asli unsurdan yani Arap ve Kürtlerden oluştuğunu kabul eden bir madde eklendi. Irak'ta bu politik gelişmelerin üzerine, 12 yıldan beridir Sovyetlerde 500 arkadaşıyla beraber sürgünde bulunan Mele Mustafa Barzani Irak'a geri döndü. Böylece Irak'ta yeni bir süreç başladı. Bu yeni süreç, her zaman olduğu gibi Türkiye'yi endişelendirir. Türkiye, Güney Kurdistan'daki

gelişmelerden kuzeydeki Kürtlerin de etkilenmesinden korkuyordu. Irak'ın Ankara büyük elçisi yeni Irak Anayasası'nı tanıtıcı bir brifing verir. Brifinge bazı Kürt aydınları da davet edilir. Türkçeye çevirilen yeni Irak Anayasası katılımcılara dağıtılır. Anayasa'nın 2. maddesinde Irak Devleti'nin Arap ve Kürtler olmak üzere iki unsurdan oluştuğu belirtilmektedir. Bu gelişme, o dönemdeki Kürt aydınları ve üniversite öğrencilerini çok etkiler ve heyecanlandırır. Bu gelişmeleri mütakiben Başbakan Adnan Menderes bir ABD gezisine gider. Menderes ABD'de iken dönemin Diyarbakır Belediye Başkanı belediye meclisinde bir karar alır ve karar gereğince Menderese fahri hemşerilik payesi verilir. Buna tepki olarak Ankara ve İstanbul'daki Kürt aydınları ve üniversite öğrencileri, Diyarbakır Belediyesinin bu kararını protesto etmek üzere ABD'ye onlarca telgraf göndererek, bu kararı tanımadıklarını belirtirler. Menderesin ABD gezisi dönüşünden sonra bu gelişmeler değerlendirilir. Bunun için, ön tedbirlerle ilgili senaryolar üretilir. Önce binlerle ifade edilen tutuklama ve infazlar gündeme gelir, dış konjonktürün elverişli olmadığı düşünce-si ağır basarak tutuklamalar 50 kişiyle sınırlandırılır. Said Elçi de bu tutuklular arasındadır. Nisan 1959'da Kerkük'te bazı olaylar olmuş, çıkan bir provokasyon sonucu istemeden de olsa bazı Türkmenler de ölmüştür. Bu vesileyle zamanın Niğde milletvekili Asım Eren, TBMM'ye bir önerge vererek "mukabeleyi bil misil"de bul-

nulmasını istemiştir. O dönemde İstanbul'da muhasebecilik yapan Said Elçi, diğer bazı Kürt aydın ve öğrencileriyle birlikte Asım Eren'in bu önergesini protesto etmek için telgraf çekme eylemi düzenlerler. Çekilen telgrafta şöyle denmiştir: "İnsan haklarının hükmü ferman bulduğu bu dönemde Kürtleri kimse imha edemez. Bunu küflü kafana koy."

Said Elçi 49'lar Davası'nın en önemli tutuklularından biriydi. Tüberküloz hastası olmasına rağmen çağdışı zindan koşullarında onurlu tavrından hiç taviz vermedi. Zindanda kan kus-tuğu ve sıtmalandığı bir sırada zindanı denetlemeye gelen Türk general Kemal Binatlı'dan bir battaniye ister. Kemal Binatlı battaniye vermediği gibi hepiniz burada öleceksiniz diye tehdit eder. Said Elçi hemen paşaya dönerek: "Paşa, paşa merak etme dün gece Azrail buraya geldi, sizin zulmünüzü Azrail'e anlattım ve Azrail de bana söz verdi, zulmünüz sürdüğü müddetçe canımı almayacaktır. 129 gün kaldığı hücrede sağlığı el vermediği halde gösterdiği dirençle herkesin takdirini kazandı. Ayrıca 49'lar Davası'nda yaptığı ateşli savunmalar kulaktan kulağa yayılarak, onu Kürt direnişçiler arasında farklı bir konuma getirdi.

1963'te 21 Mayıs olayları nedeniyle ilan edilen sıkıyönetim idaresi, Ziya Şerefhanoğlu ile birlikte çıkaracakları Rêya Rast dergisi girişimini en-gelledi ve Said Elçi 22 arkadaşıyla birlikte tekrar tutuklandı.

1964'te hapisten çıktıktan sonra Diyarbakır'a yerleşen Elçi, bir taraftan muhasebecilik yaparken diğer taraftan da yeni politik faaliyetlerini hızlandır-

di. 1938 kırılma noktasından sonra, ilk kez ciddi anlamda illegal Kürdistanî bir parti kurma hazırlıklarına başladı. Parti kurma fikrinde, doktor Nurettin Zaza ve Şeyh Said'in katibi Fehmi Bilal'dan etkilendiği söylenir. Elçi, parti kurma fikrini bazı Kürt aydınlarına götürür ve ona verilen cevapta: "Said sen aklını mı kaçırdın, bize diyorsun illegal Kürdistanî bir parti kuralım!" Said söz konusu aydınlarla bu tavrı üzerine verdiği cevapta: "Ben Diyarbakır'ın hamallarıyla da olsa bu partiyi kura-çağım" diye kararlılığını gösterir.

Nihayet 11 Temmuz 1965 günü Diyarbakır'daki Gazi Köşkü'nde beş arkadaşı ile beraber toplanarak Türkiye Kurdistan Demokrat Partisi'ni kurarlar. İlk başta parti kurma fikrine tam hazır olmayan avukat Faik Bucak'a yeniden gidilir. Tüm parti kurucuları ve Fehmi Bilal'ında ısrarlarıyla Faik Bucak ikna edilerek parti genel başkanlığına getirilir. Faik Bucak'ın avukat olması, tecrübeleri ve entelektüel yapısı parti genel başkanlığına getirilmesi için yeterli sebeplerdi. Ne var ki Faik Bucak'ın genel başkanlığı ancak 11 ay sürebildi. Aşiret içi çatışmayla başlayan trajik olaylardan sonra, derin devletin de sinsice müdahil olduğu bir takım gelişmeler sonucu Faik Bucak 4 Temmuz 1966 günü silahlı saldırıya uğradı. Yaralı bir şekilde Urfa Devlet Hastanesine kaldırılan ve yapılan ilk müdahaleden sonra hayati tehlikeyi atlatan Faik Bucak, ertesi günün sabahı hastane odasında beklenmedik bir şekilde hayata veda etti. Böylece daha bir yılını doldurmayan Türkiye Kurdistan Demokrat Partisi (TKDP),

liderlik vasıflarının tüm özelliklerini üzerinde taşıyan ilk genel başkanını sinsî komplolar sonucu kaybetti. Olay esnasında yanında bulunan büyük oğlu Serhat Bucak'ın iddiasına göre "5 Temmuz sabahı saat 6.30 civarı odasına giren bir grup doktorun kendisine iğne yaptığını ve bu iğneden kısa bir süre sonra da hayata veda ettiğini" söylemektedir. Türk devletinin Kürtlere öcü gibi bakan politikaları Faik Bucak'ın sahip olduğu yeteneklerle olayın gelişme biçimi yan yana getirildiğinde Serhat Bucak'ın iddiasının doğruluğu ciddiyet kazanmaktadır. Faik Bucak'ın şehit edilmesinden sonra partinin liderliğini Said Elçi üstlenir. Bir taraftan parti örgütlenmesi hızlandırılırken diğer tarafta 1967'de "Doğu Mitingleri" adı altında Kurdistan'ın birçok il ve ilçesinde onbinlerin katıldığı kitlesel gösteriler düzenlenir. Bu mitinglerin en ateşli hatibi yine Said Elçi olur. Miting alanlarında yaptığı konuşmalarla usta bir hatip olduğunu ispatlamanın yanında Kürt milletinin gönlünde de taht kurar. Bu mitinglerden sonra, Said Elçi'nin ismi Kürtler arasında dilden dile dolaşır.

1960'lı yılların başından itibaren motivasyonunu Kürt ulusal değerlerin-den alan Faik Bucak, Said Elçi ve arkadaşları tarihsel olarak Şeyh Ubeydullah, Şeyh Said, Seyid Rıza, Qazi Muhammed, Mustafa Barzani vb. Kürt liderlerinin çizgisini esas alarak çağdaş, demokratik ve ilerici bir yapılanmayı hedefliyorlardı. Bunun yanı sıra 1960'ların ortalarından itibaren Kurdistan gençliği içinde motivasyonunu tamamen sol kültürden (Marks, Engels, Lenin, Stalin, Mao,

Trocky, Che Guavera vb.) alan yeni bir jenerasyon da ortaya çıkmaya başlamıştı. Bu yeni jenerasyon, yukarıda bahsettiğimiz 1938 sonrası kırılma noktası süreci içinde ırkçı Türk eğitim sistemi içinde yoğrularak Türk üniversitelerinde Marksist kültürle tanışmış, Marksizm'i de Kemalist Stalinist Türk hocalarından öğrenmişlerdi. Bu jenerasyon Türkiye İşçi Partisi başta olmak üzere benzeri Türk sol örgütlerinde boy vermeye başladılar. Böylece Kürt siyasal hareketinde Kemalist Stalinist bir harmanlanmanın sonucunda, yeni ucube bir solculuk türedi.

1967 *Doğu Kalkınma Mitingleri*'ndeki konuşmalarda bu iki jenerasyon arasındaki görüş ayrılıkları kendini göstermeye başladı. Solcu jenerasyonun temsilcilerinin konuşmaları genellikle sınıf mücadelesi içerikli, ağaları, şeyhleri yani aşiretsel yapı hedefleyen konuşmalardı. Said Elçi ve arkadaşları ise, bir yandan ulusal demokratik perspektifle Kürtlere hitap ederek birlik ruhunu pekiştirirken diğer taraftan da kitlelere umut ve coşku veriyordu. Bir konuşmasında "devlet Kurdistan'da kaç tane üniversite yaptı da şeyhlerimiz karşı çıktı. kaç fabrika kurdu da ağalarımız fabrikaları kapattı. Bizim mücadele-miz devletin sömürgeci politikalarına karşıdır. Bu mücadelede yanımızda yer alan ağa-şeyh-bey-emekçi herkes bizim kardeşimizdir, karşımızda duran herkes de bizim hedefimizdir." diyordu. Said Elçi'nin bu şiarı Kurdistan'da dalga dalga yayılıyordu.

Kürtlerin cephesinde bu gelişmel-

er olurken Türk devleti de gelişmelerden endişelenerek 19 Ocak 1968 günü TKDP'ye karşı geniş bir operasyon başlattı. Said Elçi ile beraber 16 TKDP yöneticisi ve üyesi gözaltına alındı. soruşturmanın sonucunda 11 tutuklu ve 5'i de tutuksuz olmak üzere 16 kişilik önlü TKDP Antalya Davası başladı. Olay mahalli Diyarbakır ve çevresi olmasına rağmen güvenlik gerekçesiyle dava Antalya'ya taşındı. Antalya ağır ceza mahkemesinde yapılan duruşmalarda Said Elçi, davasını ve partisini hararetle bir şekilde savunur. Said'in uzun ve etkili konuşmasına tahammül edemeyen mahkeme başkanı "yeter Said yeter artık bizi de etkilemeye başladın" der. Said de hemen mahkeme başkanına dönerek "bu sözünü de zapta geçirmen hakim bey" der.

Antalya Davası süreci, aynı zamanda Said Elçi'nin siyasal ve biyolojik yaşamının da sonunu getirecek olan bir ilişki sürecin başlangıcıdır. 49'lar davasından beri tanıştığı doktor Said Kırmızıtoprak (doktor Şivan) o dönemde Isparta da doktor olarak çalışmakta olup Said elçi ve arkadaşlarını sık sık ziyaret eder ve iyi bir dayanışma örneği gösterir. Said Elçi'nin ateşli ve uzun bir savunma yaptığı duruşmada da Dr. Şivan dinleyiciler arasında bulunmaktadır. Duruşmanın sonucunda Said Elçi'ye yaklaşarak "Said ağabey, sen bizim onurumuz ve şerefimizsin" diye seslenir.

Hapishanedeki süreç iki Said'i birbirine yaklaştırır. 1969'da Antalya davası tutukluları tahliye olduktan sonra Dr Şivan, Said Elçi'ye bir öneri getirir; Güney Kurdistan'da Mele Mistefa

Barzani önderliğinde gelişen Kürt kurtuluş hareketine bir doktor olarak katkı sunmak, TKDP'nin de gelecekteki mücadelesi için bir alt yapı oluşturma amacıyla güneye gitmek istediğini söyler. Said Elçi Dr. Şivan'ın bu önerisine olumlu cevap verir. Dr. Şivan'ı bir süre sonra Siirt'te ikamet eden parti kurucusu ve yöneticisi Ömer Turhan'ın yanına güneye gönderilmek üzere yollar. Ömer Turhan Dr. Şivan'ı bir süre misafir eder. O süre zarfında Dr. Şivan'ın politik görüşlerini ve kişiliğini bir nebze de olsa çözer. Ömer Turhan politik öngörüsü güçlü olan bir şahsiyettir. Bu çerçevede bazı gerekçeler ileri sürerek Dr. Şivan'ı güneye göndermek istemez.

Said Elçi, Ömer Turhan'ın yanına bir kurye gönderir. Kendisine yol-ladığı adamı (Dr Şivan'ı) bir an önce belirtilen yere gönderilmesini ister. Ömer Turhan yine oyalama tavrı içine girer. Bir ay sonra ikinci bir kurye Ömer Turhan'ın yanına gönderilir. Bundan sonra yazacaklarım şuan da halen yaşayan 80 yaşındaki söz konusu kuryenin bana anlattıklarıdır. Bu kurye TKDP'nin kuruluşundan bu yana üyesidir.

Said Elçi'nin Diyarbakır'dan bir kurye vasıtasıyla Ömer Turhan'a hitaben yazdığı kapalı mektubu kendisine ulaştırmam üzere Siirt'in Kozluk ilçesindeki ikametgahıma getirdi. Mektubu Siirt'e Ömer Turhan'a götürdüm. Sonradan Dr. Şivan olduğunu



Yên li ser lingan ji milê rast ve: duyemîn Seîd Elçî,
yê çaremîn Medet Serhat. Yê rûniştî ji milê rast ve:
yê sêyemîn Dr. Şivan

öğrendiğim kişi de Ömer Turhan'ın evinde oturmaktaydı. Ömer Turhan mektubu okuduktan sonra bana işaret ederek dışarı çıkmamı istedi. İkimiz çarşıya doğru gittik. Mektubun içeriğinde, Dr. Şivan'ı uzun süredir yanın-da tutmakta olan Ömer Turhan'a sitem vardı ve bir an önce gerekli yere gönderilmesi isteniyordu. Ömer Turhan bana aynen şunları söyledi.

"Bak uzun süredir bu adamı yanımda tutuyorum. Politik olarak aşırı solcu bir ideolojiye sahiptir. Ayrıca çokta hırslı bir kişiliği var. Biz bunu güneye gönderirsek ileride başımıza bela olacak. Onun için ben göndermek istemiyorum."

Ben de kendisine dedim ki "Sen Said ağabeyin mektubunu okudun, artık senin bileceğin bir şeydir."

Ömer Turhan bir süre düşündükten sonra Said'in ısrarlarına dayanamamış olarak "Bak ben bu adamı göndereceğim ama ileride göreceksiniz başımıza bela olacaktır." Böylece Ömer Turhan Dr. Şivan'ın yanına bir rehber vererek onu güneye gönderir. Said Elçi'nin verdiği referansla beraberindeki birkaç arkadaşıyla Behdinan bölgesindeki IKDP yetkililerine ulaşırlar.

IKDP, Behdinan bölgesindeki Bamernî mıntıkasında onlara bir karargah tesis eder. Dr Şivan gençliğinin verdiği dinamizm ve enerjiyle bir taraftan güneydeki devrim kuvvetlerine doktorluk hizmetlerini sürdürürken diğer taraftan da kuzeyden etrafına önemli bir kadro biriktirir. Güneye gelme hazırlıklarını yaptığı sırada kuzeydeki arkadaşlarıyla vedalaşırken kendilerine şu mesajı veriyordu. "Bakın her ne kadar Said Elçi'nin referansı ile gidiyorsak da biz başka bir şeyiz. Bundan haberiniz olsun." (16 Mayıs 1969'da Kütahya'da öğretmenlik yapan ve şu anda hayatta olan bir arkadaşıyla vedalaşırken yukarıda belirttiğim sözleri sarf etmiştir.)

Dr Şivan kısa süre içinde Behdinan bölgesindeki IKDP yöneticilerine kendini sevdirebilir. Çünkü doktorun arkasında kuzeyden güçlü bir lojistik destek var. Dr. Şivan'ın talep ettiği tıbbi malzeme ve benzeri gereçler yeterince karşılanmakta, bu gereçler de güneydeki devrim kuvvetlerinin ihtiyaçları için büyük önem taşımaktadır. Bu realite Şivan'ın politik yetenekleriyle birleşince, popülaritesinin güçlenmemesi için bir neden

kalmamaktadır. Bundan sonra Şivan kendince asıl amaçlarına ulaşmak için önünde bir engel görmemektedir.

TKDP'nin referansı ile politik çalışma yapmak üzere güneye giden Dr. Şivan, gizlice yeni bir partinin faaliyetleri içine girer. Ne gariptir ki bu yeni parti T-KDP yani Türkiye'de KDP ismiyle adlandırılır. Her nedense Dr. Şivan KDP isminden vazgeçememektedir. Dr. Şivan'ın Güney'den gelmeden önceki gizli hazırlıkları, güneye geldikten sonraki faaliyetleri ve yeni kurduğu partinin sadece bir ("-" ve "de") ekiyle TKDP'den farklılık arz etmesinin politik literatürdeki tanımını ve yorumunu size bırakıyorum. Doktorun bu yaptığı biraz da karga ile güvercinin hikâyesini akla getirmektedir. Hani kış mevsiminde karga soğuktan perişan halde iken sıcak yuvasında barınan güvercine yalvarır, kendisine de azıcık ısınması için bir yer vermesini ister. Güvercin de karganın bu durumuna vicdanı razı olmaz ve kargaya ısınması için yer verir. Karga da ısınıp kendine geldikten sonra güvercini galayıp yuvadan kovarak güvercinin yuvasını sahiplenir, güvercini o kış soğukunda kaderiyle baş başa bırakır. Şivan'ın bu faaliyetlerini öğrenen Said Elçi, Faki Huseyin Sağnıç ile beraber konuyu Dr Şivan'la görüşüp çözmek üzere, Doktorun Bamernî'deki karargahına giderler. Doktor Şivan görünürde bunları iyi karşılar, oyalama taktiği ile "Siz kuzeye dönün, ben de yakında oraya geliyorum. Kuzeydeki arkadaşları da toplayıp bu konuyu kendi aramızda konuşup çözeceğiz" der. Bir süre sonra kuzeye gelen Şivan

birçok çevre ile görüşür, bir takım politik faaliyetler yapar ama Said Elçi'yi görme ihtiyacını duymaz. Said Elçi bunu öğrenince, Şivan'ın yaptıklarından daha da endişelenmeye başlar. Daha yolun başında sayılırken partinin iki başlı olması, Kürt ve dünya kamuoyu nezdinde, aynı zamanda ev sahibi olması itibarıyla Barzani nezdinde de hoş karşılanmayacaktır. Said Elçi bu sorunların içinden nasıl çıkılacağı yönünde kafa yorarken, Türk silahlı kuvvetleri 12 Mart 1971'de bir muhtırayla Süleyman Demirel hükümetini görevden alır, yeni bir hükümet kurulur. Bundan sonra Kürt yurtseverlerine yönelik geniş tutuklamalar başlar. Said Elçi ve arkadaşlarının isimleri de sıkı yönetim komutanlığı tarafından ilan edilen tutuklu listesinin içindedir. Said Elçi ve bazı arkadaşları kendini ele vermez bazı parti yönetici ve üyeleri tutuklanır. Said Elçi bir süre sonra Mihemedê Begê adlı parti üyesini de yanına alarak Nusaybin'den Suriye'ye geçer. Suriye'de Cigerxwin, Hemîdê Hacı Derwêş, Kenanê Egîd gibi Kürt yurtseverlerine misafir olur. Bir süre sonra da Suriye'den Zaxo'ya geçer. Zaxoya geçmekteki amacı; Türkiye'de ağırlaşan politik ortamdan yani tutuklanmaktan kurtulmak, diğer taraftan da doktor ile aralarındaki problemi diyalog ve görüşme yoluyla demokratik bir şekilde çözmektir.

Kurdistanî yurtseverliği ve demokratlığı, Kurdistan dağlarının zirvesinden akan pınar suları kadar berrak olan Said Elçi'nin karşısında ne yazık ki komplucu Stalinist bir ideoloji ile

yoğrulmuş, devrime kestirmeden gitmek isteyen, bu amacına ulaşmak için de önünde hiçbir engel tanımayan biri vardı. Zaho'da Mihemedê Begê ile beraber IKDP'nin mahalli komitesine ulaşan Said Elçi, Şivan ve arkadaşlarıyla görüşür. Buradan Dr. Şivan ile beraber Bamerni'deki karargâhına giderler. Bundan sonra Şivan, Said Elçi ve Mihemedê Begê'yi tutuklayarak kamptan biraz uzak mesafede bulunan cephanelik binasında hapseder. O binada Tilki Selim (Selimê Usê), Mahmut Yolbir (Mehmûdê Hasenka) ve Hasenê Seyro cephanelik nöbetçisi olarak bulunmaktadır. Mahmut Yolbir ve Selim Tilki Garzan bölgesinin en önemli aşiretlerinden biri olan Pencenar'ın Faro kolundandır. Hesenê Seyro ise Midyatlı olup Hevêrkan aşiretindendir. Bunlar Garzan ve Botan dağlarında yıllarca asi mahkum olarak yaşamış, birçok defa devletin kolluk kuvvetleri ile çatışmaya girmişlerdir. 1968'de Siirt'in doğusunda Botan nehri vadisinde bulunan Kutmîs Köyü'ndeki çatışmaları halen halk arasında bir destan gibi anlatılmaktadır. O günü, ben de daha dönmüş gibi hatırlamaktayım. 1996'da Duhok'ta bir evde tesadüfen karşılaştığım Hesenê Seyro bana olayı şöyle anlattı.

"Mahmudê Hesenka ve Hasenê Seyro köyün camisinde kısıtılmış ve binlerce asker tarafından çembere alınmıştı. Sürekli teslim ol çağrıları yapılmaktaydı. Bir ara bir üstegmen camiye yaklaşarak Kürtçe onlara seslenir. Teslim olmaları halinde cezalarının hafifleyeceğini, zaten kur-

tuluşlarının da mümkün olmadığını söyler. Üsteğmenin Kürtçe konuşması bunları duygulandırır. Hasenê Seyro üsteğmene "sen Kürtçe konuştuğuna göre Kürt olmalısın" der ve memleketini sorar. Üsteğmen Erzurum'un Kürtlerinden olduğunu söyler. Hasenê Seyro "madem sen Kürtsün mermilerimizle ölmeni istemiyoruz. Onun için git iyi bir yerde saklan" der. Üsteğmen "son sözünüz bu mudur?" der. Hasenê Seyro'nun cevabı "evet, son sözümüz budur" der ve sonra şiddetli çatışma başlar. Caminin içinde kısıtılan iki kişi sayıları binlerle ifade edilen askerlerle saatlerce çatışır. Mevsim bahardır. Çatışma sürerken kara bulutların çökmesiyle göz gözü göremeyecek şiddette bir yağmur fırtınası başlar. Hasenê Seyro ve Mahmûdê Hasenka bu fırsattan faydalanarak, arkada bir astsubay iki de erin ölüsünü bırakarak yaralı bir halde çemberi yarıp kurtulurlar. Hasenê Seyro bu olayı Allah'ın kendilerine bir lütfü olarak anmaktadır."

1970'te Garzan ve Botan bölgesinde dağlardaki asi mahkûmlara karşı yo-ğun askeri operasyonlar başlayınca, bu üç kişi partinin kurucusu ve yöneticisi Derwêşê Sado'nun önerisi ve Said Elçi'nin referansı ile Dr. Şivan'ın kampına gönderilirler. Şivan bunları aileleri ile beraber kabul ederek söz konusu cepha-nede sorumlu yapar. Ben Hasenê Seyro'yu gördüğümde Said Elçi olayını sormadan edemedim. Kendisi bu olayla ilgili bildiklerini bana şöyle anlattı.

"Olaydan kısa süre önce kişisel bir meseleden dolayı Selim Tilki ile aramda

bir dargınlık oldu. Mahmud Yolbir, Selim Tilki'nin amcasıoğlu için Selim'den yana tavır aldı. Bu nedenle ben onlarla küstüm. O sırada iki kişinin cephane binasına hapsedildiğini ve bunların Türk casusu olduğunu işitmiştim. Çünkü Dr. Şivan bunları hapsederken Selim ve Mahmud'a onları bu şekilde tanıtmış ve kaçmaları halinde kendilerini cezalandıracağını söylemiştir. Bir gün ben bahçeyi bellerken bu iki kişiyi çıkarıp götürdüklerini gördüm. Şivan ve arkadaşları bunları götürürken Tilki Selim'in elinde kazma kürek ile bunlarla beraber gittiğini görünce bunların öldürüleceğini anladım. Bir müddet sonra ellerindeki kazma kürekleriyle beraber geri döndüklerinde, yanlarındaki söz konusu adamlar yoktu. O zaman onların öldürüldüğünü anladım. Olay ortaya çıktıktan sonra bu kişinin Said Elçi olduğunu öğrenince şok oldum. Eğer baştan Said Elçi olduğunu bilseydim ölümüm pahasına olsa Said Elçi'yi oradan kurtarırdım."

70'li yaşlarda ve bir delikanlı çevikliğine sahip olan, halen Barzani'nin peşmergeliğini yapan Hasenê Seyro bu sözleri söylerken gözlerinde şimşekler çakıyordu.

1959'da 49'lar Davası'nda, İstanbul Harbiye Kışlasında Dr. Şivan'la başlayan ve 1968 Antalya Mahkemesi'nde yaptığı ateşli savunmalarda, mahkeme başkanını dahi etkileyen duruşuyla Şivan'ın "Ağabey sen bizim onurumuz ve şerefimizsin" tezahürüne mazhar olan yol arkadaşlığı, 1 Haziran 1971 günü onbinlerce şehidin kanıyla sulanarak bir nebze de olsa özgürleşen Güney Kurdistan toprakları'nda yani Barzani'nin egemenlik bölgesinde, Dr Şivan tarafından bitiriliyordu.

Bu vahim sonuç, hiç şüphesiz ki son dakikaya kadar bile Said Elçi'nin aklının ucundan geçmemiştir. Daha önce Zaxo'da yerleşmiş bulunan Palolu Mele Mihemed, Said Elçi'yi, Şıvan'ın yanına gitmemesi için uyarır. Hatta ona "Şıvan seni öldürecek, oraya gitme" der. Said Elçi de buna gülerek "Mele Mihemed, sen nasıl öyle bir şey düşünürsün" der.

Bu gelişmeler olurken, Said'in arkadaşları da onun izini sürdürmekteydiler. Partinin iki kurucusu Derwêşê Sado ve Şakir Epözdemir, Said Elçi'nin kullandığı güzargahı kullanarak yaklaşık bir hafta sonra Sürye'ye geçerler. Said Elçi'nin misafir olduğu Kürt şahsiyetlere uğrarlar ve Elçi'nin Zaxo'ya geçtiğini öğrenirler. Bunun üzerine Said'in Zaxo'da kaldığı yeri öğrenmek isterler. Kendilerine çelişkili haberler gelince, Derwêşê Sado kaygılanmaya başlar ve Cizre'de bulunan parti yetkilileri ile Sürye'den irtibat sağlar. Cizre'deki parti yetkilileri hududu geçerek Sürye'nin Ayndîwer kasabasında Derwêş ile görüşüp durum değerlendirmesi yaparlar. Bu durumda Said'n akibetinden endişe duymaya başlarlar. Bunun üzerine bir tahkikat komüsyonu oluşturup Cizre-Silopi üzerinden Zaxo'ya gönderirler. Tahkikat komüsyonundaki kişi Dr. Şıvan'ı yıllar önceden, 49'lar Davası'ndan beri tanımaktadır. Tahkikat komüsyonu Zaxo'daki IKDP yetkilisi Osman Qazî'nin bürosuna uğrar ancak Osman Qazî'yi makamında olmadığı için, bu arada sözkonusu kişiler Osman Qazî'nin bürosunda çalışan kişiye Said ile ilgili bazı sorular sorar-

lar. Büro çalışanı Said Elçi'nin kendilerine uğradığını, kendisiyle beraber yemek yediğini ve daha sonra büroya gelen Dr. Şıvan ve arkadaşlarıyla sıcak bir karşılaşmadan ve bir kucaklaşmadan sonra, buradan ayrılıp Dr. Şıvan'ın karargahına gittiklerini söyler. Bir süre sonra makamına gelen Osman Qazî, onu beklemekte olan ve önceden tanıdığı misafirleri görünce, süratı rengten renge girmektedir. TKDP yetkilileri durumu Osman'a açıkladıktan sonra, Osman Qazî, Said'in kesinlikle kendilerine uğramadığını söyler. Bunun üzerine Tahkikat Komüsyonu sorumlusu Dr. Şıvan'ı görmek istediğini söyler. Dr. Şıvan Zaxo'ya çağırılır. Şıvan burada Said'in izini sürdürmekte olan eski bir arkadaşıyla karşılaşır ve kesinlikle Said Elçi'den haberdar olmadığını söyler. O gece, Dr. Şıvan ve Said'in akibetini öğrenmek üzere gelen kişi birlikte aynı odada kalırlar. Şıvan'ın bu eski arkadaşı durumdan şüphelenir ve kendi deyimiyle, tabancasının ağzına mermiyi sürerek, sabaha kadar uyuklu numarası yapar ama asla uyumaz. Çünkü bu gelişmeden sonra artık Şıvan'a şüphe ile yaklaşmaktadır. Tahkikat komüsyonu raporunu hazırlayarak Sürye'de buluna arkadaşları Derwêşê Sado'ya da gönderirler. Bu rapordan sonra Derwêş'in kafası daha da karışır ve endişeleri derinleşir. Bundan sonra Güney Kürdistan'a geçen Derwê va Şakir bu gelişmeler hakkında farklı düşünmektedirler. Şakir, Şıvan'ın yanına giderek tahkikatı onun da desteğiyle sürdürme taraftarıdır. Derwêş ise, Şakir'den farklı düşünmektedir; Şıvan'a asla

güvenilemeyeceğini söyleyerek durumu açıklamak üzere Gırala'ya, Serok Mistefa Barzani'nin yanına gider. Bundan sonra olay adım adım çözümlenerek, Kuzey Kurdistan'ın yakın siyasal tarihinin en trajedik olayı tüm çıplaklığıyla ortaya çıkar.

Bu trajik olaydan sonra, Dr. Şivan'ın arkadaşları hiç vakit kaybetmeden bir resmi politika oluşturdular ve her iki Said'in de Barzani'ler tarafından katledildiğini kitlelere yaymaya başladılar. Bu resmi politikalarını inandırıcı kılabilmek için İsrail-ABD-Türkiye denklemine komplo teorileri geliştirmeye başladılar. Onların resmi görüşlerine göre Barzani-ABD ve Türkiye'nin dayatmalarına boyun eğerek her iki Said'i çeşitli vesilelerle ortadan kaldırmıştır. Bu resmi görüş, Kurdistan'da cepheleşmeye ve büyük tahribatlara yol açtı. O günün ideolojik perspektifi ile vicdani bir muhasebe yapıp objektif-gerçekçi bir değerlendirme yapmaları çok zordu. Çünkü her şey merkeze alınan ideolojik prensiplerle açıklanıyordu. 1990'da SSCB'de Perestroyka ve Glasnost hareketleri sonucu SSCB'nin dağılmasından sonra 1991'de Medya Güneşi adlı dergide Partiya Pêşeng ê Karkerên Kurdistan (Kurdistan Öncü İşçi Partisi)'nin genel sekreteri Serhad Dicle ismiyle 23 sayfalık Perestroyka ve Glasnost değerlendirilmesi yapıldı. Bu değerlendirmenin son sayfasında Serhad Dicle, "Bu geldiğimiz noktada artık Dr. Şivan'ın Said Elçi'yi öldürmediğini iddia edemeyiz ama keşke kısasa kısas olmasaydı." Serhad

Dicle'yi ve Genel Sekreteri olduğu PPKK'yi bir anlamda Şivan'ın siyasi mirasçısı olarak değerlendirdiğimizde 20 yıl sonra da olsa böyle bir çizgiye gelmesi anlamlıydı. Çünkü 20 yıldır süren resmi politika en önemli ağızdan dumure ediliyordu.

War dergisi son yıllarda bu olayı araştıran bir dosya önüne koydu. Said Elçi ve Dr. Şivan olayını yakından bilen arkadaşlarına ulaşarak bu trajedik olayla ilgili olarak Kürt kamuoyunu aydınlatmak için çağrıda bulundu. Said Elçi'nin yakın arkadaşlarından Derwêşê Sado, Şerafettin Elçi ve Şakir Epözdemir çağrıya olumlu cevap vererek bildiklerini War dergisine yazdılar. Böylece tarihsel bir sorumluluk ve görevi yerine getirerek, bu olayın aydınlanması için önemli derecede ışık tuttular. Dr. Şivan'ın yakın arkadaşları ve olayın içyüzünü yakından bilen Soro (Nazmi Balkaş), Faki Hüseyin Sağnıç ve Ömer Çetin War dergisinin bu çağrısına "önce Said Elçi'nin arkadaşları cevap versin, ondan sonra biz de yazacağız" dediler. Said Elçi'nin arkadaşlarının yazmalarına rağmen, Şivan grubundan hiçbirinden olayla ilgili açıklama mahiyetinde bir cevap gelmedi. Bir süre sonra Soro ve Hüseyin Sağnıç bu dünyaya veda edip hakkın rahmetine kavuştular. Bu sırları da kendileriyle götürdüler. Med TV'deki bir programda Faki Hüseyin Sağnıç'ı dinlerken doğrusu ben de şaşırmışım. Faki Hüseyin, o dönemi anlatırken kendisini ve Doktor Şivan'ı ilerici, Said Elçi ve arkadaşlarını gerici olarak nitelendiriyordu. Oysa bütün geliş-

melerde Faki Hüseyin, Said Elçi'nin yanında duruyordu. Said elçi ile Dr. Şivan'ın ilişkileri de Faki Hüseyin üzerinden yapıyordu. Yukarıda bir bölümde anlattığım gibi, güneye Doktor Şivan'a yapılan ilk ziyareti de Faki ile Said beraber yapmışlardı. Faki Hüseyin'in Med TV'deki konuşmasında kendisini Şivan'ın arkadaşı olarak nitelemesi, aslında o günün komplosunun bir parçasını ele veriyordu.(Faki Hüseyin Sağınç, TKDP'nin 1968 Antalya Davası'nın tutuksuz yargılanan sanıklarından biriydi.) olayın en önemli tanığıdır.

Bu yazıda bugüne kadar hiçbir yerde değinilmeyen bir ayrıntıyı da aydınlatmak istiyorum. Jir kod isimli Kemal Kaçmaz, Musa Anter'in referansı ile Dr. Şivan'ın kampına gönderilir. Kampta arşiv bölümünde görevlendirilir. Aynı zamanda bu kişi Musa Anter'in yakın akrabasıdır. Olaydan sonra kamp dağılır, kamptakiler bir şekilde Türkiye'ye dönerler. Jir kod isimli Kemal Kaçmaz, Diyarbakır'daki sıkıyönetim mahkemesine gelir. O dönem Dr. Şivan'ın kampında bulunan ve Diyarbakır sıkıyönetim mahkemesince tutuklanan kadrolar üzerinde mahkeme nezdinde tek tek ifade verir. Böylece bunun oraya sızmış bir MİT ajanı olduğu ortaya çıkar. Her nedense Şivan'ın eski arkadaşları yazdıkları yazılarda CIA-MİT-MOSSAD ve Barzani eksenli o kadar komplo teorisi ve senaryo üretirken, Jir konusunda bir tek kelime yazmamaktadırlar. Doğrusu bu da düşündürücüdür. Son yıllarda Jir, Med TV'deki bir programa farklı bir

isimle katılmış olup, o dönem Jir ile beraber Şivan'ın kampında bulunan kişiler tarafından teşhis edilmiştir. Jir'in Avrupa'daki PKK kurumları içinde önemli bir mevkide olduğu Kürt siyasi gözlemcileri tarafından iddia edilmektedir.

Said Elçi-Dr. Şivan Olayının Kurdistan Yurtsever Demokratik Hareketi Üzerindeki Olumsuz Etkileri Ve Çıkarılması Gerekten Dersler

Bugün geldiğimiz noktadan dönüp geriye baktığımızda Dr. Şivan ve Said Elçi olayını değerlendirsek; olayın asıl sebebi Dr. Şivan'ın oğün sahip olduğu ideolojik, politik ve kültürel motivasyonudur. 20. yüzyılın başından itibaren örgütlülük geleneğini Kürt Teavün ve Teraki, Kürdistan Teali Cemiyeti, Kurdistan İstiklal Komitesi (Azadi) ve Xoybûn gibi örgütlere dayanarak sürdüren Kurdistan yurtsever hareketi, bu süreçlerde İttihat-Terakki ve Kemalist gelenekten etkilenmediği gibi Leninist-Stalinist ideolojiye de mesafeli durmaktaydılar. 1938 kırılma noktasından sonra ve 1960'lardan itibaren ortaya çıkan yeni kürt jenerasyonu(solcu jenerasyon) bir taraftan Türk sömürgeci eğitim sistemi içinde İttihat-Terakkici ve Kemalist kültürle motive edildi. Diğer taraftan da Türk üniversitelerinde kemalist hocalardan Leninist-Stalinist-Maoist düşünceleri öğrendiler. Bu donanımla Kurdistan'da örgütsel faaliyet içerisine girdiler.

Böylece Kuzey Kurdistan'daki

Kürt ulusal hareketi, 20. yüzyılın son çeyreğinden itibaren sol perspektifin etkisi altına girdi. Bu döneme kadar Kürt ulusal hareketinde egemen olan çizgi, geleneksel-ulusalcı çizgiydi. Sol düşüncenin etkinliğinin artmasıyla birlikte, kürt ulusal hareketinde komp-lucu siyasal perspektiv nifus etmeye başladı. Said Elçi olayı da bu perspektiften değerlendirildiğinde, 20. yüzyılın başından bu yana Kürt hareketi içerisinde yaşanan bir ilkti. Daha önceki döneme yani gelenekselci-ulusalcı çizginin egemen olduğu döneme bakıldığında bu tür olaylara rastlanmaz. Said Elçi olayıyla Kürt hareketine sirayet eden bu bakış, ilerki yıllarda diğer bazı kürt gruplarına da sirayet etti ve bir siyasal yöntem olarak kabul gördü.

Bu bakış açısı çerçevesinde çıkartılan fetva sonucu, Dengê Kawa lideri Ferid Uzun da 22 Kasım 1978'de bir komplo sonucu öldürüldü. O günden beri bu olayla ilgili oluşturulan bütün senaryolar anlatıla dursun, yıllar sonra bu suikastın PKK lideri Apo'nun talimatıyla yapıldığı ortaya çıktı. Bir sefer bu yaklaşım bir siyasal yöntem olarak kabul gördükten sonra, belli bir grubun kullandığı bir yöntem olmakla sınırlı kalmadı, farklı zeminlerde seyreden diğer kürt gruplarının da kullandığı bir yöntem oldu ve bu perspektifte başka suikastlar da gerçekleşti.

Sonuç olarak, Kuzey Kurdistan'da 1 Haziran 1971'de, Dr. Şivan ve Said Elçi olayıyla yerleşmeye başlayan bu bakış, PKK ve KUK tarafından da benimsenen bir yöntem dönüştü. Özellikle PKK, bu yöntemi hem kendi içindeki muhaliflere ve hem de diğer Kürt yurtseverlerine karşı acımasız bir

şekilde uygulayarak büyük tahribatlara yol açtı ve ne yazık ki halen bu tutumunu sürdürmekte de ısrarlıdır.

Said Elçi'nin öldürülmesi olayı, aynı zamanda geleneksel yurtsever Kürt hareketinin de duraklama dönemine girmesine neden oldu. Bundan sonra toparlanma girişimleri olduysa da, Faik Bucak ve Said Elçi'nin bıraktığı boşluk doldurulamadı.

Güney'de Barzani önderliğinde gelişen Kürt ulusal hareketinin, 1975'te ABD ve İran'ın ihaneti sonucu darbe alıp yenilgiye uğraması, Barzani-Said Elçi çizgisindeki yurtsever Kürt hareketini büyük bir sekteye uğratıp adeta günah keçisi durumuna getirildi.

Elçi'den sonra TKDP, yaptığı iki kongreyle toparlanmaya çalıştıysa da gerekli başarıyı sağlayamadı. 1975'te yapılan Kongre'de bir nebze de olsa insiyatifi ele geçiren solcu kadrolar, 1977'de yapılan Kongre'de partiyi tamamen ele geçirip Kürdistan Ulusal Kurtuluşçular(KUK) ismini aldılar. Onlara göre KDP ismi artık gericiliği, ilkel milliyetçiliği çağırıyordu. Barzani- Said Elçi çizgisindeki kadrolar ise TKDP'yi devam ettirmekte karar kıldılar.

1990'larda Prestonika-Glasnost hareketleri sonucu dağılan sovyet bürokratik diktatörlüğü, bölgede ve dünyada yeni bir sürecin başlangıcına neden oldu. Sovyetlerin dağılmasıyla Doğu Avrupada, Ortaasyada ve Kafkasyada yeni devletler ortaya çıktı. Aynı dönemde Irak'ın Kuveyti işgal etmesiyle başlayan I. Körfez Savaşı sonucunda ortaya çıkan boşluğu değer-

lendirmesini başaran Güney Kurdistan hareketi, IKDP ve YNK önderliğinde federatif bir Kürt devleti yapılanmasını sağlayarak sürece dahil oldular. SSCB'nin dağılması ve Barzani çizgisi önderliğinde Güney Kürdsitanda bir federal devlet yapısının ortaya çıkması, bütün kürt politik hareketini derinden etkiledi. En önemli etkilerinden biri, yarım asıra yakındır kabe olarak bilinen Leninst-Stalinist ideolojilerin birden yıkılmasına neden oldu. Diğer önemli etkisi ise, çok değil daha onbeş yıl önce gericiliği ve ilkel milliyetçiliği çağrıştırdığı gerekçesiyle solcu jenerasyon tarafından reddedilen Barzanî-Said Elçi çizgisi, tüm kürtlere yeniden umut olamaya başladı.

Yukarıda Prestorika-Glasnost hareketleri sonucu ideolojik mabetlerin yıkıldığını ve bunun da Kürt siyasi hareketini olumlu yönde etkilediğini söylemiştik. Ne varki Kürt hareketi kendi Prestorika ve Glasnost'unu yeterince geliştiremedi. Bu konuda başarılı bir sınav veremediler.

Kuzey Kurdistan'da şu andaki siyasi istikrarsızlık ve bölünmüşlüğü'nün altında yatan temel nedenlerden biri de, 1960-70'li yıllarda gelişen solcu Kürt jenerasyonunun sahip olduğu reaksiyon kültürüdür. Bu anlamda türk solu ile müthiş bir benzeşme vardır. Bunun için yapılması gereken şey, hızla bu reaksiyon kültüründen arınarak aksiyon haline gelemek, demokratik ve Kürdistanî bir zeminde kendini yeniden üreterek hayata geçirmektir.


23 Temmuz 08/Amed

Dr. Qasimlo:

Serokekî Demokrasîya Civakî û Hevalê Dubçek ê Çekî

Îbrahîm GUÇLU
(ibrahimguclu21@gmail.com)

Dr. Ebdulrehman Qasimlo piştî îdamkirina Qazî Mihemed, serokekî bi navûdeng ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (PDK-Îran) ye. Di sala 1979an de dema ku li Îranê desthilatdariya siyasî bi rêya "şoreşê" hate guhertin, desthilatdariya Şahê dîktator û hevalbendê Emerîkayê (DYAyê) jî hat hilweşandin, di şûna wê de Komara Îslamî, desthilatdariya Îslamî û teokrat hat avakirin. Wê demê navê Dr. Qasimlo wek serokekî PDKa Îranê derkete pêş û li hemû Kurdistanê wek serokekî Kurdistanê hat pejirandin. Lewra di rûxandin û hilweşandina rejîma Şahî de tevger û muxalefeta Kurdistanê û di nav muxalefeta Kurdistanê de Dr. Qasimlo jî, ji bona ku li welatên Awrûpayê xwediyê rolekî bû û li Awrûpayê bi Xumeynî û bi hevalên wî



Dr. Qasimlo

re xwediyê peywendiyeka nêzik bû. Ji bona vê jî dema ku rejîma Şah hat

rûxandin **PDK-Îranê, Komeleya Zehmetkêşan û Şêx Îzeddîn Huseynî** û tevayî muxalefeta Kurdistanê bûn desthilatdar û bi xwe îdareya Kurdistanê birêve birin.

Di Tebaxa 1979an de dema ku dewleta Farisan li hemberî kurdan û Kurdistanê şer îlan kirin, ew peymanan ku di navbeyna kurdan û Xumeynî de hebû, ji aliyê Xumeynî û hevalên wî ve ji holê hate rakirin, li Kurdistanê serok û rêxistinên Kurdistanê mecbur bûn ku gelê xwe û Kurdistanê biparêzin. Dr. Qasimlo, li Rojhilata Navîn, li Awrupayê û li dinyayê wek serokekî kurd û Kurdistanê derket pêş. Ev rewş û pozîsyona wî, ji ber xebata wî ya zanyarî û pozîsyona bihurî dihat.

Dema ku di Îlona sala 1979an de şerê pêşmergeatî yê azadî û rizgariya Kurdistanê dest pê kir, her zarokekî kurd jî navê Dr. Qasimlo bihîst û jê re rêz girt.

Kurtejiyana Wî

Gelek serkanî û bi taybetî jî serkanîyên PDKa Îranê diyar dikin ku Dr. Ebdulrehman Qasimlo di 22. 12. 1930-an de li bajarê Urmiyeyê hatiye dinyayê. Malbata wî dewlemend û xudanmilk bû. Ew lawê Mihemed Axayê Wisuq bû. Wî li Urmiyeyê dest bi xwendina xwe ya destpêkî û navînî kir û pişt re jî li Tehranê dewam kir û li wê bi dawî anî.

Dema ku ew hîn di 11-12 saliya xwe de bûye, ji kurdîti re eleqe nîşan dide. Lewra di wan salan de li Kurdistanê, li Rojhilata Navîn, li Îranê, li dinyayê bûyerên gelek girîng

ku çehreya dinyayê û herêmê biguherin hatibûn rojevê. Li bakûrê Kurdistanê; li Dêrsîmê serhildana neteweya kurd, wekî berdewama serhildana Agrîyê di sala 1938an de dest pê dike. Li Başûrê Kurdistanê Teygera Berzaniyan dewam dike. Li Rojhelatê Kurdistanê, di sala 1921an de di bin serokatiya Simko Axa de serhildan dest pê dike û gelek herêmên Kurdistanê azad dibin. Hezar mixabin Simko Axa dîl dikeve û li Şînoyê tê daleqandin. Piştî vê bûyera mezin û serhildana neteweyî ya Kurdistanê, li Rojhelata Kurdistanê zilm û zordariyeke mezin, heta sala 1940an didomîne.

Wê demê Senandaj û Mehabad navenda tevgera siyasî ya Kurdistanê bû. Di sala 1942an de **Komeleya Jiyaneveya Kurd** ava dibe. Ji ber van bûyeran, baş tê fahmkirin ku çima Dr. Qasimlo di 11-12 salî ya xwe de ji siyaseta û kurdîti re eleqe nîşan daye.

Di pêvajoya Şerê Cihanî yê Duyemîn de, di sala 1941an de Îngiltere û DYAyê başûrê Îranê, Yekîtiya Sovyetê jî bakûrê wê dagir kiribûn. Ji bona ku Komeleyê wek rêxistin nedikarî hewcedariya neteweya kurd li Rojhelatê Kurdistanê pêk bîne, di 25ê Tîrmeha sala 1945an de, bi destê Qazî Mihemed û 60 hevalên wî PDKa Îranê hate damezirandin.

Dr. Qasimlo rewşa xwe ya wan salan di pirtûka xwe ya "**Çil Salan Xebat di Rêya Peyama Azadiyê de**" dike. Di heman demê de ew behsa vexwendina şanda kurd ji bo Yekîtiya Sovyetê jî dike ku çûbûn Bakûyê.

Dibêje ku: "Herçend ku wî çaxî ez

yanzdeh salî bûm jî, lê di nav zarokên wê demî de ji herkesî zêdetir siyaseta bala min dikişand. Bavê min yek ji endamên wê şandê bû.

"Gelek baş tê bîra min, dema ku bavê min ji Bakûyê vegeya, çend tayê qende û teypureke ciwan jî digel xwe anîbûn. Wisa xuya bû ku Sovyetîyan qend û tifeng û tiştên dinê wekî dîyarî dabûne tevayê endamên vê şandê. Wî demî bi taybetî qend gelekî bi nîrx bû, çinku wî demî qend di Îranê de kêr û giran bû. Dema min ev yekê dît ez pir heyirî mam, çinku di mala me de birayên min û kurmamên min ku ji min mezintir bûn, basa vê yekê dikirin ku bavê min bi çend kesên din re çûne Bakûyê da ku basa maf û azadiya kurdan bikin, lewma min jî rast û rewan ji bavê xwe pirsî: Erê bavo mafê kurdan çi jê hat?"

Dr. Qasimlo dema ku bû 15 salî, di sala 1945an de li Urmiyeyê bi avakirina **"Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê"** dest bi siyaseta xwe ya aktîf dike. Dema ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê ava dibe, ew berpirsiyarekî tevger û rêxistina ciwanan e. Ji bona vê jî damezirandina Komara Kurdistanê ji nêzik de dişopîne, hîs dike, di nav beşên Komara Kurdistanê yê ciwanan de çî digre. Dema ku avabûna Komarê tête îlankirin, ew jî ji bona xwendinê diçe Tehranê. Piştî ku li Tehranê xwendina xwe xelas dike, ji bo dewamkirina xwendinê, diçe Parîsê.

Piştî ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi hevkarîya hêzên rojava û xiyaneta Yekîtiyê Sovyetê têkçû, ew û

gelek hevalên xwe bi rengekî nihênî û berfireh dîsa dest bi xebata siyasî dikin. Piştî re ew dibe endamê PDK a Îranê. Dr. Qasimlo û hevalên wî di kar û xebatên xwe yê siyasî û rêxistinî de, ji Mîna Qazî ku wek dayika kurdan tê binavkirin, gelek alîkarî digrin.

Dr. Qasimlo li Parîs û Pragê

Dema ku Dr. Qasimlo digihîje Fransayê/Parîsê di navbeyna xwendevanên zanîngeha Tehranê û Rejîma Şahî de şer pêk tê û li zanîngehê gelek xwendevan tên kuştin. Piştî re muxalefet û serhildana civakî li hemû Îranê dest pê dike. Dr. Qasimlo û hevalên wî, hemû xwendevanên Îranê yê li Fransayê tevgerake protesto û rûreşkirinê organîze dikin, civîneke kutlewî û girseyî pêk diînin. Dr. Qasimlo di wê civînê de li dijî rejîma Şahê Îranê axevtineke gelek dîrûdirêj dike. Di civînê de biryar tê girtin ku nameyeke rûreşkirin û protestokirinê amade bikin, vê nameyê ji Şah re bişînin. Ev çalakî û xebat dibe sedem ku rejîma kolonyalist, faşîst, dîktator bi rêya balyozxaneyê xwe zorê li ser Dr. Qasimlo çêke û jiyana wî bixin xeteriyê.

Dema ku Dr. Qasimlo vê yekê tespît dike, her çiqas wek yekem bur-siyerê Îranê yê "Yekîtiya Navneteweyî ya Xwendevanan" be jî, dev ji Parîsê ber dide diçe Prag a payîtexta Çekoslovakayê dibe rûniştvan.

Dr. Qasimlo beriya ku biçe Pragê, ew û çend xwendevanên kurd, "Civata Xwendevanên Kurd li Awrupayê" ava dikin.

Dr. Qasimlo dema ku li Pragê dest bi xwendina xwe dike, di heman demê de dibe endamê **"Yekîtiya Xwendevanên Navneteweyî"** û di nav yekîtiya navneteweyî de xebata xwe ya demokratîk, kurdayetî, enternasyonalî dimeşîne.

Dr. Qasimlo di sala 1951an de li Pragê di kongreya 2emîn a **"Yekîtiya Xwendevanên Navneteweyî"** de dibe nûnerê xwendevanên Îranî di nav rêxistina navneteweyî de. Ew wek nûnerê xwendevanên Îranê li gelek civîn, konferansên Federasyona Ciwanên Navneteweyî de beşdar dibe, bîrûrayên xwe tîne ser zimên.

Ew nûnertiya Dr. Qasimlo di salên 1979an de jî bû sedema minaqeşeyê ku PDKa Îranê seksiyona TUDEHê ye, yan na? Gorî îdiaya TUDEHê û komunîstên Farisî, PDK a Îranê, piştî hilweşandina Komara Kurdistanê û daleqandina serokên Komarê, ber bi seksiyonbûna Partiya Komunîst a Îranê (TUDEHê) diçe, pişt re bi hewildana Partiya Komunîst a Sovyetê ev yeka pêk tê. Yekîtiya Sovyetê, ew hewildana xwe ya beriya ku partî ava bibe û Komara Kurdistanê ava bibe, dixwest ku Kurdistan bibe beşek ji Azerbeycana Îranê. Xuyaye ku dixwaze vê fikra xwe di merheleke din de û bi awayekî din pêk bîne.

Vegera Wî ya Îranê

Dema ku di sala 1952an de Hikumeta Dr. Musadiq desthilatdar dibe, Dr. Qasimlo jî Zanîngeha Pragê diqedîne û lîsansa zanistîya civakî û siyasî werdigre û vedigere Îranê. Li



Tehranê bi cî dibe. Wê demê di navbeyna PDKa Îranê û TUDEHê de yekîtiyek heye. Dr. Qasimlo piştî şeş mehan vedigere Mehabadê û beşdarî xebata PDKa Îranê dibe.

Piştî ku li hemberî hikumeta Dr. Musadiq darbeya leşkerî pêk tê, Dr. Qasimlo mecbur dibe ku xwe veşêre û jiyana xwe ya siyasî û rêxistinî bi tevayî nihênî bimeşîne. Wê demê li Kurdistanê û li Tehranê bi aktîfî beşdarî xebata PDKa Îranêdibe. Dîsa wê demê Dr. Qasimlo berpirsiyariya rojnameya *Kurdistanê*, ku Organa komîteya navendî ya partiyê bû dike. Di van şertan de di bin serokatîya wî de li seranserê Kurdistan û Îranê de Komîteya Karûxebatên Partiyê ava dibe.

Vegera wî ya Îraqê

Dr. Qasimlo piştî pênc salan, di sala 1957an de dîsa vedigere Çekoslovakayê. Di sala 1958an de dema ku li Îraqê guhertina desthilatdarî dibe û Tevgera Kurdistanê jî nû ve radiibe ser piya û xurt dibe; PDKa Îraqê legal dibe û Mela Mistefa Berzanî û hevalên wî ji Yekîtiya Sovyetê vedigerin Îraqê, Dr. Qasimlo û çend hevalên wî jî vedigerin Îraqê, dixwazin ku li rojhe-

lata Kurdistanê û li Îranê rêxistina tevgerê bikin û ji nû ve bivejînin. Lê xuya ye ku terefên kurd jî tê de, çend teref jî karên wî û hevalên wî kêfxweş nebûn. Dewleta Îraqê biryar da ku ew jî Îraqê derkeve.

Cardin Vegera Wî ya ji bo Pragê

Dr. Qasimlo mecbur dibe ku vegere Pragê. Ew, di sala 1962an de li Zanîngeha Pragê doktoraya zanîstiya aborî digre û heta sala 1969an li Zanîngeha Pragê dersa aboriya sermayedarî, aboriya sosyalîstî dide. Di van şertan de Dr. Qasimlo çend pirtûkan jî dinivîsîne. Pirtûka wî ya bi navûdeng, "*Kurdistan û Kurd*" e. Beşekî vê pirtûkê, li Tirkîyeyê jî hatîye çapîkirin.

Orjînalê vê pirtûka Dr. Qasimlo bi zimanê çekî hatîye nivîsandin, piştî re jî bi zimanên kurdî, îngilîzî, silowakî, lêhistanî, erebî; hinek beşên wê jî bi farisî hatin çapîkirin. Qasimlo qîma xwe bi tenê xebatên akademîk neanî, ew entelektûel û zîmanzanekî gelek baş bû. Wî zimanê kurdî, farsî, tirkî, erebî, fransî, çekî, rusî baş dizanî. Li ser zimanên din jî, wekî elmanî û zimanên silawî heta merheleyekê zanîyariya wî hebû.

Dr. Qasimlo û Xêza Yekîtiya Sovyetê

Dr. Qasimlo demokratekî civakî bû. Di destpêkê de nêzikê rêjim û îdeolojiya Yekîtiya Sovyetê bû. Lê dema ku Yekîtiya Sovyetê di sala 1968an de

vekirî êrişî Çekoslovakiyayê kir û Çekoslovakiya dagîr kir, li Çekoslovakiyayê di bin serokatiya Dubçekî de tevgera li dijî dagirkeriyê, Tevgera Biharê hat damezirandin, Dr. Qasimlo jî bû heval û dostê Dubçekî û bû muxalîfê Yekîtiya Sovyetê.

Dr. Qasimlo û Avabûna Otonomiyê li Başûrê Kurdistanê

Li gorî lênêrîna kurdperwerên rojhelata Kurdistanê, di sala 1970yî de dema ku hikumeta merkezî û desthilatdariya kolonyalist ya Îraqê bi kurdan re peyman çekir û Deklerasyona 11ê Adara 1970yî hate pejirandin, biryar hat dayin ku Îraq jî du neteweyan pêk tete. Wê demê li rojhelata Kurdistanê jî, ji bona xebata rêxistinî ya kurdperwerî derfetên nû derketin holê. Dr. Qasimlo û çend hevalên xwe ji bona ku PDKa Îranê rakin ser piya û tevgera neteweyî li rojhelata Kurdistanê zindî bikin, ji Awrupayê vegeyiran.

Dr. Qasimlo di konferansa 3emîn a partiye de (sala 1971ê) bû endamê Komîteya Navendî û piştî wê jî bû sekreterê giştî yê partiye. Piştî wan salan jî, di hemû kongreyên partiye de, heta şêhidketina xwe wek sekreterê giştî hat hîlbijartin. Wî heta mirina xwe, 18 salan jî partiye re serokatî kir. Di rêxistina partiye û pêşkevtina Tevgera Kurdistanê de rolekî mezin lehîst, bi dinyayê û bi taybetî jî bi welatên Awrupayê re pêwendîyeke xurt pêk anî. Di şertên gelek zehmet yê Îranê de xebata xwe domand.

Dr. Qasimlo û Mamostayiya Wî ya li Parîsê

Dr. Qasimlo, ji sala 1976an heta sala 1978an di beşa ziman û bajarvaniya kurdan de, li Parîsê di zanîngeha Sorbonê de mamoste bû. Wî heman demê di gelek rojname û kovarên Awrupayê de, di derheqê pîrsa kurd û Kurdistanê, jiyana siyasî, dîrokî, civakî ya kurdan de nivîsand; pîrsa kurd û Kurdistanê bi reya giştî ya Awrupayê da nasandin.

Dr. Qasimlo li Awrupayê wek pis-porekî mesela kurd û Kurdistanê, wek serkaniyeke pîrsa kurd û Kurdistanê dihate naskirin.

Dr. Qasimlo, di sala 1979an de dema ku li Îranê desthilatdarî hat guhertin, Mihemed Rîza Şah Pehlewî ji Îranê reviya, ew jî vegeriya rojhelata Kurdistanê. Li Kurdistanê bi aşkerayî xebata partîtiyê kir. Li rojhelatê Kurdistanê xebata xwe ya rêxistinî û siyasî bi berfirehî meşand. Tê zanîn ku piştî serhildana gelên Îranê li hemberî dîktatoriya Şah, Kurdistan jî azad bû û li Kurdistanê desthilatdarî kete destê partî û rêxistinên Kurdistanî.

Piştî ku desthilatdariya Şah hat rûxandin û desthilatdariya nû kete destê hêza Îslamî, gelên Îranê li bende bûn ku desthilatdariya Xumeynî ku ew jî, ji Parîsê vegeriya bû û bi Qasimlo ve xwediyê pêwendiyê xurt bû, dê li Îranê reforma siyasî û civakî pêk bîne û demokrasîyê ava bike. Li Kurdistanê jî Hûkmê Zatî (Otonomîyê) qebûl bike. Li gor vê rewşa nû, dê neteweya kurd, faris, belucî, azerî, ereb Îranê hevmişterek

Dr. Qasimlo: Serokekî Demokrasiya Civakî û

bi rê ve bibin. Hezar mixabin wusa nebû. Xumeynî û hevalên wî li cîyê dîktatoriya Şah, dîktatoriya xwe ya îslamî ava kirin. Nexwestin ku li Îranê guhartineke demokratîk bikin, mafên gelan û mafê gelê kurd nas bikin.

Lê Kurdistan defacto azad bûbû. Kurdistan di bin desthilatdariya Komeleyê û PDKa Îranê de bû, gelê kurd piştî serhildana Simkoyê Şîkakî (1920-1930), avabûna Komara Kurdistanê ya Mehabadê (1946), careke din tahma azadiyê girtibû. Kurdan, nedixwestin ku dev ji azadiya xwe û ji desthilatdariya xwe berdin.

PDK a Îranê, Komeleyê, Şêx Îzzeddîn Huseynî, ji bona ku li Îranê demokrasî û li Kurdistanê otonomî ava bibe, bi desthilatdariya merkezî ya Xumeynî re gelek caran danûstandin kirin, ji bona çareserkirina pîrsgirêkan hewildaneke gelek bi hêz nîşan dan, hezar mixabin ev hewildanan encam neda. Desthilatdariya merkezî ya Xumeynî statuya heyî ya ku gelek bi xwezayî ava bibû, xwestin ku ji holê rakin û li Kurdistanê jî desthilatdarî û hegemonyaya xwe ava bikin. Ji bona vê, dewletê biryar da ku bi hemû hêzên xwe ve êrîşê Kurdistanê, serokatî û hêzên Kurdistanî bike.

Xumeynî ku xwe wek rêberê cîhana îslamê dida nasandin, di 19ê Tebaxa 1979an de li dijî Kurdistanê şer û cîhad îlan kir. Piştî cîhada Xumeynî kurd wek kafir û dijberên şoreş û dînê îslamê hatin nîşandan. Hêzên şoreşa îslamî ya Xumeynî, êrîşên xwe wek çaxa Moxolan ku li ser gelên Rojhelata Navîn pêk hatibû, li dijî kurdan û şoreşa gelê Kurdistanê jî dest pê kirin. Zulm û zordariyeke gelek xerab,

nemirovane û xeyrî Îslamî dest pê kir. Her roj bi dehan kurd hatin kuştin û hatin daleqandin. Hemû hepisxaneyên Îranê bûn mala welatparêz û şoreşgerên Kurdistanê. Hemû Kurdistan bû zindaneke mezin.

Piştî ku Komara Îslamî bi hemû hêzên xwe û bi hemû awayên nemirovane dest bi êrîşan û şerî kir, PDKa Îranê, Komeleyê, Şêx Îzzeddîn Huseynî biryar dan ku gelê kurd û Kurdistanê biparêzin. Di encama vê biryara hevpar de li hemû dever û herêmên Kurdistanê şerê pêşmergeatî dest pê kir. Di demeke kurt de li hemberî hêzên Şoreşa Îslamî serkeftî bûn û gelek herêmên Kurdistanê hatin azad kirin û li wan herêman desthilatdariya kurd hate avakirin. Şerê gelê rojhelata Kurdistanê, di demeke kurt de li dinyayê jî deng da û giraniyeke sîyasî çêkir.

Du sedemên bingehîn hebûn ku şerê kurdên rojhelata Kurdistanê anî rojeva navneteweyî. Sedemek, şexsiyeta Dr. Qasimlo ya navneteweyî bû. Sedemê duyem jî, qerektera rejîma Xumeynî ya îslamî bû ku li dijî Awrupayê, DYAyê û Yekîtiya Sovyetê bû.

Rastî û Şaşîyeke Esasî yê

Dr. Qasimlo:

Îlan Nekirina Dewletê

Dr. Qasimlo piştî danûstandinan dît ku Komara Îslamî dê mafê gelê Kurdistanê qebûl nake, dê li Îranê demokrasiya û li Kurdistanê jî otonomîyê ava nake û dê dest bi êrîşên leşkerî bike. Ji ber vê pêşbînîyê, ew neke

nav şaşîya desthilatdariya Komara Kurdistanê ya Mehabadê, haziriya xwe kir ku li hemberî rejîma Xumeynî şer bike, gelê kurd û Kurdistanê biparêze. Di vê helwesta wî de YNK jî bû alîkar. Dema ku hêzên dewleta Îranê biryar da ku li hemberî gelê Kurdistanê û hêzên welatparêz şer bike, Dr. Qasimlo refleksa serokbûna neteweyekî bindest nîşan da, teslîmê rejîma Xumeynî nebû û biryar da ku li hemberî Komara Îslamî şer bike. Ji ber vê helwest û refleksa wî ya neteweyî, Komela û hêzên kurdperwer ên din jî ji wî re bûn alîkar.

Lê hezar mixabin, piştî ev refleksa wî ya serokbûnê, li gorî baweriya min jî wî helwesteka serokatîyeke din dihat xwestin. Piştî ku di navbeyna Komara Îslamî û gelê Kurdistanê de şer dest pê kir, di demeke kurt de gelek herêmên Kurdistanê dişa azad bûn û desthilatdariya kurdan ava bû: Hêzên kurdperwer, bi vê yekê nîşan dan ku ew hêzên xurt in, ew li hemberî Komara Îslamî alternatîfa desthilatdariya neteweyî ya Kurdistanê ne û dişa diyar kirin ku dikarin li Kurdistanê desthilatdar bin, gelê Kurdistanê bi rê ve bibin. Ev performansa hêz û rêxistinên Kurdistanê ji bo dinyayê gelek girîng bû. Dinya di encama vê performansê de, li hêviya helwestek û biryareke din ya girîng bûn. Ev helwest û biryara jî, îlankirina dewleta Kurdistanê bû.

Ji bona vê du sedemên girîng hebûn. Sedemê yekem, taybetiya rejîma Komara Îslamî û Xumeynî bû. Komara Îslamî dixwest ku hemû cîhana îslamî bixe bin bandor û

desthilatdariya xwe, împaratoriyeke îslamî ava bike. Bi vê împaratoriya îslamî jî, li dijî rojavayê Awrupayê, Amerîkayê û Yekîtiya Sovyetê şer bike. Lewra rejîma Xumeynî ji derveyî xwe dijmînê her dewlet û her kesekî bû. Di navbeyna Îran û Îraqê de jî şer hebû. Komara Îslamî, li dinyaya demokratîk jî û li dinyaya sosyalîst jî xwediyê meş-ruyetek nebû. Sedema duyem jî, navneteweyîbûna Dr. Qasimlo bû; ji vê girîngtir jî, Dr. Qasimlo wek serok jî dostekî Awrupayê bû û serokekî awrupayî bû.

Hezar mixabin Dr. Qasimlo di vê pîrsê de taybetiyeke serokatiyê nîşan neda. Ev jî bû sedem ku di nav pêvajoyê de gelê Kurdistanê û ew bi xwe jî wenda bike, Komara Îslamî qezenc bike.

Eger Dr. Qasimlo dewletbûna Kurdistanê îlan bikira, li dinyayê nasandina vê dewletê hêsan dibû.

Ez dikarim bibêjim ku dinyayê jî derfetek wenda kir. Wê demê pîrsa Komara Îslamî çareserkerin hêsanîr bû û ew jî bi rêya Kurdistanê dibû. Lê dinyayê vê derfetê baş bi kar neanî. Ji bona vê, piştî 30 salan jî dinya hîn bi Îranê re mijûl dibe û Komara Îslamî xeteriya xwe li Rojhilata Navîn û li dinyayê didomîne.

Dr. Qasimlo: Çar Bûyerên Dîrokî yên Nexweş û Tehl

Ez baş dizanim ku ev dema dawîyê di jiyana wî de çar bûyeran ew gelek êşand.

Bûyera yekem: Di Kongreya 4emîn a PDKa Îranê de parçebûna

partiyê û helwesta ew hevalên wî yên veqetî bûn. PDKa Îranê di sala 1982an de parçe bû. Kadro û berpirsiyarên partî yên bi navûdeng ji partiyê veqetiyên. Xwe bi navê Gruba Kongreya 4an dan nasîn. Ji vê grubê re Ganî Bilûryan û M. Emîn Saracî serokatî dikir. Ganî Bilûryan serokekî partiyê bi navûdeng bû, daîma li Kurdistanê mabû û 15 salan jî di hepsê de jiyana xwe bi serbilindî meşandibû. M. Emîn Saracî jî li Bulgarîstanê jiyana xwe domandibû. Gruba Kongreya 4an, nêzikî TUDEHê bû û TUDEH jî bi rejîma Xumeynî re di nav danûstandin û tifaqê de bû. Gruba Kongreya 4an piştî demekê bi rejîmê re bû yek û êrişî PDKa Îranêkir. Vê bûyerê Dr. Qasimlo gelek êşand.

Bûyera duyemîn: Di sala 1982an de rejîma Îranê û Îraqê ji bona ku di navbeyna hêzên başûrê Kurdistanê û rojhelata Kurdistanê de nakokî û dijminatî pêk bînin, gorna Barzanî ji aliyê hêzên dewleta Îraqê û yan jî Îranê ve vebû. PDKa Îranê û serokê wî Dr. Qasimlo, vê bûyera bi xurtî telîn û protesto kirin. Lê ev telîn û protestoya PDKa Îranê û Dr. Qasimlo, PDKa Îraqê qane nekir. PDKa Îraqê, Pasdaran û Gruba Kongreya 4an bi hev re êrişê PDKa Îranê û Komeleyê kirin. Gelek herêmên azad yên Kurdistanê piştî vê êrişê ketin destê Komara Îslamî.

Vê bûyerê bi tevayî gelê kurd xemgîn kir û lê ez baş dizanim ku Dr. Qasimlo xemgîntir kir. Piştî vê bûyerê, carekê hevdîtina me çêbû. Ew acizî û nerehetiya wî bi her awayî diyar dibû.

Ev bûyera di dîroka Kurdistanê de bûyereke gelek nexweş bû û nedihat pejirandin. Me wek Ala Rizgarî biryar dabû ku bi PDKa Îraqê re hevdtin bikin û eleqatê deynin, di çarçewa peymanekê de li hevûdu bikin. Hezar mixabin piştî vê bûyera nexweş û tehl me dev ji vê pêwendiyê berda.

Bûyera sêyem: Dr. Qasimlo di-xwest ku bi hemû hêzên başûrê Kurdistanê re xwediye pêwendiyê be. Lê zêdetir bi PDKa Îraqê re xwediye pêwendîyeke dîrokî bûn. Digel vê yekê, di sala 1968an de dema ku Komîteya Şoreşger a PDKa Îranê wek grubeke muxalefet li herêma Serdeştê dest bi şerê pêşmergati kiribû, di navbeyna PDKa Îraqê û wan de bûyerên nexweş derbas bibûn. Komele jî li ser mîrasa vê grubê ava bû. YNKê û Mam Celal jî bi Komeleyê re di nav pêwendîyeke stratejîk de bû. Dr. Qasimlo di wê nerîn û baweriyê de bû ku Komele bi destê YNKê û Mam Celal avabûye. Dr. Qasimlo ev yeka wek midaxeleyekê dinirxand û şirove dikir. Vê yekê ew gelek diêşand.

Bûyera çarem: Herêma Qesima Reş di nav sînor û axa rojhelatê Kurdistanê de ye. Ev herêma, herêmeke gumrugê bû. Ev herêm jî aliyê YNKê ve dihat bikaranîn. Piştî ku li rojhelatê Kurdistanê şerê pêşmergati dest pê kir û hêzên rojhelatê Kurdistanê û bi taybetî jî PDKa Îranê hewcedarê Qesima Reş bûn, ji YNKê daxwaz kirin ku dev ji Qesima Reş berdin.

YNKê dev jê ber neda. Ev bûyera bû sedem ku pêşmergeyên YNKê û PDKa Îranê bên hemberî hev û şer bikin.

Ev bûyer bi xwe, bes ji aliyê herdu hêzan de ne, ji aliyê hemû Kurdistan û statuya Kurdistanê de gelek rastiyan destnîşan dike. Lê ez bi kûranî naxwazim vê pirsê şirove bikim. Lewra ew ne mijara vê nivîsê ye.

Pêwendiya Wî ya bi Îraqê re

Rastiyeke vekirî ya Kurdistanê heye ku dema li Kurdistanê şerê pêşmergati bête meşandin, an jî ji bona şerê pêşmergati hazirî bête kirin, bi dewletên cîran re danûstandin û eleqe, ji wan alîkarî girtin pêwîst e. Ev dewletên ku tevgera Kurdistanê jê alîkarî bigrin jî, dewletên kolonyalist ên dagirkerên Kurdistanê nin.

Ev yeka rastiyeke din derdixe holê, dema ku dewleteke kolonyalist ji Tevgerên Kurdistanê re alîkarî kir, li gor hesabên xwe yên li ser neteweya kurd vê yekê pêk tîne. Fw dewletan dixwazin ku di navbeyna hêzên Kurdistanê de nakokî û şer hebe. Dema ku em li pêvajoya pêwendiyên Tevgera Kurdistanê û dewletên kolonyalist mêze bikin, ew nexweşî û tehlî û realîte xuya dibe.

Pêwendiyên PDKa Îranê û Dr. Qasimlo jî bi Îraqê re hebûn. Dr. Qasimlo di van pêwendiyên xwe de xwediye prensîb bû. Bi ev pêwendiyên xwe tû dem zerar neda tevgera başûrê Kurdistanê. Ji bona vê jî, li Îraqê jîyaneka dirêj nedomand. Demên pêwîst li Îraqê dima û karên xwe dimeşand.

Pêwendiyên Wî yên bi Hêzên Kurdistanî û PKKê re

PDKa Îranê û Dr. Qasimlo di pêwendiyên xwe de xwediyê prensîb bû û bi her rêxistinek Kurdistanê re nedida û nedistan. Pêwendiyên wî zêdetir bi rêxistinên neradîqal re hebû. Ji bona vê bi rêxistinên bakurê Kurdistanê (PSK xarîç) re pêwendiyên wî ne xurt bûn. Bi taybetî jî bi PKKê re hîç pêwendî pêk neanî. Ew mecbur bibû ku ji wan re bibe alîkar. Piştî demeke kurt jî rastiya vê helwesta wî derket ku çima bi PKKê re danûstandin nake. Lewra PKK pişt re bi hêzên dewleta farisan re bû yek û êrîş bir ser PDKa Îranê. Di vê merheleyê de jî, PKK li rojhelata Kurdistanê pirs-girêkeka gelek mezin e û PKK rasterast midaxeleyê te'gera rojhelata Kurdistanê dike.

Qereqtera Serokatî û Awayê Siyaseta Wî

Baş tê zanîn ku çend kategorî serok û serokatî hene. Dr. Qasimlo, wek kategorî di nav rêza kategoriya serokên demokrat û hevdem de bû. Lê aliyê wî yên kevnêşopî jî hebûn. Dema ku dihat Kurdistanê çanda welatên sêyemîn û Rohhilata Navîn li ser wî jî tesîr dikir.

Dr. Qasimlo, sosyalîst bû, lê ne stalînîst bû. Di nav partiyê de pîvanên demokrasiyê bi giştî be jî pêk dianî. Ew dostê sosyal demokratên Awrûpayê bû. Ji bona vê jî partiya wî di Enternasyonala Sosyalîst de çavdêr bû. Heger Dr. Qasimlo sax bûya îro, wek

Dr. Qasimlo: Serokekî Demokrasiya Civakî û

YNKê partiya wî jî dê bibûya endamê Enternasyonala Sosyalîst.

Dr. Qasimlo ew taybetîya xwe ya demokrat û hevdem, bi projeya xwe ya navenda PDKa Îranê gelek vekirî dîyar dikir. Navenda (Baregahê) PDK a Îranê, ji çekên giran hatibû xalîkirin. Dema ku mêvan diçûn nevanda Partiyê, diviya bû ku bê çek biçin nevandê.

Dr. Qasimlo ji bona Otonomiya Kurdistanê demokrasiyeke xurt pêwîst didît. Dr. Qasimlo digot:

"Bawerîyekî me ya tewaw bi rolê bingehîn yê demokrasiyê heye. Bê hebûna demokrasiyeke cihgir û qayîm, di Îranê de Otonomiya Kurdistanê dê her gav di bin tirs û givaşa ji nav çûnê de be. Tenê rêya cihgîrbûn û berdewambûna Otonomiya Kurdistanê, di Îranê de bi hebûna demokrasiyeke tewaw û serkevtî mimkun e."

Dr. Qasimlo û partiya wî bi demokrasiyê bawer dikir. Dr. Qasimlo, di derheqê vê pîrsê de digot:

"Di Kurdistanê û di nav Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê de, bawerîyekî me ya zexm û kûr bi demokrasiyê heye û em her wisan li ser wê bawerîyê ne ku bê destvehanîn û cihgîrbûna azadiyên demokratîk, welatê me nikare wan pîrs û kêşeyên aloz çareser û safî biket ku em ji mêj ve ji dest wan dinaline."

Dr. Qasimlo li dijî terorîzmê bû û ji bona vê jî demokrasiyê diparast. Ji ber vê bi PKKê re pêwendî pêk neanî. Dr. Qasimlo digot:

"Bi baweriya min tevgerên xwedî hêz, yanî ev ên ku ji bo azadiyê dixebitin û ji aliyê xelkê ve piştevanî ji wan re tête kirin, nabe penahî bibine ber terorîzmê, ji ber ku çi hewcedarîyeka wan bi terorîzmê nîne. Terorîzm, azadî û jîna xelkê sîvîl û bêguneh tevî tirsê berengar dike û tenahiye têk dide. Terorîzm, siyaseta fermî ya Komara Îslamî ye û berpirsên wê di salên borî de ev çende bi eyanî ragihandin û heta çend caran bi dijî me bikar anîne, lê em terorîzmê mehkûm û şermezar dikin."

Wî çi digot ew dîkir. Ev jî taybetîya serokên hevdem û demokrat in. Di siyaseta wî de durûtî tune bû. Li hemberî te çi bigot, ewê jî dîkir. Ne ew kes bû ku wek hinekan li pişt derîyan Kurdistan serbixwe biparêze, li ber derîyan jî ji bona ku ji dewletan re şêrîn xuya bibe, otonomîyê biparêze.

Dr. Qasimlo her demê dubare dîkir û digot:

"Siyaset wek huner e. Lê xala jar û qels a tevgera kurdî eva bûye ku hetanî nûha yan hemû tiştek xwestiye yan çi tiştek, lewra siyaseta ne reş û sipî ye, belkî di navbera reş û sipî de rengê din jî hene."

Bi baweriya Dr. Qasimlo, di navbeyna hêvîyan û siyaseta realîst de ferqeke mezin heye. Lewra pêwendîya siyaseta bi rastî û heqîqetên hundirîn, herêmî û cihanî ve heye.

Dr. Qasimlo di siyaseta de biryardana serbixwe gelek girîng didît. Wî bawer dîkir ku "divêt em di berahiyê de girîngiyê bi hêjayîyê bê dawî yê gelê kurd bidin û bi xwe û bi xebata xwe piştrast bin û xwe wek

Komara Kurd a Mehabadê hatiye damezrandin, gelo tesîra tevgera Nehrî, di amadekirina zemîna wê de tune ye?

Malbata Nehriyan jî Malbata Paloyîyan jî, mîna malbatên pêşeng ên vî gelî, ji zemanê berê ve serî dane ser rêka azadiya vî gelî.

Nameya Şêx Ubeydullah Ku Ji Dr. Kohran Re Şandiye:

Gelê kurd ku zêdetirî 500 000 malbatî ye, neteweyeke cihê ye. Ola wan cihê, edet û kevneşopiyên wan xweserî wan in. Lewre ji aliyê gelên din ve, bi awayekî nebaş tîr naskirin. Kurdistanê weha lanse dikin. Heke ji nav me, yekî nebaşiyek kiribe, unwana nebaş, li bi hezaran mirovên me datînin. Gelo hûn dizanin ku ev hemû, pêkanîna caniyane yên îqtîdarên tirk û îranî ne? Çimkî Kurdistan, di navbera van her du dewletan de ye û ev her du dewlet jî, bi behaneyên xwe, naxwazin ku baş û nebaşan ji hev cihê bikin...¹⁰

⁹ Pirtûka Prof. Dr. Celîlê Celîl, r: 80

¹⁰ Prof. Dr. Celîlê Celîl, 1880 Şeyh Ubeydullah Nehrî Kürt Ayaklanması, Wş. Pêrî, 1998 İstanbul, r: 129

Şêx Evdirehmanê Garisî*

Celadet Alî Bedir Xan

*Hişyarîya me ji her sê şêran
Xanî û Seîd û Evdirehman
Hurmiz wekî hevriyan çu caran
Nakit te di nav gunehkaran*

B. Feridûn

Şîn ... şîn ... şîn... her der reş ne ma heşîn, dil bikul, can bikeser; çav bi girîn.

Bang dan, Şêx Evdirehmanê Garisî ne ma, hatibû xêre, çû rehmîetê ...

Herê Şêx Evdirehmanê Garisî, ruhniya çavên Kurdistanê, germiya dilên kurdên qenc, bi du berikên bêbext dest ji me kişand û çû. Bû şehîdê dîn û mîletê xwe, qurbana armanca xwe.

Herê bi bêbextî hate kuştin. Ji xwe wekî din kuştina wî nîn bû. Bi mêranî ne dihate kuştin. Li pey wî gelek gerîha bûn. Ew mêrên qenc peyda ne dibûn, ne dihatin dîtin ko bikevin pêşîya wî, dor lê bigirin, pê biberizin û wî bikujin.

Herê, ji kuştina wî re an bêbextî an berikekî xêlkî divîya bû.

An ne wek mirovekî adetî di nav nivîna xwe de dê bimiriyaya.

Mirina di nav cihan, ne mirina wî bû. Heyfa xwedê jî jê re dihat, pê qaîl ne dibû ko ev mêrê bi her tiştê xwe bi dîn, bi zanîn, bi destê xwe qenc, di nav cihan de wek mirovekî adetî bi bayê an bi tayê biêşînit û di pey re qasidê xwe verêkit û emanetê xwe jê bistînit. Evdirehman ne steliha bû.

Jê re qatîlek ji nav malê, golikê malê divîya bû ko bê tirs û lertz bikeve bin paşîla wî, here destên wî û welê wî bide ber tîfing û xencerê.

Heke dar xirab dibe kurmê wê jê ye. Ji xwe kurmê darê ji darê mebit dar tu car xirab nabit.

Welê jî bû. Dinya li Şêxê me bû hêvar. Roj çûbû ava, hevalên wî jê dîrketibûn, ew bi xulamekî xwe ve di nîzingî gundekî de li hêvîya qasidekî dima.

* HAWAR, hejmar: 11, pêncşema 10ê Çirîya Paşîn 1932

Hingûra şevê dest bi ketinê kiribû. Dema nimêjî jî hatî bû. Di ber wan re avekî diherikî. Şêxê delal xwe vemalt, tîfinga xwe da xulamê xwe, ket pêşîyê ber bi avê ve diçû.

Xulamê wî jî par re, ew da ber tîfingê. Derb lê ket, Şêx li xencera xwe xebitî û lê zivirî, derbeke din singa wî qul kir.

Xulam, yekî Sêrtî bi navê Necmo, serê Şêxê xwe bi xencera wî jêkir û bir dijminan. Herê bi xencera Şêxê xwe, ji ber ko ya xwe di singa wî ra kiribû.

Necmo hate xelatkirin, em jî pê re. Hewranîyekî reş bû xelata me.

Herê bang dan Şêx Evdirehamn ne ma, ji bona xidmeta miletê xwe za bû, ji bona wê jî mir.

Nizanim ezê çawan bikarim wesf û û pesnê wî bidim.

Şêx Evdirehman ji wan mirovan bû ko dîyên dinyayê kêr di zikên xwe de gerandine.

Şêx bû, mela bû, seyda bû, mêr û mêrxas bû.

Şêx bû, xwedan terîqet, mirîdên wî lê wek pêxemberekî dinihêrtin.

Mela û seyda bû. Di mezhebê Şafiyê de zanakî zor bû. Îslamiyet weke xwe nas dikir û dida nas kirin. Jê ne mûwek kêr dikir, ne jî wek mela-yên din, ji bona veşartina nezaniyên xwe û şêlandina xelkî, lê zêde dikir.

Her çend mirovê axîretê bû, ew çend jî mirovê dinyayê, mirovê nûwînî û pêşkevî bû. Nav di xelkî dida ko bixwînî, her tiştî hîn bibin. Piraniya feqehên wî bi herfên latînî jî dizanî bûn.

Carkê min jê pirsî bû, heke ji nivîsandina zimanê me bi herfên latînî jî aliyê şerîetê ve tu manî heye. Rûwê wî yê delal û bi nûr, bi devkenekê zelal bû û li min vegerand;

- Ma çîre hebît, xwedê emr û nehyên xwe ji me re ne bi herf û şiklan, lê bi qiseyê daye zanîn. Ji xwe şiklên herfên Qurana pêşîn ne ji şiklên îro bûn. Ji lewra mîrê min, te ko xwendîye û dinya dîtîye, seh bike û ji me re herfinên welê bibijêre ko mîletê me zûka hînê xwendîne bibit. Fetwa bi min re ye.

Min got mêr û mêrxas bû, Herçî mesela Berwarê seh kirine qenc dizanin, ew Şêxê delal çî mîrekî zor bû. Bi deh û panzdeh xulamên xwe ve qeza Berwarî rakiribû. Wekê xwe dida ber kevîrê, sed zilamên qenc nikarî bûn çepera wî rakin.

Berî sê salan gava me dabû çîyayên Hevêrkan, li xwe ne danîbû suwar bibe, xwe vemalt, du rextên xwe havêtin stowê xwe, tîfing bi milê wî ve, bi pêncîh û çend salên xwe, wek xortekî bîst salî dabû kaş û şeharan.

Peyayên sist pê xurt dibûn, xelk pê disekinîn.

Şêx Evdirehman kitêbek, kitêbeke mezin bipîvan bû. Lê sed heyf û mixabin, li ber nisxeyeke din nehate nivîsandin.

Li ser Kurdistanê te her çî jê bixwesta nik wî peyda dibûn. Dîroka eşîran, mêjvemayên mîletê kurd...

Di nav Kurdistanê de zahf geriha bû. Nemaze halê welatê Botan ecêb dizanî bû. Dikarî bû bibêje ser û binê her berê Botan ji çî rengî ne. Ser hakim û mîrekên Botan çîroknên nebihîstî dizanî bûn.

Belê Şêxê min tu mirovekî holê bûyî, lê îro tu çûyî û destên me ji te bûne. Nizanim heyfa min ji kê re bêt. Ji te re an ji me re. Tu çûyî rehmêtê, em hiştin di nav derd û şînê de.

Xelk dê bibêjin: Şêx Evdirehman çû, kelaşê wî di çolê de ma. Herê mala xwe guhest, bêt tirb û gorn, bêt rêç û şop, warkor çû....

No kurdino, ne kurdino! yarino! neyarino! dostino, dijminino! Evdirehman bi tirb û gorn û xwedan war çû.

Lê veşartina wî ji wek mirin û kuştina wî ne bi awakî adetî, lê bi awakî din, bi awakî welê bû ko heta niho nenas û neçêkirî....

Belê Şêxê min, min ji te re reke-fenekî welê bijart ko hêj tu kelaş pê nehatiye pêçandin, min ji te re tirbeke welê koland ko hîn tu mirî ne ketinê.

Min kefenê te kir: Sor, sipî û kesk û zer, ala te, û min tu veşartî nav rûpelên Hawarê û li serê wî kêla te daçikan.

Kefenê te kefenekî welê ye, rojkî bêt, ji te vebit û li ser kelat û bajarên welatê te re li pêl bibit.

Tirba te tirbeke welê ye ko ne kêla wê bi birûskên ezmanî dişike, ne cax û diwarên wî bi ba û bagerê hildiweşe, ne axa wê bi baran û lehîyê kul dibe û ji hev dikeve.

Tirba te kitêbek e, ko nîşên mîletê me destê-desta bikin û her nîş ji nîşê din re heta paşîyê, hinda roja qîyametê, ji hevdu re dê bispêrîa.

Ew tirba te a abadîn e. Min eva ha ji bona te bijart û koland.

Lê te tirbeka din ji heye ko tu bi

xwe bê hemdê xwe û bê hemdê min hatî û ketî navê.

Ew ji dilê min, dilê min ê jar û biderd e. Lê bi hevîn û hejkirina te ew çend xurt e ko bikare laşê min û kelaşê te heya paşîya emrê min hilgire û me her du heta hingî bi xwedî bike....

Şêxê min bi pêncih û çend salên xwe ve wek zarokekî ko di paşila dêya xwe de dimirî, bêt ax, bêt nalîn û zarîn, bêt teq û req û teşxele.

Belê tu diçûyî û bi te nedihesyan, bîr ne dibirin. Ji xwe bi te bihesyana kengê ew destê bêbext ê bêşerm li te radibû.

Bigrî Kurdistanê bigrî, bigrî Botan bigrî, bigrî Garisî bigrî, bigrî Gozgehê bigrî.

Keç û bûkên Kurdistanê gulîyên xwe kur bikin, xwelî li serê xwe bikin, reşa xwe girêdin, şîn.... şîn bikin, bi ax û zarînê bigirin.

Tu ji mîro bigrî, bikeve pêşîya hemîyan bigrî û binal.

Şêx Evdirehman ji kîsê hemîyan çû, lê nemaze ji kîsê te çû. Bîne bîra xwe, wekê bi Şêxê xwe re rûdiniştî çawan li te fedikirî, wusan çavên wî bi hej û hevînê tu himbêz dikirî...

Ey axa Kurdistanê, welatê Botan, eşîra Garisan halanan di xwe bidin, pesnê xwe bidin, fortan û zirtan bikin û bibêjin:

Evdirehman ji ax û toza min hatibû pê....

Evdirehman ji heşînahîya çîyayên min belgîh girtibû

Evdirehman di bin konê min da rabû bû....

Tu jî Hawarê, pesnê xwe bide û bêje:

Tirba Şêx Evdirehman di min da ye, min ew vaşartiye nav rûpelên xwe, kêla wî daçikandîye raserî xwe.

Ey erd ji min bidexise ko min ew şehîdê dîn û mîlet ji te re ne hişt û nekir para te....

Şîn... şîn şîn her der reş ne ma heşîn. Dil bikul, can bikeser, çav bigirîn.

Bang dan, Şêx Evdirehmanê Garisî ne ma, hatibû xêrê çû rehmetê...

Şêxê min, welê dixuye, te bêriya me kiriye. Ji xwe me jî... Emê hevdu bibînin jî... Lê nîzanim kengê? Rêya te rêya me ye jî. Emê bigehîne te, di neqebê re ko tu çûyî. Heke em xwe nalezînin ne ji wê ye ko destê me ji dinyayê nabît. Destê me ji karê ko em bi hev re pê dixebitîn, nabit. Ji xwe xebata me bi sebata me pêş ve diçe.

Şêxê min tu ketî xewna Ferîdûn. Ferîdûn kurdekî hêja ye. Sezayî zîyareta te ye. Xwezî bi wî. Tê jê re got, ji te re şînnameyek binivîsînît, navê te hildit. Ewî jî kir, navê te hilda, wesfê te da, te ji bîra deranî, anî bîra. No, tu ne anî bîra, ji ber ku tu her gav dibîra de

yî. Em nikarî te ji bîr bikin, me dil hebe jî. Ji ber ko tu xwe bi xwe, xwe bi me didî hesandin, em bi kêmaniya te dihesin. Belê tu di laş û canê kurdaniyê de lebatek bûyî. laşê me, laşê her tiştî ji lebatên ji hev cihê hevedudanî ye. Û laş hewcedarî her lebatê xwe ye. Tu lebat jê re ne bêkêr in, û tu lebat nikare bikeve şûna lebatekî din. Ji lewra lebatê birî şûna xwe vala dihêle. Tu çûyî ji laşê me, ji laşê heyîna me hatî birîn. Laş hewcedarî te ye. Di mehcetê de destê xwe dibe şûna te, tu nînî. Bi neyîna te dihesê, liber te dikeve. Ji lewra Şêxê min, em nikarin te ji bîr bikin. Ji ber ko şûna te vala, şop û rêça te a bixwîn, weke xwe ye.

Şêxê min, em dibêjin tu mirîyî, tu mirî yî. Lê di rastiye de tu bi xwe jîyîn î, jîyîn tu bi xwe yî. Tu ji bona Kurdistanê mirî. Kurdistan heyînek e. Ji payedarbûna heyînekê re jîyînek divêt. Jîyîn bi xwe, bi mirinê tête pê. Tu mirî, tu bûyî û tuyê ji Kurdistanê re bibî jîyîn. Jîyîneke welê ko tenê bi Kurdistanê, bi ax û dar û kevir û mîletê wê re dê vemirît.

Şêxê min, heye ko te dil kiribe, em navê te di rûpelên Hawarê de hildin. Tu neketî xewa min. Lê ez bi vê daxwaza te hesiyam. Min şihra Bêriya Botan berê du salan nivîsand û pêşkêşî gîyanê te kiribû. Gava şihra Ferîdûn gîhabû destê min, Bêriya Botan, digel navê te, ji xwe ketibû rûpelên Hawarê. Bi vê rasthatinê dilê min şa ye, xwedê gîyanê te ê bihuştin jî şa bikit.

“Şîna Şêx Evdîrehmanê Garisî

Yaro tu here çiyayê jorîn
Pîrsê bike kanî Şêxê şêrîn
Çilmisîne gul bi hêstirên zer
Geştir bigerîn ji rûyê dîlber
Çavê xwe bi ruhî ke ji bînê
Canê xwe xwedî bike bi bihnê
Zêrax e çiyayê tê de tabût
Kevirê wî ji xwînê bûne yaqût
Pûş û çilowên wî sade reyhan
Razaye li ser wî Evdîrehman
Bi navê xweşîya dil û du çava
Roja me ji zû de çûyê ava
Bê hêvî mebe Xwedê kerîm e
Azahîya kurd ne dûr e sihme
Her mîletî bête xwîn rijandin
Nabit di cîhanê bê veşartin.

★

Ava ko tu şuştîye nê ez bîr
Belkî jî da çavê kurdê bêbîr
Qelqel ji te re pelê gula ye
Ronahîya hîv û pêlê ba ye
Gorîn ji te re dilê di xortan
Rûpelê Hawar kûhê Botan
Seyda yî li pêşberê te bilbil
Mîna wî bixwendî tu sorgul
Zarîn û fixan dike li kurdan
Evda vî egîtî ma li erda
Gerçî di çiyê de maye avî
Seyranê dikê l'samayê kovî
Ew cih de bibête rokê bajar
Pertalê wî duht û bûkê tatar
Wêrano çiyao! ev çi av in?
Ev darê bi xemil û xêz û rav in

.....”★

★ Hawar, hejmar: 25, 19yê Tebaxa 1934


Ehmedê XANÎ û Herçar Berhemên Wî

Doç. Dr. Mamoste Qedri

1. BI KURTASÎ JIYANA EHMEDÊ XANÎ Û SERDEMA

Navê wî Ehmed, navê bavê wî Îlyas, navê diya wî Gulnîgar e. Di sala 1650-51an de li Bayezîdê hatiye dinê û di sala 1707an anjî 1709an de li Bayezîdê wefat kiriye. Mexlesên "Xanî", "Mela", "Pepûk" û "Kurdî" bikar anîne. Lê mexlesa ku bêtir bikar aniye "Xanî" ye. Xan hem navê malbata wî ye hem jî navê gundê ku malbata wî lê bicî bûye.

Beriya hezar sal berê navê "Çukurca"yê, ku îro naçeya Hekariyê ye, "Çalê" bûye. Li Çalê ji bo karwanên ku ji hêla Azerbeycanê ve dihatin û bi aliyê Bexda û Şamê ve diçûn xanek hatiye avakirin û li deşta dora vê xanê navê "Deşta Xanê" hatiye dayîn. Paşê li vê deştê li nêzikê xana karwanan gundek bi navê "Xan" hatiye avakirin. Berê



Ehmedê XANÎ

di vî gundî de malbata Xanî, paşê jî eşîrên Pinyanişî û Ertûşî bicî bûne. Lê

demek di pey re gund têra van hersê malbetan nekiriye. Loma berê Pinyanişî û Ertûşî jê derketine, paşê jî malbata Xanî jê koç kirine. Qismek ji Xaniyan bi rêberiya Mîr Hesên çûne Xoşaba Wanê. Niha jî li herêma Xoşabê bi qasî 50 gund hene ku dewama wan in. Piştî wefata Mîr Hesên, kurê wî Mîr Silêman kete şûna wî. Piştî mirina Mîr Silêman, kurê wî Mîr Ebdurezaq ketiye şûna wî. Piştî Mîr Ebdurezaq jî kurê wî Şêx Ebdurehman cihê wî girtiye.

Piştî ku di sedsala X/XVIan de Wan û hawîdorê wê ji aliyê Sefewiyên Îranî ve hatiye îşxalkirin Şêx Ebdurehman digel malbata xwe çûye Bayezîdê û di nav qebîleya Mehmûdiyan de bici bûye û bûye "Qadiyê Kela Sor". Piştî mirina Şêx Ebdurehman di sala 940/1534an de ev wezîfe ji kurê wî yê bi navê Mîr Rustem re hatiye dayîn. Piştî mirina Mîr Rustem, kurê wî Mela İyad bûye mezinê malbata Xaniyan. Piştî Mela İyad jî kurê wî Mela İlyas ketiye şûna wî ku ev zat bavê Ehmedê Xanî ye.

Çawa ku Ehmedê Xanî di dawîya "Mem û Zîn"ê de jî bal dikişîne ser, ew di sala 1061ê koçî (1650-51ê zayînî) de hatiye dinê:

*Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarix-î hezar û gîşt û yek bû*

Xanî piştî wefata bavê xwe li cem birayê xwe yê mezin Mela Qasim dest bi xwendinê kiriye û di Medreseya Muradiyeyê da bi tehsîla ilmê mijûl bûye. Li gor ku Eladîn Secadî dibêje Xanî piştî Bayezîdê ji bo xwendina medreseyê Xelatê, Bedlîsê û Rihayê.

Paşê vegeriya Bayezîdê lê dîsa ji Bayezîdê derketiye çûye Cizîra Botan, ji wir jî derbas bûye çûye Bexdayê û Misrê. Lê wî îcaze li Xoşabê di Medreseya Ataiyeyê de li cem seydayê xwe Mela Camî sendiye.

Xanî piştî temamkirina xwe vegeriya Bayezîdê, li wê derê mizgeft û medreseyek ava kiriye û di vê medreseyê de darsa feqîyan daye. Xanî ji aliyek ve bi dersdanê mijûl bûye ji aliyek ve jî di Dîwana Mîr Muhemmed de katibî kiriye.

Mezhebê Ehmedê Xanî yê fiqhî "Şafîî", mezhebê wî yê baweriyê "Sunnî-Eş'erî", terîqeta wî jî "Neqşbendî" bûye. Bi qasî ku tê zanîn Xanî jî wekî Melayê Cizîrî nezewiciye.

Di sedsala 17an de, ango di serdema Xanî de, şerên di navbera osmaniyan û Sefewiyan de ketibû qonaxek girîng. Van herdu dewletan jî di şerên navbera xwe de welatê kurdan wekî pir û tampon bikar danîn û her tim kurdan zirar didîtin. Xanî di "Mem û Zîn"ê de derbarê van şeran û zirardîtina kurdan de wiha dibêje:

*Ev Rom û Ecem bi wan hesar in
Kurmanc-î hemî li çar kenar in*

*Ev qulzemê Rom û behrê Tacik
Hindî ku bikin xurîc û tehrîk*

*Kurmanc-î dibin bi xwûn mulettx
Wan ji yek ve dikin mîsalê berzex*

Xanî di vê sedsalê de hesreta mîrek mezin ku yekîtiya kurdan pêk bîne kişandiye. Xanî vî mîrê han carina wekî "cîhanpenah", carina wekî "serfiraz", carina wekî "padîşah", carina jî wekî "xwedan" binav dike û hinek tay-

betmendiyên wî jî diyar dike. Li gor Xanî divê ev padîşahê kurdan xwediyê van teybetmendiyên be:

*Sahibkerem (Cuwanmêr, qencîxwaz)
Suxwenewaz (Heskiroxe şê'r û retorîkê)
Xwedîfac (Tac sembola serxwebûnê ye)
Xemxwar (Xwedî şifqet, derdmendê bi derdê gel)*

Xanî li gor xwe sebebê neyekbûna kurdan û nehatina wan a cem hev di bin îdarekî de teşxîs kiriye ku ew jî hevnegirtina kurdan û bêtifaqiya wan e. Eger tifaqa wan hebûya ewê rewşa wan çawa bûya? Em bersiva vê pirsê ji Xanî bibihîsin:

*Ger dê hebuwa me ittifaqek
Vêkra bikra me înqiyadek*

*Tekmîl-î fikir me dîn û dewlet
Teshîl-î fikir me 'ilm û hîkmet*

*Rom û 'ereb û 'ecem temamî
Hemyan ji me ra fikir xulamî*

2. HERÇAR BERHEMÊN EHMEDÊ XANÎ

Li ser hejmara berhemên Xanî hinek nîqaş hene. Lê çar hebên ku tu nîqaş tune ye ku ew xwemalê Xanî ne. Ew herçar berhem ev in: "Nûbehara Biçûkan", "Eqîdeya Îmanê", "Mem û Zîn", "Dîwan". Xanî digel ku 'erebî û farisî û tirkî jî baş zanibûye wî di nivîsandina berhemên xwe de zimanê xwe yê zikmakî tercîh kiriye. Ango çawa ku ew jî dibêje, wî di şûna zimanên 'erebî û tirkî û farisî yên ku mîna şeraba safî birûmet bûne de zimanê kurdî yê ku wekî telpa ser av û şerabê bûye bikar

aniye. Belê Xanî wiha dibêje

*Saft şemirand vexwarî durdî
Manendê durrê Lîsanê kurdî*

*Înaye nîzam û întîzame
Kêşaye cefa ji bo 'amê*

*Çibkim ku qewî kesad e bazar
Nînin ji qumaş-î ra xerîdar*

Li gor Xanî sebebê kesadbûna bazara ziman û edebiyata kurdî tunebûna hukumdarek kurd ku xwedî li vî ziman û edebiyatê derkeve ye. Nexwe divê hukumdarek kurdan jî hebe, ev hukumdar xwedî li ziman û edebiyata kurdî derkeve, morek vî hukumdarî ya fermî hebe û ew bi vê mora xwe zimanê kurdî tesdîq bike. Heta ev hukumdar û ev mor tunebe ev ziman jî rûmet û piyaseyê nabîne. Belê, Xanî di vî warî de di du beytên *Mem û Zînê* de wiha dibêje:

*Ger dê hebuwa me serfirazek
Sahibkeremek suxen newazek*

*Neqde me dibû bi şîkke meskûk
Nedma wehe bêrewac û meşkûk*

Piştî vê destpêka kurt em dikarin derbasê tehlîla herçar berhemên Xanî bibin û ji *Nûbehara Biçûkan* dest pê bikin.

2. 1. Nûbehara Biçûkan

Nûbehar wekî ferhengek 'erebî-kurdî tê naskirin. Lê di gelek cihan de bêje û term wekî kurdî-'erebî jî hatine rêzkirin. Loma em dikarin bibêjin ku ferheng di heman demê de kurdî-'erebî ye jî. Di sala 1683an de hatiye

nivîsandin. Ji 13 beşan pêk tê. Tê de kêr zêde 220 beyt û 1000 bêje hene. Destpêk, beşa yekem û beşa dawîn li gor sîstema "mesnewî"yê; beşên din jî li gor sîstema "xezel"ê hatine qafiyekirin. Ji 19 behrên weznê 7 heb hatine xebitandin. Çimkî ji bo helbesta kurdî ya kilasîk bêtir heft heb bikêr tên ku ew jî ev in: Hezec, recez, remel, mudarî, besît, serî, muteqarib. Xanî di destpêkê de amanca nivîsandina vê berhemê wiha tîne ziman:

*Vêk êxistin Ehmedê Xanî
Navê Nûbehara Biçûkan danî
Ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkê Kurmancan*

*(Vân kelîmeyên han civandin Ehmedê Xanî
Navê ferhenga xwe Nûbehara Biçûkan danî
Wî ev berhem ji bo kesên taybet çê nekir
Belkî ji bo tevê zarokên kurmancan çêkir)*

Eger em bi bergehek perwerdehî li Nûbeharê binêrin, emê bibînin ku bêjeyên ku di malikên wê de wekî 'erebî-kurdî yan jî kurdî-erebî hatine pêşberkirin ne bi hawakî rasthatî û bêrêbaz, belkî li gorî rêbazên "ji nêz ber bi dûr ve"; "ji tiştên hêsan ber bi tiştên zor ve"; "ji tiştên ku tên zanîn ber bi tiştên ku nayên zanîn ve" û "ji bitûn ber bi perçeyan ve" hatine hilbijartin û pêşberkirin. Xanî di çarçoveya van rêbazan de bergehek pedagojîk/perwerdekariyî pêşan daye. Hinek ji mijarên ku Xanî ew li gorî rêbazên navborî girtine dest ev in:

- 1) Navên kesên ku di heman malbatê de ne yan jî merivên hev in.
- 2) Wesleyên canê mirovan

- 3) Sîfetên însanan yên xwezayî
- 4) Flora (nebatên welatê kurdan)
- 5) Fauna (heywanên welatê kurdan)
- 6) Hejmarên bingeh
- 7) Rewşa hewayê
- 8) Çar demsal
- 9) Hinek sîleh û aletên seretayî
- 10) Bêje û termên dijawate û hemwate
- 11) Bêje û termên dengnêz
- 12) Lêker û demên bingeh

Taybetmendiyeke Nûbeharê ya girîng û balkêş jî ev e ku Xanî di serê her beşek wê de beytek pend û nesîhetê wekî wecîze bi kar aniyê û bi van beytan rasterast xîtabê zarokan kiriye. Li gor beşan ev beytên nesîhetê yên wecîzeyî ev in:

Beş Wecîze

- 1 Heta tu dewr û dersan nekir
tekrar û mesrûf
Li dinyayê tu nabî ne meşhûr û
ne me'rûf
- 2 Perde ku rabin ji ber 'aridê dilistan e xweş
Dil ji xeman ku bête der bulbulê
gulistan e xweş
- 3 'Arifê ku bi qencî me'rûf-î bit
Dê helîm û sabir û mewqûf-î bit
- 4 Ger dê te meqsûdek hebî lazim
divê lêbî bilez
Xasma te me'bûdek hebî daîm di
emrê wî bibe
- 5 Her çî bi îlmê cehl kir mubeddel
Sifrê xwe wî kir bi zêr mukellel
- 6 Ey ku te kîbrê daîm kirye ji bo
xwe merkeb
Ewwel tu "bê" bike "yê" paşê
bigîre merkeb

- 7 Şêx û sofitî keramet, ilim,
xwendin hem 'emel
Xilwet e hucre, terîqeta te şerî'et
bê xelet
- 8 Ger te divêtin bibî mîr û ser û
mu'teber
Kîzb û xîlafê mebêj, ger te bikin
ker bi ker
- 9 Herçî ku ji dinyayê berîdaşte
damen bû
Bê şubhe di nîv 'amê evraştê ger-
den bû
- 10 Ger te divêtin ku beraber nebitin
kes bi te ra
Îlim bixwun hem 'emel-i tu bike
sin'et ji xwe ra
- 11 Herçî kesê îlmekî qenc xwendiyê
Dewlet e ger wî biesl xwendiyê
- 12 Di fesla Nûbeharê da digel dîlber
biçin geştê
Ji ew xweştir 'umur nabit li min
ew hal qewî xweş tê
- 13 Mu'ellim bila dil wekî ber bitin
Divêtin ku şagirt-î dîlber bitin

2. 2. 'Eqîdeya Îmanê

Îlm û kitêbên ku bi kurtasî û bê
beranberîkirina fikrên jihevcuda behsa
şêş bingehên îmanê dîkin, wekî 'eqîde
tên binavkirin. Eger behskirina ji van
bingehan bi hawakî berfireh û bi
beramberîkirina fikrên jihevcuda yên
mezheb û firqeyan be di cihê 'eqîdeyê
de bêtir "kelam" tê bikaranîn. Amanc ji
şêş bingehên îmanê ev in: Baweriya bi
Xwedê; bi ferîşteyan; bi pirtûkên asî-
manî; bi pêxemberên ku ev pirtûk ji

wan re hatine şiyandin; bi roja axretê û
bi qederê. Ji aliyê Şîiyan ve bingehê
din jî hatiye zêdekirin ku ew jî baw-
eriya bi îmaman e.

Meseleyên ku di vê berhemê de cih
digirin bêtir li gor rêbaza Sunnî/Eş'erî
hatine nixandîn.

'Eqîdeya Îmanê di sala 1687an de
hatiye nivîsandin û li gor sîstema
"mesnewî"yê hatiye qafiyekirin.
Hejmara beytên wê li gor nusxeyan di
navbera 70 û 73an de ye.

Di vê berhemê de ji aliyê weznê ve
behra muteqarib hatiye xebitandin.
Naverok û rêbaz û tesnîfa vê berhemê
wiha ye:

1) **Îlahiyyat** (meseleyên girêdayê bi
Xwedê ve): Hinek meseleyên vê beşê
ev in: Tewhîd (yekîtiya Xwedê);
Mahiyeta îmanê; têkiliyên di navbera
îman û 'emel de; tenasux (reenkar-
nasyon); hulûl (enkarnasyon); ittîhad
(yekbûna du tiştan); atom û heyûla;
qeder û hurriyeta însan; rewşa kesên
ku gunehên mezin kirine li axretê;
tobe û îmanhanîna di dema bêhêvîbûn
û dîtina 'ezab de.

2) **Nubuwwat** (meseleyên girêdayê
bi pêxemberiyê ve): Hinek ji mijarên
vê beşê ev in: Resûl û nebî kî ne?
Sîfetên pêxemberan û bi taybet bêrî-
bûna wan ji gunehan; şertbûn û
neşertbûna zilamiyê di pêxemberiyê
de, angî jin jî dibin pêxember yan ne?

3) **Sem'iyyat** (tiştên ku hebûna wan
hatiye bihîstin): Angî tiştên ku hebû-
na wan ne li ber çavan e lê ji pêxem-
beran hatiye bihîstin ku ew hene.

Hinek ji wan tiştan ev in: Hebûna melek û cin û şeytan; roja axretê; di gorê de pirsên ku Munker û Nekîr ji mirî dikin; saxbûn û rabûna ji gorê; ji bo hesabdayinê civîna li mehşerê; ter-azûya ku emelên qenc û xirab pê tînin kêşandin; pira sîratê; bihişt û doj (ango cennet û cehennem); dîtina Xwedê.

Ev herdu berhemên Xanî (*Nûbehar û 'Eqîde*) menzûm, ango bi şiklê helbestê hatine amadekirin. Çimkî esasê perwerdeya medreseyê li ser jiberkirina metnan e û şagird metnên menzûm ji yê nementzûm hêsantir û bizewqîr jiber dikan. Berya Xanî jî hinek 'aliman di warê ferheng û 'eqîdeyê de berhemên menzûm amade kirine û ev berhemên wan di medrese-yên osmaniyan de wekî kitêbên dersê hatine xwendin û jiberkirin. Mamoste Tehsîn Îbrahîm Doskî di şerha xwe ya li ser Dîwana Xanî ya bi navê "*Cewheru'l-Me'anî*" de û nivîskar Zeynelabidîn Zinar jî di pêşgotina xwe ya li ser latînzekirina vê behremê de dibêjin ku cara yekem Nûbehar bi vî terzî menzûm hatiye amadekirin, berya wê kesê ferhengek wusa nenivî-sandiye. Lê gava em li dîroka ziman û edebiyatê Rojhilat dinêrin em dibînin ku berya Xanî jî hinek aliman hem ferhengên menzûm hem jî 'eqîdeyên menzûm nivîsandine. Mese-la beriya osmaniyan cara yekem nivîskarê Îranî Reşîduddîn Vatvat (mirin: 1182) ferhengek menzûm nivîsandiye Di dema osmaniyan de jî beriya Xanî hinek 'aliman ferhengên menzûm, hinekan jî eqîdeyên menzûm nivîsandine. Di warê ferhengên menzûm de du, di warê 'eqîdeyên

menzûm de jî du alimên ku berhemên wan di medreseyên osmaniyan de wekî kitêbên dersê hatine xwendin û jiberkirin ev in:

Di warê ferhengên menzûm de

1) Ferîşteoğlu/İbnu Melek: Di dewra osmaniyan de di sala 1392an de ferhengek bi navê "*Luxat-î Ferîşteoğlu*" nivîsandiye. Ferheng 'erebî-tirkî ye.

2) Şahidî Îbrahîm Dede: Vî nivîs-karî jî berya Xanî ferhengek menzûm bi navê "*Tuhfe-i Şahidî*" amade kiriye. Ferhenga wî farisî-tirkî ye.

Di warê 'eqîdeyên menzûm de

1) 'Eli b. Osman el-Ûşî (m.569/1173). Nivîskar jî tirkên Ferganayê ye; navê berhema wî: "*Bedu'l-Emalî*". Hejmara beytên wê: 68

2) Îbrahîm b. Harûn el-Lekkanî (m. 1041/1632). Navê berhema wî: "*Cevheretu't-Tevhîd*". Hejmara beytên wê: 144.

Îbrahîm Heqqiyê Erzeromî ku li ser bernameyên perwerdehiya di medrese-yên osmaniyan de û li ser kitêbên dersê yê van medreseyan de berhemek bi navê "*Terfîb-î Ulûm*" nivîsandiye û tê de listeya kitêbên dersê jî daye ku herdu ferhengên navborî û 'eqîdeya Ûşî jî wekî kitêbên dersê di vê listeyê de cih digirin.

Jixwe tiştê balkêş ev e ku Xanî hem Nûbehara Biçûkan hem jî 'Eqîdeya Îmanê li hemberî van berhemên navborî wekî kitêbên dersê yê bedîl/alternatîf û wekî perwerdeyek bedîl/alternatîf amade kirine. Ango çawa ku Ev ferheng û 'eqîdeyên menzûm yê berya Xanî di medreseyên osmaniyan

yên fermî de wekî kitêbên dersê hatine xwendin û jiberkirin, Xanî xwestiye ku ew jî hem di warê ferhengê de hem jî di warê 'eqîdeyê de kitêban binivîsîne ku ew kitêb jî di medreseyên kurdan yên fexrî de bîn xwendin û jiberkirin. Xanî bi vê amancê di sala 1683an de *Nûbeher*, di sala 1687an de jî *'Eqîdeya Îmanê* nivîsandiye. Wî bi nivîsandina *Nûbeharê zimanê kurdî* kiriye "*zimanê ziman*", bi *'Eqîdeya Îmanê* jî kiriye "*zimanê dîn*". Ji bo ku tirk ji %90 Maturîdî ne di medreseyên wan de *'eqîdeya Ûşî* ya ku li gorî Maturîdiyan e dihat xwendin û jiberkirin. Lê ji bo ku alimên kurd ji %90 Eş'erî ne Xanî *"Eqîdeya Îmanê"* ya xwe li gorî Eş'eriyan amade kiriye. Di çarçoveya ku zimanê kurdî bibe "*zimanê dîn*" jî em dibînin ku sîfetên Xwedê yên 'erebî ku heta dema Xanî û gelek piştî dema wî jî nehatine tirkîkirin û farisîkirin jî aliyê Xanî ve hatine kurdîkirin. Şeş heb ji wan sîfetên resen û berdêlên wan yên kurdî ku ji aliyê Xanî ve hatine xebitandin ev in: Heyat=xweştî; qudret=şîn; îlm=zanîn; îrade=vîn; sem'=bihîstin; beser=dîtin. Xanî van sîfetên ku di îlmê 'eqîde û kelimê de wekî "sîfetên subûtî" tên zanîn di beytên 21 û 22wan de wiha tîne ziman:

*Sîfetê di seb'e ji bo Zulcelal
Bizan heft in ey 'alimê purkermal
Xweştî, şîn û zanîn û vîn û kelim
Bihîstin digel dîtinê bûn temam*

2. 3. Mem û Zîn

Gelek derd û kul û ramanên Xanî yên olî, felsefî, civakî û siyasî hebûne. Wî xwestiye ku ji van derd û êş û ramanên wî re tiştekek bibe tercuman û

hincet û behane; loma wî di sala 1694an de *"Mem û Zîn"* nivîsandiye. Jixwe ew bixwe jî wiha dibêje:

*Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane*

Çima bi kurdî nivîsandiye? Xanî digel ku zimanên 'erebî û farisî û tirkî jî biqasî zimanê xwe yê zikmakî zanibûye, lê wî dev ji van zimanên ku wekî şeraba xalis bi qedr û qîmet bûne berdaye û zimanê kurdî yê ku wekî velpa ser şerabê ye û kes pê 'emel nake tercîh kiriye. Çawa ku ew bixwe jî wiha dibêje:

*Saft şemirand vexwarî durdî
Manendê durrê lisanê kurdî*

Nexwe çima kurdî? Çawa ku Xanî jî dibêje, wî ji bo du amancên girîng ev berhem bi kurdî nivîsandiye. Yek jê ji bo ku miletên din nebêjin kitêbên her kesê hene, hew yên kurdan tenê tunene, kurd bê kitêb in; ya din ji bo ku neyê gotin ku kurd ji eşqê bêpar in; ne ji eşqa heqîqî fêrî dikin ne jî ji ya mecazî.

Belê, Xanî *"Mem û Zîn"* a xwe bi kurdî nivîsandiye lê cih daye zimanên 'erebî û farisî û tirkî jî. Bi vî hawayî di navbera zimanê me û zimanên cîranên me de biratî pêk haniye. Mesela kêmezêde ji 26560 kelimêyên *"Mem û Zîn"* ê 6015 heb 'erebî; 918 heb farisî; 26 heb jî tirkî ne. Em hêvî dikin ku xwediyê van zimanan jî di çarçoveya edalet û wekhevîyê de rojek bibin bira û çawa ku Xanî cih daye zimanên wan, ew jî di helbest û nivîsên xwe de cih bidin zimanê Xanî û zimanê wî nas bikin.

Belê, Xanî di beyta 2478an de wiha dibêje:

Kurdî, erebî, derî û tazî

Terkîb-i kirin bi hezl û bazî

(Min digel kurdî ji zimanên 'erebî û farisî jî kelîme hanîn

Ji bo hunerê nezmê û listika peyvan min ew bi heve danîn)

Di vê beyta Xanî de peyvên "hezl" û "bazî" derbaz dibin. Me'na "hezl"ê ya ferhengî "henek" e û ya "bazî"yê jî "listik" e. Loma min li kîja şerha "*Mem û Zîn*"ê nêrî min dît ku şîroveker dibêje "Xanî ji bo henek û listinê kelîmeyên vê berhemê bi he ve danîn". Lê ev herdu peyv di me'neyên xwe yên ferhengî de nehatine bikaranîn. Belkî wekî du termên wêjeyî û hunerî hatine xebitandin. Çimkî çawa ku Ferîd Develioğlu jî di ferhenga xwe ya osmanî de dibêje, "hezl" hunerê nezmê ye. Bazî jî di vir de ne me'na listika ku em dizanin e. Belkî listika peyvan ê ku di tirkî de jê re tê gotin "kelime oyunu" ku ev jî hunerek edebî ye. Nexwe divê em ji van herdu terman ne wateyên wan ên ferhengî, belkî wateyên wan ên edebî fêr bikin.

Xanî çawa ku li hemberî zimanên din ji zimanên xwe pir hezkirîye lê nijadperestîya wî nekiriye, Wusa jî di navbera devokên Kurmancî de jî nijadperestîya devokek nekiriye. Heta karibûye ji tevê devokan îstîfade kiriye. Mesela hinek ji van devokên ku wî ji wan îstîfade kiriye ew bixwe jî 2470an de wiha tîne ziman:

Bohtî û Mehmedî û Silivî

Hin le'l û hink ji zêr û zûvî

Xanî bikaranîna van devokan xwestîye ku devokên lehçeya Kurmancî nêzîkê hev bike û ji wan zimanek standard pêk bîne ku jixwe rê û rêbaza zanistî jî ev e. Nexwe îro çima di navbera Şeydayê Varlî û hinek nivîskar

û lêkolînerên din de şer û ceng li ser devoka "*Mem û Zîn*"ê tê kirin. Hinek dibêjin Xanî devoka Bohtî bikar aniye, Seydayê Varlî dibêje devoka Mehmedî bikar aniye û li ser vê meseleyê şerê devokan dikin. Ma ne waye Xanî bixwe dibêje min ji devoka Bohtî jî, Mehmedî jî Silivî jî îstîfade kiriye. Mirov dibê qey Xanî zanibûye ku ewê li ser devoka "*Mem û Zîn*"ê şer derkeve loma wî vê beyta xwe gotiye û tê de navê bohtî jî Mehmedî jî qeyd kiriye. Lê ez dinêrim ku çavên hinekan ji me Bohtî tenê dibînin, çavên hinekan ji me jî Mehmedî tenê dibînin. Lê bila li qusûra min nenêrin, çavên min herduyan jî dibînin.

Hinek lêkolînerên me jî Xanî rexne dikin û dibêjin çima Xanî kurdiyek xwe rû bikar naniye ku em tev jê fêr bikin. Bi qasî ku min di gotarek nivîskarê me yê hêja Remezan Alan de xwend ew jî tiştek wusa dibêje. Ez dixwazim li vê derê tiştek bibêjim. Hûn tev Mustefa Kemal Atatürk nas dikin. Di navbera mirina Xanî û mirina wî de li gorî îro 228 yan jî 231 sal heye. We navê axaftina wî ya bi navê "*Gençliğe Hitabe*" yanî "*Xîtaba ji Cuwanan re*" jî bihîstiye. Hûn xebatên wî yên derbarê xwerûkirina zimanê tirkî de jî dizanin. Ez dixwazim ji vê xîtabeya wî ji we re sê mînakên pêşkêş bikim, ka çend heb ên ku 'erebî nizanin ewê ji van mînakên fêr bike?

Mînak 1: Dahilî ve Haricî bedhahların olacaktır.

Mînak 2: Bu imkan ve şerait çok namusait bir mahiyette tezahür edebilir.

Mînak 3: İktidar sahipleri şahsî menfaatlerini mustevlilerin siyasî emelleriyle tevhið edebilirler.

Nexwe divê em her nivîskarî û zimanê wî li gorî dem û esra wî binirxînin, ne li gorî dema me. Ka em çawa bikin, eger rojnameya "Azadiya Welat" di dema Xanî de bi vî şiklî derketa ewê zimanê wî jî xwerû biba. Lê wezîfeya "Azadiya Welat" wî bixwe kiriye. Çawa ku Xanî di "Eqîdeya Îmanê" de sîfetên Xwedê kirine kurdî. Êdî ji viya xwerûtir ewê kuda here?

Ji bo ku Xanî "Mem û Zîn" a xwe li gorî terza "mesnevi" yê amade kiriye, divê em jî wê li vî gorê tesnîf bikin: Çawa ku tê zanîn, mesnewî ji sê beşên bingeş pêk tên ku ew jî "destpêk", "mijara eslî" û "encam" e. Van beşan jî di nav xwe de dibin çend binbeş.

Destpêk:

Di bin vî beşê de binbeşên "besmele" (navê Xwedê), "tewhîd" (yekîtiya Xwedê), "munacat" (pesnê Xwedê û lavahiyên jê re), "nat" (pesnê Pêxember), "pesnê çar xelîfeyên mezin", "xwestina şefa'etê", "pesnê kesê ku berhem jê re hatiye hediyekekirin"; "sebebê nivîsandina berhemê". Ev binbeş di "Mem û Zîn"ê de bi kurtasî wiha cih digirin:

a) **Besmele û tewhîd** (navê Xwedê û yekîtiya wî): Ev beş ji 36 beytan pêk tê û bi vî beytê dest pê dike:

Sernameê name namê Ellah

Bê namê wî natemam e Wellah

(Her kitêb di serî de divê bi navê Xwedê bê destpêkirin

Wallahî kitêb kêr dimîne eger bê navê wî bê destpêkirin.)

b) **Munacat** (pensê Xwedê û lava

hiyên jê re): Ev binbeş ji beytên navbera 37-93an pêk tê û bi vî beytê dest pê dike:

Ey şukrê te cewhera zebanî

Wey zikrê te seyqela cenanî

(Ey Xwedayê ku şukrê te cewherê ziman e.

Û ey Xwedayê ku zikrê te jî cîlîya dilan e.)

c) **Na't** (pcsnê Cenabê Pêxember):

Ev binbeş ji beytên navbera 94-160an pêk tê. Xanî di beytek jî vî beşê de Cenabê Pêxember wekî şexsiyetek ku de'wa xwe hem bi ziman û Qur'anê, hem jî bi dest û şûr dimeşîne dide nasîkirin. Ango li gorî şert û mercan carina ziman û Qur'an, carina jî dest û şûr:

De'wa xwî dikît bi dest û ezman

Destê wî bi seyf û dev bi Qur'an

(De'wa xwe hem bi dest dimeşand hem jî bi ziman

Di destek wî de şûr hebû, di destê din de jî Qur'an)

d) **Mirac** (çûyîna Pêxember a asîmana): Ev binbeş ji beytên navbera 161-188an pêk tên. Beytek jî wan ev e:

Hadîr jî te ra Buraq û Refref

Şatîr bi te ra firîşte ref ref

(Ji bo suwarbûna te hazîr in Boraq û Refref

Melek jî hazîr in ku bi te ra werin ref bi ref)

e) **Pesnê kesê ku berhem jê re hatiye îthafkirin**: Ev binbeş ji beytên navbera 189-234an pêk tê û li gorî me beşa herî balkêş ev e. Çimkî di vî beşê de berhem jî bo kê hatibe nivîsandin navê wî tê gotin, pesnê wî tê dayîn û berhem jî wî re tê hediyekekirin. Lê em dibînin ku Xanî di vî beşê de bi giştî pesnê kurdan daye û berhema xwe jî tevê kurdan

re hediye kiriye. Ji xwe ev tişt ji sernavê vê beşê jî tê fêmkirin ku sernava wê ya resen ev e: "Îş'ara medîheta tewaişê di kurdan e bi şeca'et û xîretê û îzhara bedbextî û bêtalî'îya wan e, digel hinde semahet û hemiyetê" (Ev beş der barê civakên kurdan de ye. Ev civakên han digel ku xwedî cesaret û xîret û cuwamêrî û hemiyetê ne jî, dîsa tim bê talih û bê si'ûd in; talihê wan tune ye). Hinek ji beytên vê binbeşê ev in:

*Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmanc-î di dewleta dinê da*

*Aya bi çi wechê mane mehrûm?
Bîlcumle ji bo çi bûne mehkûm?*

*Her mîrekî wan bi bezlê Hatem
Her mîrekî wan bi rezmê Rustem*

*Goya ku li ser heddan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in*

*Ev qulzemê Rom û Behrê Tacîk
Hindî ku bikin xurûc û tehrîk*

*Kurmanc-î dibin bi xûn muletîx
Wan ji yek ve dikin mîsalê berzex*

*Cuwamêrî û himmet û sexawet
Mîrînî û xîret û celadet*

*Ew xetm e ji bo qebîlê Ekrad
Wan daye bi şîrê himmetê dad*

*Ger dê hebuwa me ittîfaqek
Vêk ra bikra me îngiyadek*

*Tekmîl-î dikir me dîn û dewlet
Teshîl-î dikir me îlm û hikmet*

Ji van beytan ya ku bala min pir dikişîne beyta ku derbarê kurdan de dibêje:

*Goya ku li ser heddan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in*

Min di şerhên "Mem û Zîn"ê de rast nehatim, lê ez ji vê beytê wiha fêm dikim: Di tespîtîkirina sînoran de kilîd kurd in. Ango dewletên ku welatê kurdan di nav xwe de parê kirine sînorên xwe li gorî kurdan tespît dikin. Sêsed sal berê jî wiha bû ye û niha jî wiha ye. kurd her tim kilîd in.

f) Sebebê nivîsandina behremê: Ev binbeş ji beytên navbera 235-285an pêk tê. Hinek ji van beytan ev in:

*Hasil ji înad eger ji bêdad
Ev bîd'ete kir xîlafê mu'tad*

*Saftî şemirand vexwarî durdî
Manendê durrê lîsanê kurdî*

*Înaye nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa ji bo 'amê*

*Da xelq-î nebêjîtin ku Ekrad
Bê me'rîfet in, bê esl û binyad*

*Enwa'ê mîlet xudan kitêb in
Kurmanc-i tenê di bê hesêb in*

*Hem ehlê nezer nebên ku Kurmanc
Îşqê nekirin ji bo xwe amanc*

*Bêbehre ne ew ji îşqîbazî
Farix ji heqîqî û mecazî*

Mijara eslî

Mijara eslî ya "Mem û Zîn"ê bûyera eşqa ku di sala 1393an de li Cizîra Botan di navbera cuwanê bi navê Mem û cuwana bi navê Zîn derbaz dibe ye. Mem kurê katibê dîwanê ye, Zîn jî xwuşka Mîrê Cizîra Botan e. Vê eşqa han berê bi hawakî mecazî dest pê

kiriye, paşê bûye heqîqî û ilahî. Qehremanên din yên ku di "Mem û Zîn"ê de rol girtine ev in:

- Tacdîn:** Destbirakê Memê ye, kurê wezîrê dîwanê ye, sembola başiyê ye.
- Sitî:** Heskiriya Tacdî ne, xwuşka Zînê ye.
- Arif û Çeko:** Birayên Tacdîn in
- Zeynedîn:** Mîrê Cizîra Botan e, birayê Zînê û Sitiyê ye.
- Beko:** Dergehvanê Mîr e, sembola nebaşiyê ye.
- Heyzebûn:** Dadoka Zîn û Sitiyê ye.
- Şêx/Pîr:** Yê ku Beko piştî mirina wî di cennetê de dîtêye ye.

Encam

Ev beş ji beytên navbera 2599-2656an pêk tê. Nivîskarên Mesnewiyan ji bo vê beşê bêtir sernavê "xatîme" (dawî) bi kar tînin û di bin vî sernavê de çîh didin binbeşên "dua", "pesinîn", "navê berhemê", "dîroka nivîsandina berhemê", "daxwaza du'ayan ji xwen-devanan" û "dîroka temambûna berhemê". Mesela Xanî di beyta 2654an de dide fêmkirin ku gava wî ev berhem temam kiriye temenê wî 44 bûye:

*Lewra ku dema ji xeybê fek bû
Tarîx-ê hezar û şêst û yek bû*

*Îsal gehîşte gîl û çaran
Wî pêşrewê gunahikaran*

2. 4. Dîwan

Çawa ku tê zanîn, ji kitêbên ku temamê helbestên şa'iran di wan de hatibin civandin re tê gotin "dîwan". Bêjeya dîwanê di zimanê erebî yê kilasîk de bi wateya "deftera qeyd û sicîlan" jî

hatiye bikaranîn. Mesela Xelîfeyê duyemîn Hezretî Omer di gotinek xwe de gotiye "eş-Şî'ru dîwanu'l-'ereb" (Şê'r dîwana 'ereban e). Yanê şê'rên 'ereban ji wan re wekî deftera qeyd û sicîlan e. Erebiyên di defterê de derd û kulên xwe, civak û siyasetên xwe, tore û dînen xwe, çand û hunerên xwe qeyd dikin.

Di eslê xwe de ne helbestên 'ereban tenê wusa ne, belkî helbestên temamê miletan xwediyên van teybetiyan in. Helbestên temamê miletan neynika derd û kulên wan e, bi kurtahî neynika dîn û dunyaya wan e. Aha ji we re *Dîwana Xanî!* Bi rastî *Dîwana* wî behrek kûr e; xezîneyek veşartî ye; bîrek bêbînî ye. Ji bo lêkolînerên ziman û wêjeya kurdî mijarên dewlemend tê de hene. Tê de ziman heye, civak heye, siyaset heye, felsefe heye, muzîk heye, tesewwuf heye, evîn heye; ...heye û heye. Xanî di *Dîwana* xwe de wiha dibêje:

*Zîhar ey dostan weqtê dikim ez hîcretê.
Van du misra'an kîtabet kin li Pergê kaxetê.
(Eman ha gelî dostan, piştî ku ez ji dinê koç bûm hûn zû bikin!
Van çend risteyên ku min gotine hun binivîsinin û qeyd bikin!)*

Bi qasî ku em ji vê beytê fêm dikin Xanî xwestiye ku helbestên wî piştî mirina wî bîn nivîsandin û qeydkirin. Mala wan ava be ku 'alimên kurdan wesiyeta Xanî hanîne cî û hin bi hin helbestên wî civandine û kirine dîwan. Çawa ku Xanî jî dibêje, helbestên wî digel ku wekî dur û cewheran in lê bazara ziman û edebiyatê ketiye dest Turkmen û Tataran, ziman û edebiyata wan di bazara cîhanê de pere dikin, helbestên wî ji bo ku bi kurdî ne kes bi

wan 'emel nake. Belê Xanî di wî warî de alîkariya Şahê Îranê kirine:
jî derdê xwe wiha tîne ziman:

*Durdane ji dev me dibarin dem û satan.
Kes nîne bibit wan bifrojt li welatan.
(Dem û sa'et ji devê me dibarin
helbestên mîna duran.
Lê kes tune ye ku wan bibe bifiroşe
sendoxan li welatan.)*

*Qet gewherekî cewheriyek nîne buha ket.
Bazarê cîhan maye bi van Turkmen û
Tataran.
Cewhernasek nîne ku rûmêtek bide
van şê'rên mîna cewheran
Çimkî bazara dunyayê îro ketiye
destê van Turkmen û Tataran)*

*Dilê Xanî eger çî Genc û xan e
Belê qet kes nego: "Xanî bi çendan?"
(Gerçî dilê Xanî her wekî xezîneyan
tîjî hîkmete.
Lê qet kesê nego ku "Xanî! Çiqas e
buhayê te?")*

Di *Dîwanê* de Xanî bal kişandiye
ser hinek tiştên dîrokî jî. Mesela di
şerên navbera îranî û osmanîyan de
rewşa mîrên kurdan ku li Hemedanê
alîkariya sefewiyên Îranî kirine wiha
diyar dike:

*Mîrê Hemedanê xwû di dînê de xaîn.
'Îsê ne li Mûsayê dixwûnin selewatan.
(Mîrên Hemedanê di dîn û dostaniya
xwe de xaîn in.
Wekî insanên ku 'Îsewî bin lê li Mûsa
selewatan binin.)*

Ji vê beyta wî ya ku emê niha ji we
re pêşkêş bikin jî tê fêmkirin ku hinek
ji mîr û eşîrên Hekarî jî li dijî
osmanîyan bi çek û aletên xwe

*Xelqê me Hekarî weh dibêjin ku ji bo şah.
Hîna seferan ew dişehînin edewatan.
(Bi qasî ku ji aliyê xelqê me yên
Hekariyê ve tê gotin.
Dema şer û seferan ji Şah re çek û
aletan dişeyînin.)*

*Dîwana Xanî ji aliyê bêje û termên
kurdî yên resen ve jî gelek dewlemend
e. Divê zimanzanên me di wî warî de
serê xwe bi Dîwanê re bêşînin û ji aliyê
ziman ve lêkolînên xurt li ser bikin.
Wekî mînak em dixwazin çend beytên
ku di wan de hinek bêje û termên
balkêş derbaz dibin pêşkêş bikin:*

*Tên derve nebû, qet nedida bextê kuşadek.
Rû da me şukur, ke'be' tali' ku duşes hat.
(Yara min qet der nediket, bi aliyê
min ve qet nedihat.
Şukur îro rû da me, zarê bext û tali-
hê me îro duşes hat.)*

*Îlmê esma me jiber kir di dibistanê sîfat
Talibê zafî me lew min şemirand baxê bihişt
(Me îlmê naskirina sîfetên Xwedê
jiber kir di dibistanê da.
Ez zatê wî dixwazim, loma min dev ji
baxê cinetê jî berda.)*

*Sed mixabin çû ji bal min ew hebîba çav-
belek,
Ah û efxanê dimin daîm diçin hetta felek,*

*Sewta hezar û qumriyan, dengê rebab û
muxniyan,
Teşbihê bezma bengiyan, hev dengê hev
bûn çeng û def.*

1919-1923 Yılları Arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi Karşısındaki Tutumu ve 1922 Tarihli Kürt Otonomisi Kanunu'nun Metni*

SABAH GHALİB

(Soranice Kürtçesinden Türkçeye Çeviri: Agît Xorşîd Zaher)

I. Dünya Savaşı'nın sona ermesinden ve Osmanlı İmparatorluğu'nun İtilaf Devletleri tarafından yenilgiye uğratılmasından sonra, imparatorluğun sona ermesinin yanında, Türk etnisitesinin bütün siyasi otoritesinin yok olması gibi bir durum da sözkonusu idi.

Çok sayıda Türk siyasetçi, yüksek rütbeli subay ve aydın, savaşın gerçek sonuçlarını ve bunun gelecekleri üzerinde meydana getireceği felaketi çabuk anlamıştı. Bundan dolayı, varolma ve yokolma tehlikesi karşısında, devrim ve mücadelenin dışında önlerinde başka hiçbir yol kalmamıştı. Bu Türklerin gözü önündeki bir başka

gerçek de, özgürlüğe ulaşmanın tek yolunun Türk milliyetçiliği düşüncesi olduğuydu. Bundan dolayı acil ve zekice kendilerini toparladılar ve geniş çaplı bir özgürlük hareketini örgütlediler.

4 yıl süren I. Dünya savaşında, Osmanlı Devleti'nde bulunan müslüman milletler arasında sadece Kürtler geleceklerini düşünmemişti. Kürtler sadece bununla da kalmayıp, Genç Türk Osmanlı'ların bahtını ve tahtını korumak adına tam bir samimiyet içinde, her taraftan çaba içindeydiler. Ancak, itilaf devletleri ile Osmanlı'lar arasında 30 Ekim 1918'de yapılan Mondros ateşkes anlaşması, Kürtleri uyandırmış ve onlara bir umut bahşetmişti. Kürt ulusalcıları arasında kendilerini ulusal düşüncenin mirasçısı bilen çok sayıda faal genç ortaya çıktı.

* Bu yazı, 2005 yılında, Süleymaniye Üniversitesi'nde düzenlenen bir seminerde sunuldu ve 2006 yılında da Koyê(Köysancak) ve Selahaddin Üniversiteleri'nde sunuldu.

Bunlar bir kaç kısımdan oluşuyordu. Bunlardan bir kısmı, Türk ve dinin bağlantı sebebi olduğu Pan-İslamist Türk Partisi taraftarıydı. Bir diğer kısmı, Sultan hükümetinde Türk görevlilerle çalışıyordu ve İngiltere'ye karşıydı. Üçüncü kısım her iki tarafa bağlıydı. Dördüncü kısım ise, hiçbir cihete bağlı değildi ve sadece Kürtlerin özgürlüğü hedefine sahipti. Bu derli toplu olmayan durum, en baştan Türk milliyetçileri, Kürtleri kendilerine destek ve Kürdistan'ı da kendilerine bir başvuru kalesi yapma düşüncesine götürdü. Çeşitli Türk milliyetçi grupları arasında, Mustafa Kemal'in hareketi hepsinden daha düzenli ve belirgindi. O, geçici bir süre için, Türk çıkarları için, Kürtlerle dostluk ve stratejik bir ilişki kurabildi.

Bu yazı, bir taraftan durumun başlıca esaslarından bahsederken, diğer taraftan da tarafları çözümlemeye ve en sonunda da Atatürk'ün Kürtler karşısındaki tutumunu ve Kürtlerin kendi kaderlerini belirleme hakkını gözler önüne koymaya çalışıyor. Atatürk'ün mirasından anlamak, Türkiye'yle muamelede yer bulma konusunda Kürt siyasetçilere tam bir yardım verecektir.

1914'te, I. Dünya Savaşı başlamadan önce, yukarı Afrika'nın tamamı, Balkan ülkelerinin tamamı, Ak Deniz ve Ege'de bulunan çok sayıda ada Osmanlı İmparatorluğu'nun elinden çıkmıştı. Bununla beraber İngiltere, zorbalığını Fars Körfezine dayatmıştı. Bütün bunlara ek olarak Osmanlı Devleti, Avrupa'lı devletlere olan ağır borcun altında inliyordu ve

Mali-Ekonomik sistem 23 Aralık 1881'den itibaren Uluslararası Borç Komisyonu tarafından yürütülüyordu.¹ Osmanlı'nın bu kötü durumu Osmanlı'yı bir kere daha savaş meydanına gitmeyi -özellikle de Avrupa'lı güçlere karşı- düşüncemeyecek duruma getirmişti. Osmanlı'nın durumu, destek almaksızın kendi ayakları üzerinde duramayacağı bir seviyeye ulaştı. Bu amaçla Avrupa'lı bütün güçlü devletlerin kapısını çalıyordu. Ta ki Genç Türkler hükümetinin en üst düzey üç sorumlusu Talat Paşa, Enver Paşa ve Cemal Paşa gizlice, ümitsizce ve Bakanlar Kurulu'ndan habersiz bir şekilde Almanya'ya tenezzülde bulunana kadar, onlardan hiçbirini kapısını açmadı. Bu da onları büyük dünya savaşının cehennemine çekti. 4 yıl savaş, Osmanlı Devletini parçalayıp Osmanlı'yı ayakları üzerinde duramayacak hale getirdi. Osmanlı'ların Basra, Bağdat, Musul, Filistin, Şam ve Halep cephelerindeki yenilgisi, beyaz bezle teslim olmalarını, ümitsiz ve yenilgiye uğramış bir halde 30 Ekim 1918'de ateşkes anlaşmasını imzalamalarını beraberinde getirdi.

